**T.C.**
**ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ**
**ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ**
**MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

# REXNEYA CIVAKÎ DI KOVARA ZANKOYA DIHOKÊ YA EKADEMÎ DA

**TEZA LÎSANSA BİLİND**

**XWENDEKAR**
**SHILAN YOUNIS AHMED LAWAND**

**ŞÊWERMEND**
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

**VAN – 2023**

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

# DUHOK ÜNİVERSİTESİ AKADEMİK DERGİSİNDE SOSYAL ELEŞTIRİ

YÜKSEK LİSANS TEZI

ÖĞRENCİ
SHILAN YOUNIS AHMED LAWAND

DANIŞMAN
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN – 2023

| | | |
|---|---|---|
| Shilan Younis Ahmed Lawand tarafından hazırlanan “REXNEYA CIVAKÎ DI KOVARA ZANKOYA DIHOKÊ YA EKADEMÎ DA” adlı tez çalışması aşağıdaki jüri tarafından OY BİRLİĞİ / OY ÇOKLUĞU ile Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir. | | |
| Danışman: Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ<br>Arap Dili ve Belagatı ABD, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi<br>Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum | | …………………….. |
| Başkan: Unvanı Adı SOYADI<br>Anabilim Dalı, Üniversite Adı<br>Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum | | …………………….. |
| Üye: Unvanı Adı SOYADI<br>Anabilim Dalı, Üniversite Adı<br>Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum | | …………………….. |
| Üye: Unvanı Adı SOYADI<br>Anabilim Dalı, Üniversite Adı<br>Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum | | …………………….. |
| Üye: Unvanı Adı SOYADI<br>Anabilim Dalı, Üniversite Adı<br>Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum | | …………………….. |
| Yedek Üye: Unvanı Adı SOYADI<br>Anabilim Dalı, Üniversite Adı<br>Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum | | …………………….. |
| Yedek Üye: Unvanı Adı SOYADI<br>Anabilim Dalı, Üniversite Adı<br>Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum | | …………………….. |
| Tez Savunma Tarihi: | ......../……./…… | |
| Jüri tarafından kabul edilen bu tezin Y. Lisans Tezi olması için gerekli şartları yerine getirdiğini onaylıyorum.<br>……………………….…….<br>Doç. DrAbdülhadi TİMURTAŞ<br>Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürü | | |

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında;

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu

bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim. (…/…/2023)

(İmza)

(Shilan Younis Ahmed Lawand)

(Teze Lîsansa Bilind)

**Shilan Younis Ahmed Lawand**
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Adar- 2023

**REXNEYA CIVAKÎ DI KOVARA ZANKOYA DIHOKÊ YA EKADEMÎ DA**

## KURTE

Herwek ji nav û nîşanên vê vekolînê ya dîyar e ew a bi navê "Rexneya Civakî di Kovara Zankoya Dihokê ya Ekademî da" ye. Em li ser du mijaran rawestîyayî ne. Mijara êkê ya girêdayîye bi babetên rexneya edebî û geşekirin û werara wî her ji qonaxên destpêkê yên peydabûna wê û ew gorankarîyên bi ser da hatîn ku şêweytekê giştî bas li ser hatîye kirin, herwesa mîtoda rexneya civakî û çewanîya peydabûna wê û arasteyên wê û binemayên wê bas li ser hatîye kirin, zêdebarî rexneya rexnê û çewanîya karkirinê li ser têkistê edebî. Herwesa merc û saloxetên rexnegirî hatîye bas kirin. Bi taybetî li dor çewanîya hilbijartina mîtodeka rexneyî ji bo ew têkistê dihilbijêrît. Layenê duyê yê vê vekolînê em li ser Govara Zankoya Dihokê ya Akademî rawestîyane, çewanîya peydabûna wê û girîngîya hebûna wê zêdebarî wê çendê kanê ta çi rade girîngî daye rexneya edebî di nav wan gotar û vekolînên têda hatine belavkirin bi taybetî di warê rexneya civakî da. Arêşeya vê namê destnîşankirî, ew e ku weku pêdivî karê rexneya edebî li ser têkistan û bi taybetî têkistên kurdî ya kêm û lawaz e. Nemaze ku karê rexneya edebî bi giştî pêşvebirin û nûkirina berhemên edebî ye. Ew mîtoda di vê vekolînê da hatîye bas kirin, mîtoda şîrovekarî wesfî ye û li dûmahîyê jî komeka encaman em gihêştinê ku li dawîya vê vekolînê hatine rêzkirin.

**Peyva Sereke** : Rexne, Rexneya Civakî, Rexneya Edebî, Kovara Zankoya Dihokê, Edeba Kurdî.

**Hejmara Rûpelê** : II+69

**Şêwirmend** : Doç. Dr. Nesim Sonmez

(M.Sc. Thesis)
**Shilan Younis Ahmed Lawand**
VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF SOCIAL SCIENCES
Adar-2023

**SOCIAL CRITICISM IN THE ACADEMIC JOURNAL OF DIHOKE UNIVERSITY**

## ABSTRACT

In this study, we researched the topics of "Social Criticism in Dihok University Academic Journal". In this study, we focused on two issues. The first topic, the subjects of literary criticism, its development and its effect from the first stages of its development, the achievements obtained in general, the method of social criticism, the way of development and development, we focused on the basics of literary criticism and the way of working on literary work, especially in the introduction, how to use a critical method. We gave information about the election and examined the terms and conditions of the criticism. In the second part, we focused on the emergence of Dihok University Academy Journal, the importance of its existence and how much importance was given to literary criticism, especially in the articles and reviews published in this journal. The reason for giving this name to this research is that literary criticism studies on Kurdish and especially Kurdish literature are few and weak and the aim of literary criticism is generally to introduce and update literary works. In this research, descriptive interpretation method was used and the data obtained are given at the end of this research.

**Keywords** : Criticism, Social Criticism, Literary Criticism, Dihok University Journal, Kurdish Literature

**Page numbers** : II+69

**Supervisor** : Doç. Dr. Nesim Sönmez

(Yüksek Lisans Tezi)

**Shilan Younis Ahmed Lawand**

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Mart -2023

**DUHOK ÜNİVERSİTESİ AKADEMİK DERGİSİNDE SOSYAL ELEŞTIRİ**

## ÖZET

Bu çalışmada "Dihok Üniversitesi Akademik Dergisi'nde Toplumsal Eleştiri" konularını araştırdık. Çalışma da iki konuya odaklandık. Birinci konu, edebiyat eleştirisinin konuları, gelişimi ve gelişiminin ilk aşamalarından itibaren etkisi, genel olarak elde edilen kazanımlar ile sosyal eleştirinin yöntemi, gelişim şekli ve gelişimi konusunu irdeledik, edebi eleştırinin temelleri ve edebî eser üzerinde çalışma biçimi üzerinde durduk, özellikle girişte kritik bir yöntemin nasıl seçileceği hakkında bilgi verip eleştirinin şartları ve koşullarını irdeledik. İkinci bölümünde ise Dihok Üniversitesi Akademi Dergisi'nin ortaya çıkışı, varlığının önemi ve özellikle bu dergide yayımlanan makale ve incelemelerde edebiyat eleştirisine ne kadar önem verildiği üzerinde durduk. Bu araştırmaya bu ismin verilmesinin sebebi ise Kürtçe ve özellikle Kürt edebiyatı üzerine yapılan edebiyat eleştirisi çalışmalarının az ve zayıf olması ve özellikle edebiyat eleştirisinin amacının genellikle edebi eserleri tanıtmak ve güncellemek olduğu içindir. Bu araştırmada betimsel yorumlama yöntemi kullanılmış olup elde edilen veriler bu araştırmanın sonunda verilmiştir.

**Anahtar kelimeler** :Eleştiri, Toplumsal Eleştiri, Edebiyat Eleştirisi, Dihok Üniversitesi Dergisi, Kürt Edebiyatı.

**Sayfa Sayısı** **:** II+69

**Danışman** **:** Doç. Dr. Nesim Sonmez

# NAVEROK


KURTE ..... I

ABSTRACT ..... II

ÖZET ..... III

NAVEROK ..... IV

PÊŞGOTIN ..... VI

PÊŞEKÎ ..... 1

Nav û Nîşanê Lêkolînê ..... 1

Girîngîya Lêkolînê ..... 1

Rêbaza Lêkolînê ..... 2

Sînorê Lêkolînê ..... 2

Arîşên Lêkolînê ..... 2

Peykerê Lêkolînê ..... 2

1. REXNEYA EDEBÎ, REXNEYA CIVAKÎ Û ARASTEYÊN REXNEYÎ ..... 4

1.1. REXNEYA EDEBÎ ..... 4

1.1.1. Çemk û Zaravayên Tiyorî yên Rexneya Edebî ..... 4

1.1.2. Kurtîyek li Dor Pênaseya Rexneya Edebî ..... 4

1.1.3. Mêjû û Serhildana Rexneya Edebî ..... 5

1.1.4. Kurteyek li Dor Kar û Erkên Rexneya Edebî ..... 7

1.1.5. Rexneya Rexnê ..... 11

1.1.6. Peywendîya Rexneya Edebî bi Zimanî ve ..... 15

1.2. REXNEYA CIVAKÎ ..... 16

1.2.1. Serhildan û Danasina Rexneya Civakî ..... 17

1.2.2. Peywendîya Rexneya Edebî bi Civakî ve ..... 20

1.2.3. Peywendîya di Navbera Edeb û Aydolojîyê da ..... 25

1.2.4. Edeb û Gorankirinê Civakî ..... 27

1.2.5. Binema û Prensîbên Rexna Civakî ..... 29

1.2.6. Arasteyên Tiyora Rexzna Civakî Di Nav Vekolînên Edebî ..... 30

1.3. ARASTEYÊN REXNEYÎ ..... 30

1.3.1. Arasteya Ji Derveyî Deqî ..... 30

1.3.2. Arasteya Ji Nav Da ..... 31

2. DANENÎYASÎN Û DESTNÎŞANKIRIN Û ŞIRAVEKIRINA GOTARÊN REXNEYÊN DI GOVARA ZANKOYA DIHOKÊ DA ..... 32

**2.1. Kurteyek li Ser Govara Zankoya Dihokê................................................32**
**2.2. Destnîşankirin û Şîrovekirina Babetan....................................................32**
**ENCAM.........................................................................................................55**
**ÇAVKANÎ......................................................................................................57**

**PÊŞGOTIN**

Rexneya civakî weku mîdodeka rexneyî ya peywendîyeka bihêz û êkser digel civakî heyî. Di qonqxên mêjûyî yên cuda cuda da derbaz bûye û gorankarî bi ser da hatîye ku bişêt zêdetir bikevîte di xizmeta berhemên edebî da. Herwesa weku ezmûneka civakî ku piştbestinê li ser berhemên edebî diket jibo derbirînkirinê ji ketwarê civakî, jiber ku têkistê edebî yasayên edebî bi xwe ve digirit. Lewma jî herdem weku hoyekê dihête niyasîn bo arastekirina boçûna berif layenên girêdayî civakî. Ji wan layenan jî kêmasî û dab û nerêt û arêşe û asteng û her xaleka girêdan pêve heyî û bizavê diket bigehînit û paşê wan xalan çareserîyê bo bibînit, herweku hindek ji lêkoleran wesa dibînin ku ev rexneye xalên lawazên civakî destnîşan diket û çareser diket. Ji layekî dî ve rexneya civakî dibîte ew peywendî ya ku di navbera berhemê edebî û civakî da heyî ku peydabûwî û herwesa ya girêdayî ye bi zanistên mirovayetî ve. Wate, ew mîtideya ku giringîyê bi arêşên civakî didet bi rêka berhemên edebî û di heman demê da bi erkê çareserkirina wan jî radibît.

Ev lêkolîne bizaveke ji bo destnîşankirin û dîyarkirina kar û erk û arasteyên rexneya civakî û çewanîya serederîkirinê digel da bi şêweyekê zanistî û lojîkî, bi taybetî di nav berhemên edebîyên kurdî da. Herwesa ew kêmasî û arêşên civakê kurdî têda dinalît û çewanîya serederîkirina kesên dahêner di warê berhemên edebî da digel wan arêşe û astengan û dîsan çewanîya serederîya rexnegirên kurd digel têkistên edebî bi têgehekê civakî û peyrewkirina mêtoda rexneya civakî li ser wan berhemên edebî. Herwesa vê lêkolînê bizav kirîye li ser astê ekademî li ser vê mijarê birawestît û Govara Zankoya Dihokê ya Akademî destnîşan kirîye ji bo ku bibîne meydana karê lêkolînê û têkistên wê bihelsengînit yên ku girêdan bi rexneya civakî ve heyî. Li dûmahîyê jî derencam ketîne dest û li ber çav rohnîyek dirûst bûye li dor çewanîya peyrewkirina vê mîtoda rexneyî ya girîng bi bi taybetî ji layê rexnegiran ve.

Vê vekolînê dîyarîyî bo dayîk û babên min ku herdem piştevanîyên min bûwîne bo temamkirina xwandinê û bi destveînana pilên bilind û bo hemî kurdên dilsoz û hezjêkerên peyva kurdî.

Pir ji dil sopasîya Assoc Prof. Dr. Nesim SÖNMEZ dikim ku wî bi erkê serperîştîkirina vê lêkolînê ra bûye û herweha Profesorê Harîkar Dr. Nîmetulah Hamid Nihêlî ku herrdem piştevan bûye bi arastekirina şîretan û dabeynkirina jêderên pêdivî. Herwesa Mamosta Ehmed Yasîn Ehmed ku hijmareka jêderan

pêşkeşî me kirin û em ji şîret û amojgarîyên xo bo xizmetê vê lêkolînê bê behir nekirîn, Dr. Heval ku herdem piştevanê serkeftina me bûye û komeka amojgarîyan arasteyî me kirîye, karmend û hevalên pertûkxana Nelbendî ya Zankoya Dihokê ji bo dabînkirina jêderên pêdivî, stafê Govara Zankoya Dihokê ya Akademî ku digel min da mandî bûn kêşayî û herwesa herkes û heval û layenekê harîkarîya me kirî bo encamdana vê lêkolînê.

Van-2023

**PÊŞEKÎ**

Rexneya edebî bi çendîn metod û rêbazên cuda bi dirêjahîya dîrokê dihête nasîn. Her rêbazekî jî pênase û serhildan û qonax û binemayên xwe hene. Rexneya edebî bûye hevkarekî bi hêz ji bo peydakirina berhemekî edebî ya bihêz, bi hemî curên xwe, anko faktorê sereke ji bo pêvebirina berhemên edebî û derbazbûn bo qonaxa nûke. Ev lêkolîne; pişkeke ji cîhana rexneya edebî ye ku têda zêdetir li ser rêbaza rexneya civakî kar hatîye kirin. Ji layê mêjû, serhildan, binema, prensîb û peywendîya wê bi civakî ve herwisa şîrovekirina bi hindek gotarên rexneyî ve hatîye kirin, li ser rexneya civakî hatîye dariştin, bi şêweyekî zanistî û hunerî kar li ser wan gotaran hatîye kirin ku pêxemet zêdetir xizmeta vê rêbazê bihête kirin.

Ji layê dî ve nivîserên kurd hemî deman hevpişk bûyîne digel xem û nexweşî û bîr û bawerîyên xelkê xwe ku nûyîneratîya ewan biken bi rêka rengvedanên layenîyên civakî di nav berhemên edebî da. Ta çi radeyek xudanên wan bûne nûnerên xelkê xu, bo veguheztina jîn û jîyana wan rexnegirên ekademî pitir ji hemî rexnegirên dîtir behsî evan babetan kirîye. Ji ber hindê jî dê bînîn çendîn nameyên mastir û doktorayê û vekolînên zanistî hatine nivîsîn li ser ew ê arasta civakî di nav vekolînên wan da berceste bûye û heta çi radeyek bi şêweyekî rastewxû behsî rexna civakî kirîye.

**Nav û Nîşanê Lêkolînê**

Nav û nîşanê vê lêkolînê, rexneya civakî di kovara Zankoya Digokê ya Akademî da ye. Mebesta me destnîşankirina wan lêkolîneyên girêdayî rexneya civakî ku di nav kovara Zankoya Dihokê da hatîye hembêzkirin. Wate du layenan bi xo ve digirît. Layenê tîyorîyê rexneya civakî, zêdebarî layenê praktîkî ku li ser wan gotarên di nav kovarê hatîn, hatîye encamdan. Herwesa armanc ji helbejartina nav û nîşanê vê vekolînê ew e ku di nav ew vekolînên me hilbijartrin da arastên rexneya civakî dîyar diken û hiwîrî li ser rawestin ka ta çi radeyek ev araste ye di nav wan da berceste dibin.

**Girîngîya Lêkolînê**

Jiber ku kovara Dihokê ya ekademî êkem kovara zanistî, ekademî ye li ser astê bajêrê Dihokê dihête weşandin û di hemî biyavekê mirovayetî, zanistî û hunerî da gotarên rexneyî têda dihête weşandin. Herwisa ev kovar, dergeheke ji bo xizmetkirina bizava rexneyî li deverê. Lewra me bi zanistî ev lêkolîn li ser vê kovarê kir ku em bigêhêne wan encamên ku xizmeta her du layanan diken. Herwisa

giringîya babetê di wê yekê da ye ku ev vekolînên edebî ew ên di nav Kovara Zankoya Dihokê ya akademî da belavbûyîn, ta çi radeyek vekoleran amaje bi şêweyekî rastexo yan ne rastexo binemayên rexneya civakî tî çi da bi kar înaye. Çunkî tîyora rexneya civakî gelek babet û binemayan bi xwe ve digirit. Wekî, Rexna Marksî, sosyolojîya janirên edebî, bercestekirina kêşên civakî, rawestan li dijî tepeserkirina afiretê di nav civakê da û hwd.

**Rêbaza Lêkolînê**

Ev ê lêkolînê rêbaza saloxdanê û şîrovekirin ya peyrewkirî bi kar anîye.

**Sînorê Lêkolînê**

Sînorê lêkolîna me ya dîyarkirîye ku ew jî helsengandin, pêdaçûn û şîrovekirine bo wan vekolînên edebî li kovara navberî di navbera salên 2010an hetanî 2021ê ku dibine 24 hejmar. Bi taybetî ew lêkolînerên girêdayî rêbaza rexneya civakî.

**Arîşên Lêkolînê**

Arîşe di hindê da bû ku ta radeyekî me zehmet li peydakirina hejmarên kovarê ve dît. Ji ber ku dîtina wan bi du şêwa bû, ew jî hejmara wan kovarên her ji salên 2010an ta 2016an bi şêweyî laperî bûn. Dîsa ji sala 2017an ta 2021î bi şêweyî elektronî bûn, yanê datayeke durust cih û karê kovara Zankoya Dihokê da nebû. Lê piştî mandîbûneke zor me hemî ew hejmare peyda kirin. Zehmetê duyê, çendê dabû ku vavartina ewan hejmara bû aristên rexneyî û bi arista rexna civakî û herwisa hindek caran em pêdivî bi wergêranê bûyîn ji zimanê erebî bo zimanê kurdî. Herwisa nebûna jêderên bi zimanê kurdî weku pêdivî dîsa êk ji arîşeyên here mezin bû. Lewma em neçer bûwîn me piştbestin li ser jêderên erebî kir, bi mil bi mil wan jêderên kurdî yên li ber dest heyîn.

**Peykerê Lêkolînê**

Ev lêkolîne ya dabeşkirî ye li ser du beşan ligel destpêk, encam û çavkanîyan. Pişka êkê ji du babetên serekî pêk dihên. Babetê êkê ew a li jêr navê têgeh û pênase û mêjûya rexneya civakî ku dabeşî penc basan dibît. Basê êkê ew a li jêr navê rehendeka mêjûyî ji bo serhildana tîyora rexneya civakî. Arastên rexneya civakî ku ew jî ji çar nav û nîşanên lawekî pêk dihatin. Wek arasta rexneya civakî, arasta çendayetîyê, arasta dîyalektîkê û arasta bunyadgerî ya pêkhateyî. Basê duwê binema û pirensîpên rexna civakî. Basa siyê, peywendî di navbera edeb û civakê da. Basê çarê, peywendî di navbera edeb û aydolojîyayê da. Pasê pêncê edeb û gorankarîyên civakî. Babetê dûê ew a li jêr navê arastên tiyora rexneya civakî di nav vekolînên

edebî da, kovara Zankoya Dihokê wek nimûne ku ew jî dabeşî sê basan dibit. Basê êkê ew a li jêr navê arasteyên rexneyî, ew jî dabeşî du babetan dibit. Ji wan arasta ji derveyî deqê û arasta ji nav deqê da. Basê duyê ew a li jêr navê rexneya rexneyî, ew jî ji sê babetan pêk dihên; têgeha rexnea rexnê, pênaseyên rexna rexnê û erkên rexna rexneyî ye. Pasê siyê ew a li jêr navê mîtoda rexneya civakî ye, ew jî dabeşî du babetan dibit. Ji wan serhildan ûdaneniyasîna rexneya civakî, binema û pêngovên rexneya civakî.

Pişka duwê ew a li jêr navê daneniyasîn û destnîşankirin û şîrovekirina gotarên rexneyî di kovara Zankoya Dihokê da ku ew jî ji du basên serekî pîçik hatîye. Basê êkê me kurteyek li dor kovara Zankoya Dihokê ya Akademî behs kirîye. Basê duwê destnîşankirin û şîrovekirina babetan kirîye. Ew ên girêdayî bi arista rexneya civakî ve di nav hemî wan hêjmarên kovara Zankoya Dihokê da ji sala 2010an ta 2021î.

# 1. REXNEYA EDEBÎ, REXNEYA CIVAKÎ Û ARASTEYÊN REXNEYÎ

## 1.1. REXNEYA EDEBÎ

Di bin vê serenavê da rexneya edebî bi berfirehî hatîye nirxandin.

### 1.1.1. Çemk û Zaravayên Tiyorî yên Rexneya Edebî

Gelek lêkolîneran wateyên cuda û boçûnên ciyawaz dayne çemek û zaravê rexneya edebî û her serdemekî bi şêwazekê cuda hatîye baskirin gorankarî bi ser da hatîye û ji wan jî "rexne anko pişkinîyîn, hevsengî û hukumdan, li hindek ji rexnegiran didine dîyarkirin ku rexne û karê wê lêkolîna berheman e û şîrovekirin, ravekirin, hevsengkirin û paşê jî hukumdan e" (Ehmed eş-Şayîb, 1994: 116). Li vêrê çendîn xal bo me dihêne destnîşankirin.

**Pişkinîn**: Anko dîtinên giştinîn li ser berhemê edebî û bi xwendineka kûr ji bo vedîtina xalên dikevin li jêr rexnê.

**Hesengî**: Ew jî dîyarkirina her du layan e, xalên negatîf û pozîtîf yên berhemî û destnîşankirina wan her du cure xalan.

**Hukumdan**: Ev e jî girêdayî helsengandina berhemê ye û paşî dana hukmê ye li ser. Lê berî xala hukumdanê pêdivî, berhem bihête şîrovekirin û ravekirin da ku baştir bo rexnegirî dîtin durust bibin û paşî hukmî li ser bidet.

Bi wata wê ya hiwîr "rexne hunerê lêkolîna têkstan e û gîyanê her lêkolîneka edebî ye. Ji saloxetên rexnê, wênên aşûpî ne, helçûnên hestan e, hestgirînên hunerî ne û rexne, wan saloxetan dîyar diket û şîrove diket" (Mihemed Mindûr, 1996: 14).

Ereban jî zaravê rexnê bo du xalan bi kar înaye ew jî "xala êkê cudakirina başiyê ji xirabîyê û ya duyê jî kêmasî". Ew her du xal jî bi rêka "şîrovekirin, cudakirin û hukumdanê bi kar înayine" (Muhemmed Ebdulmunîm Xefacî, 1995: 9).

### 1.1.2. Kurtîyek li Dor Pênaseya Rexneya Edebî

Gelek pênase ji layê lêkoler û rexnegiran ve bo rexneya edebî hatîye kirin. Her rexnegirekî ji kojiyekî dîtinên xu darîştîne û rexnegir heye wek huner temaşeyî rexneya edebî kirîye û "rexna edebî, hunerekê sirûştî ye dî jîyana mirovî da" (Ehmed eş-Şayîb, 1994: 106). Wate rexneya edebî peywendîya bi jîyana mirovê ve heye. Çûnkî mirov jî pişkeke ji dahênana berhemê edebî ye. Rexneya edebî ne bi tenê hukman li ser berhemên edebî didet, "rexne ew e ku mirov hindek hukmên berela bidet. Belku ya girêdayî tê şikestin û şîrovekirinê û paşî piştbestinê li ser encamên dûmahîyê diket û hukmî didet" (Ehmed eş-Şayîb, 1994: 113). Ji layekî dîve "rexneya

edebî diyareka civakî ye” (Ehmed eş-Şayîb, 1994: 170). Wate edebî û civakî peywendîyeka bihêz digel hev heye.

Rexne bi xu janirên nûy yên edebî diînite hebûnê “ta nûke rexne ya diwîre ku bi tinê çalekîyeka hizrî û çêjê ya avaker bît, ku bi rêka şîrovekirin û ravekirin û helsengandinê bihête kirin. Herwesa armanca rexneyê avakirina janirên nûy yên edebî ye. Bi rêka daneniyasîna wan û dîyarkirina bûn û geşkirina wan janiran e” (Macîde Himûd, 1997: 9).

Ji pênaseyên din yên rexneya edebî, “rexneya edebî, hunerekî kesukî ye. Pitir piştbestinê li ser roşenbîrî, dîtin, destpiyakîyê û bîrtîjiyê diket ku ji rêbazekê biket” (Mihemed Ebdulmunîm Xefacî, 1995: 16). Wate; ew layanên hatine baskirin giringtir in ku rexnegir rêbazekê peyrew biket. Lê pêdivî bi gotarekê heye “Rexneya pêdivî ye ji bo edebî, karê edebî pêdivî bi gotarekê heye ku wî karî ron biket” (Riçwan Vava, 1997: 10). Lewma jî “eger têkevê rexnê hukumdaran bit, rexneya edebî dana hhûkumî ye li ser berhemê edebî” (Îbn Ferec Qudame b. Cafer, 1999: 15).

### 1.1.3. Mêjû û Serhildana Rexneya Edebî

Li dor peydabûna rexneya edebî gelek boçûn hene û ji wan jî “peydabûna rexneya dizivirit bo serdemê yunanîyan. Ji ber ku têbînî û boçûnên xu li ser hozanên wî serdemî didan û ewan têbinî û boçûnan qalibê rexnê li ser wan berheman werdigirit. Ew an li ser binyatê çêj wergirtinê boçûnên xu didan yên ku bizanin ku hunerekê rexnê ye. Eger serdemê Elyade û Odîse ku bowîne hîvên ji bo rexbegirtinê, ji ber ku têkstên wan helsengandin li ser binyatê hezîn takî û civakî” (Ehmed eş-Şayîb, 1994: 106). Piştî ku hozan hatîye hebûnê gorankarî di vê biyavê da peyda bûn. Li çerxê pêncê berî zayînê, hozana zarveker li esîna hate hebûnê û hozanvanan pitir girîngî da vê corê hozanê. Çûnke hozana zarveker xu bi xu cûrekî rexnê bû bo jîyanê. Lewma jî delîveya berfirehbûna rexnê û kûratî di layenên wê da hate hebûnê (Ehmed eş-Şayîb, 1994: 107).

Her ji kevin da rexne hebûye, “rexneya kevine bi kevinatîya mirovî, bi têgehê wê yê giştî li wî demî peyda bûye. Demê mirovî hizir kirî û têbînî kirî û cûdabûn kirî” (Ebdulezîzî Etîq, 1972: 5). Wate, her ji demê peydabûna mirovî rexne jî digel peyabûye. Çunkî mirovî hizir kirîye û dîtinên xu li ser her tiştekê dewrûber dayine.

Dem bo demî corên nûtir yên rexneya edebî derkeftin “Corekî nûyê rexneyê li dev yûnanîyên kevin û nûyî peyda bû. Ew jî rexne li dev feylesofan, ku pitir di nav edebî yûnanî û romanî û edebê ewrûpî da peyda bû. Wî cûrî jî zêdetir girîngî dida

gotinê û watayê û babetê û ewan jî Elyade û Odîse kirne biyavek bo lêkolîn û hizirkirinê" (Ehmed eş-Şayîb, 1994: 108). Û bi vê rengî berdewam kir ta ku çerxê çiwarê zayînî "li çerxê çiwarê qonaxa rexneya kevin bi dûmahîk hat û ji sinorên felsefî derket. Rexnegiran jî pitir li ser van babetan xwandin û zêdetir şehreza bûn û êdî ber bi arasteyeka baştir çûn. Ew jî ber bi kûratî û şîrovekirina dîyardên edebî û vegerandina wan bo binyatê wan yê durist" (Ehmed eş-Şayîb, 1994: 112).

Dîsa "eger rexneya edebî li ser astê tiyorî û çespandinên wan, bizivirin bo pirtûka Arîsto 'Hunerê Hozanê', êkem navê rexnegir ku bîrdanka mêjûyê amaje bo kirî digel Arîstoyî. Ew jî navê hozanvanê romanê Horas" (Elî Hedad, 2000: 17).

Eger biçine li ser astê Awrûpa bi giştî " li Awrûpa jî gelek hozanvan dihêne hijmartin bi rexnegir, ji wan jî li çerxê rênîsansa ewrûpî 'danitê 1321' hozanvanê îtalî ku yê bernîyas e bi dastana hozanekî 'Komîdîya Îlahî' û du pertûk jî li dor rexnê hene 'Welîme' û 'bi zimanê giştî' herwesa hozanvanê îngilîz 'Con Draydin 1700' ji pêşengên rexneya îngilîzî dihête niyasîn ku hindek bi babetê rexnê didene nîyasîn. Dîsan hozanvanê frensî 'Biwalo 1711' ku rêkxistîyeka rexneyî damezrandîye bi navê 'hunerê hozanê" ku bûye jêderekê girîng bo lêkolînên hozana klasîk. Dîsa çerxê nozdê girîngtirîn rexnegirê dîyar bo edebê îngilîzî 'Masîyo Arnuld 1888' û pirtûka wî 'Karê Rexnê' cihekî girîng û kartêker li Awrûpa girt". (Elî Hedad, 2000: 18-19).

Mêjûya rexnê li destpêka çerxê ronesansê taku naverasta çerxê hejdeyê bi dirustahî hate damezrandin û geşeger û dîtinên xu li ser berhemên edebî darîştin. "Di ser vê çendê ra gorankarî li ser zaravî peyda bûn û gelek bîr û boçûnên cuda di navbera rexnegiran û hîlên serekî yên rexnê li Awrûpa peyda bûn ku ew jî di sê qonaxan da bûn. Ya êkê desthilat, ya duyêmêşk û yasê çêj. Lê di ser van xalên cuda da her takek yê azade bi derbirînên xu yên rexneyî" (Rîniye Wîlîk, 1988: 65).

Herwisa pêdivîye em bizanin ku "mêjûya rexneya edebî cihê girîngîdanê ye. Eger çi peywendî jî digel mêjûya nivîsînê nebin. Çûnke dibîte pişkek ji mêjûya hizran ku hizran jî peywendîyeka bi hêz ya digel berhemên edebî hey" (Rîniye Wîlîk, 1988: 65). Çunkî êk ji regezên serekî yên berhemê dahêneyê edebî hizr e. Mil bi milê xeyalan şêwaz û hwd. Ji ber vê çendê hizirkirin di dahênana berhemekê edebî da, rexnegirtine li ketwarî, anko li dîf vê boçûnê berhemê edebî li bin sîbera rexnê ji dayîk dibit.

Gelek caran "mêjûya rexnê girîngîyê nadete Arîstoyî û îtalîyan li çerxê ronesansê. Û frensîyan li çerxê hevdê û dibêjit mêjûnivîsên edebî pêdivîye rexnegir bin" (Rîniye Wîlîk, 1988: 22).

Ji layekî dî ve boçûnek heye ku mêjû, rexnê girêdidet bi zanistê ciwanê û herdemê mirovî hizir di ciwanî kirî. Li wê demê rexnê jî serhildaye "mêjûya rexnê pişkeke ji mêjûya hizra ciwanê" (Rîniye Wîlîk, 1988: 20).

Derbarey mêjûya rexneya civakî jî em dişên bizivirînin bo her ji sala 1800 pertûka Ebqerîyeta Mesîhî ya Şatobiryan û pertûka Li Dor Edebî ya Medam Dustal Şorşeka rasteqîne bû. Her wisa Bonald li ser demê Napolyoni dı gotarekö da lı rojnameya İgard Frensa gotıneka berniyas kır. Derbırinö jı civaki dıket (Civan Vava, 1997: 139).

Derbarey Iraqî jî destpêka rast û durist peydabûna rexneya edebî li Iraqê dizivirit bo sala 1920 zayînî. Demê rojname û govar hatine weşandin û têda gotareka Muhemmed Mehdî el-Besîrî ku li ser şoreşa Îraqê nivîsîbû bi layenekê edebî, ango gotara navbirî li ser layenê edebî bû bi şoreşa Iraqê ve (Rîniye Wîlîk, 1988: 42).

Daku em bizanin em dê çawa mêjûya rexnê zanîn pêdivîye berê vê pirsê em bizanîn kanê rexne ç, ye? Ev pirsa ku dibêjit rexne çîye "bi vê rêkê dê zanîn mêjûya rexnê kengê ye. Lewma Wîlîk, geheşte wê bawerîyê ku peywendîya di navbera rexneyê û mêjûyî da hey" (Rîniye Wîlîk, 1988: 22). Bo vê çendê jî divêt poştbestin li ser jêderan bihête kirin, daku ev zanîne bihête dîyarkirin.

Li vêrê li nîveka cedwelê durist dibit "bi têgehê rexnê dê pêvajoya mêjûyê dîyar bit û mêjûyê dibit têgehê rexnê bihête rastvekirin" (Rîniye Wîlîk, 1988: 22).

Di navbera mêjûya edebî û rexneya edebî da rexneya edebî berî mêjûya edebî ye û ya sirûştîye ku çêkerê edebî rexnegir e (Muhemmed Mendûr, 1988: 5).

#### 1.1.4. Kurteyek li Dor Kar û Erkên Rexneya Edebî

Rexneya edebî, sererayê erkê xu rexneyî li ser berhemên edebî lê xizmetê jî digehînite mirovayetîyê bi giştî "rexneya edebî ne bi tenê bi wî karê ra dibît, belku xizmeta jîyana mirovayetîyê jî diket bi hemî şêweyên xu (Salih Fiçil, 1996: 9). Wate çûnke mirov jî pişkeke peydabûna berhemê edebî. Lewma dê karê rexneya edebî jî geşekirinê dete pêşveçûna mirovî, "karê rexneya edebî li wî demî destpê diket. Demê berhemê edebî dihête hebûnê anko edeb, rexnê li ser xu disepînit daku têgehiştin û ravekirin û şîrovekirina berhemê edebî bidete dîyarkirin û hukmî li ser bidet" (Ehmed eş-Şayîb, 1994: 116). Ji layekî dî ve "rexneya edebî buhayê berhemê edebî

didete dîyarkirin li ser wan binyatên berhemên edebî li ser dihête avakirin.” (Ehmed eş-Şayîb, 1994: 117). Bo nimûne eger layanê hizrî di hozanê da wergirîn ku êk ji binemayên avakirina berhemê edebî ye. Li vê haletî rexne dê buhayê hizrî di wê hozanê da dete dîyarkirin. Kanê ta çi rade hozanvan têda yê serkeftî bûye di darêtna hizra hozanê da.

Her dîsa eger babetê edebî siruşt û mirov bin, lê babetê rexneya edebî edeb bi xwe be, anko ew axaftina rêkxistîye ya mêşk û hesta mirovî wêne diket (Ehmed eş-Şayîb, 1994: 118). Elî Heddad dibêjit “Hozanvan êkem kes e bi kiryara rexnê radibît (Elî Heddad, 2000: 16). Wate, nivîserê berhemî, demê berhemî xu da dirêjit. Ew bi xu li bin sîbera dîtinên xu yên rexneyî berhemê xu dinivîsit.

Ji layekî dî ve karê rexneya edebî be lêkolîna berhemê edebî biket weku dîyarde û giringiyê bi şîrovekirina karê edebî bidet ku ev çende jî divêt rexnegirî dûr bixînit jî kartêkirînên normal bo naverok û ruxsarê wî berhemî (Rîniye Wîlîk, 1988: 17). Ango nabît rexnegir bi tinê dîtinên xu yên kartêker li ser berhemê edebî bidet, belku divêt wî berhemî li ser mîtodeka rexneyî ya ku digel wî têkstî bigonicît şîrove û helsengînit.

Rîniye Wîlîk dibêjit “şîrovekirin çêja têşkistî dikujit. Lewma karê rexneyê ew e divêt xizmeta çêjê biket” (Rîniye Wîlîk, 1988: 17). Wate, nabît rexne çêja berhemê edebî aloz biket, yan ji nav bibet. Belku divêt xizmeta wê çêjê biket daku xuner jî digel wergirtina wê çêjê yê mifadar bît.

Şêwazgerîyê jî rol di karê rexneya edebî da heye. Şêwaz jî rolê xu digêrit di babetên rexneyî da. Çûnkû jêwaz jî piştbestinê li ser ravekirin û şîrovekirinê diket û peywendîya di navbera şêwazkeriyê û rexnê da heye. Çûnkû her du pêkve karî li ser têkstî dikin. Lê rexne bi hemî ruxsaran serederê digel têkstî diket û şêwazgerî bi azadîyeka kêmtir reftarê digel têkstî diket (Mîs Xelîl Mihemed, 2006: 18).

Eger me bivêt em çêjî ji berhemên edebî wergirin û xwe bigehîninê, pêdivîye em vegerîn bo rexnegirî. Çûnke erk û karê rexnegirî ew e bercestekirina çewanîna berhemê edebî û helsengandina wê biket û bidete dîyarkirin kanê çewa edeb digel civakî têkel dibit (Nursirb Frayî, 1991: 9).

Ji layekî dîve rexne nabête lêkolîneka rêkxistî, eger berhemê edebî rexnê rêkneêxit (Nursirb Frayî, 1991:20). Divêt bi durustahî berhemê edebî li ser binemayên zanistî û hunerî hatibîte avakirin, dakû rexne jî bi rolî xu bişêt rabibît û

karê xu encam bidet. Çûnke berhemê edebî ne bi tenê dariştina karên civakî ye, belku sîstemekê rêkxistî yê axaftinê ye dihête nivîsîn.

Her wisa karê rexneyê sebaret rexnegirî heskirine bi spzê, li demê wergirtina berhemê edebî û derbirînkirine ji wê sozê (Mihemed Zekî el-Eşmawî, 1994: 172). Pêdivîye rexnegir xudan hesteka bi hêz bit û bişêt bi rêka wê hizra hestikirinê hemî sozên di nav têkstî da aşkira biket û li ser birawestît û dîtinên xu li ser bidet.

Dîsa rexneya edebî karekî rêkxistî ye û pêdivîye li dîf binemayên wê mêtoda dihête helbijartin bo têkstî kar li ser bihête kirin. Rexneyê edebî, karekî xwedan bernameyeke hewlî ew e deda berhemekî edebî bixoynêtewe û lêkdatewe û ravey bika û helîsengînê (Carlîs Birêslêr, 2002: 21). Ewe ne bo hemî dema digonicît, "Zor car nakirê rexneyê edebî xu wek bernameyekî rekûpêkî le naw xu da seyrê biken. Çûnke rexneyê edebî ligel şitêkîtirda pêwendî hebî, ew şteş piyê delên berhemî hunerî be bê berhemî hunerî karê rexneyî bo nîne" (Carlîs Birêslêr, 2002: 22). Wate, eger layenê hunerî di kiryara rexnê da bihête piştguhihistin li wî demî rexne cihê xu nagirit. Lewma zêdetir erkê rexnegirî ye ku pêverên hunerî li ber çav wergirît.

Bi kurtî em dişên karê rexneyê di van xalan da dîyar biken:

1.Helsengandina karê edebî, ji layê hunerî ve û dîyarkirina bohayê wê yê babetî li diwîv şîyanan.

2. Destnîşankirina cihê karê edebî li hêla pêvajoya edebî, piştî ku ji layê hizrî ve helsengandina karê edebî dihête kirin, pêdivîye cihê hêla pêvajoya edebî, piştî ku ji layê hizrî ve helsengandina karê edebî dihête kirin, pêdivîye cihê hêla pêvajoya edebî jî bizanîn.

3. Destnîşankirina radê kartêkirina karê edebî bi dewrûberan ve û radê kartêkirinê li ser û ev çende jî dibête helsengandina tevav bo karê edebî ji layê hunerî ve, zêdebarî layenê mêjûyî. Çûnke zor grîng e bihête zanîn ev karê edebî çi ji jîngehê wergirtîye.

4.Wênekirina saloxetên xudanê karê edebî bi rêka karên wê û dîyarkirina saloxetên wî yên hestî û derbirînê û dîyarkirina hokarên derûnî yên ku bûye. Eger bo duristbûna wî karî (Sîd Fikib, 2003: 129-130)

5. Eger peyva rexne di têgehê xu yê hiwîr da hukim bît. Wate, rexneya edebî hukimdane li ser berhemên edebî.

6. Karê rexneya edebî helsengandina karê edebî ye ji layê hunerî ve û dîyarkirina buhayê wê yê babetiyan e û buhayê wê yê derbirînê û hestê divî biyavî da

Sant Bûf dibêjit karê rexneya edebî ew e biçîte di xudê nivîserî da, daku xwînerên wî têkevin ya wînivîsî (Mihemed Ebdulmunîm Xefacî, 1995: 12).

7. Me li ser karekî agehdar diket ku hêşta ne hatîye xwandin.

8. Rêkeke bo fêrbûnê, bo ragehandinê û rêkeke bo razîkirina yên dî ku wekî me hizir biken.

9. Nivîserên berhemî rasparde diket.

10. Berpirse ji dîyarkirina layenên ciwan û ne ciwan di berhemî da.

11. Girîngîdan bi karên hevçerx yên ku mêjûyê li pişt kuhxistin.

12. Cûrekî dî yê edebî ye û taybeti manende bi vejandina wî edebê ku hindek kesên dî dinivîsin.

13. Karê ravekirinê û helsengandinê diket. Anko ravekirina berhemên edebî bo xwînerî (Gahir Ehmed Mikî, 1991: 49-50).

Ji layekî dîve Sanit Bof dibêjit rexne, hoyeke bo dîyarkirina hozana veşartî bi şêweyekê dahêner (Macîd Himûd, 1997: 16) anko hozan ya veşartîye taku rexnekarê xu li ser diket û ew rexneya ew bo diçit ew e ya afirandinê û dahênaneka berdewam diket.

Ji layê zanistî ve, zanistên gotara rexneyî li ser çend binemayekan di rawestîd û ji wan jî aliyeta gotara rexneyî û ferhenga rexneyî û zaravên rexneyî (Tewfîq ez-Zîdî, 2000: 18). Li vêrê dîyar dibit ku pêdivîye mîtodeka rexneyî bo tekstî bihête hilbijartin û li diwîf wê mîtodê karê rexneyî bihête kirin lio dîf ferheng û zaravên wê. Rexnê armanc hene: Armanca serekî ya rexnê ew e hewldaneke ji bo dîyarkirina rastîyê. Evca ew rastîya girêdayî getiwarê karî bît yan jî getiwarê giyanî. Lewma jî divêt rexnegir ewisa temaşey karê edebî biket ku avakerekê zimanîye û bi rêka wê dişêt rastîya di nav da bibînit ( Yusuf Nûr Ûç, 1994: 9).

Sererayî vê çendê rexneya edebî erkên xu jî hene. Rexnê dû erkên jêkcuda hene: Erkek ravekirin e û erkek hukumdan e anko, dana hukumekî ye li ser kêşeyeka edebî (Mihemmed Ebdulmunîm el Xefacî, 1995: 10). Bi vê çendê jî rexne dibite xwendin û têgehîştin û ravekirin û hukumdan ku mebest ew e lêkolîna bîr û boçûn û hizran bihête kirin (Mihemmed Ebdulmunîm el Xefacî, 1995: 11). Her wesa rexne li dev Golrîdc ew nîne ku bitenê pêkirîya karê edebî bi binemayên formî bideheye dşyarkirin û aşkirakir bikî. Belku guncandina karî ye digel xudê rexnegirî (Mihemmed Ebdulmunîm el Xefacî, 1995: 13).

Her zana û şehrezayekê rexneya edebî li diwîf dîtinên xu karê rexneya edebî daye dîyarkirin. Ji wan jî Bawind ku li def wî karê rexnê pişkinîna karê hunerî ye û her wisa Bawend û Elîyot hindek amîreyan bo karê rexnê didene dîyarkirin û bi vî rengî:

1. Şîrovekirin anko şîrovekirina karê hunerî jî nav da û dîyarkirina ew peywendîya di navbera layenên wê da hey.

2. Berawurdî, ew jî girêdana karê hunerî ye bi wî keltûrê bo dizivirît û aşkirakirina cihê wî jî wî keltûrî. Bawind bi çi şêweyan digel tiyora ravekirinê nîne (Mihemmed Ebdulmunîm el Xefacî, 1995: 13).

### 1.1.5. Rexneya Rexnê

Rexneyas Edebî, bi warekî zorê berfireh bi xwe ve digirit û boye egerê peydabûna çendên tiyor û rewitên cûracûr. Û peydabûna van tiyoran mijdarî û nerûhinî êxistîye di nav edebî da. Eger rexnegir xudan paşxaneyeka hizrî ya bihêz nebit beramber van tiyoran, asteng hêne di rêka wî da. Ji ber hindê gelek caran rexnegiran bi şêwazê xu serderî ligel têkstî kirîye û wekî yariyekê reftarî ligel kirîye. Lewra rexneyê xwestîye hindî çavdêrekê rexneyî hebit û rexnegiran araste biket û wan tîyorên aloz û tevlihev bo rexnegiran ruhin bikin. Ew çavdêr jî rexneya rexneyî bû (Qehreman Esed,2018: 23).

#### 1.1.5.1. Têgehê Rexneya Rexneyê

Ev cûrê rexneyê dê têkistekî înît ku berî wî kesekî dî rexne li wî têkstîgirtîye. Ew dê bo cara duwê rexneyê li wê tekstê kirît. Ev edibîte kiryara rexneya rexneyî. Nivîserek yan rexnegirek dê têkistê de tev hindek nivîser û xwendevanên dî ku têkistî raveken û bi karê rexneyî rabin li ser wî têkistê. Paşê rexnegir bi derbare rexnegirtinê radibit li ser rexneya ji layê wan nivîser û rexnegiran hatîye kirin bo wî têkistê ka aya ew binema û yasayên wê tiyora rexneyî bikarînayne yan ne? Ew ên têkist li ser hatîye avakirin ev meydane ya nûyî ye di biyavê rexnê da û bo destpêka sedê bîstê dizivirit. Ew bizava Tizivîtan Todorovî di pertûka rexna rexnê “un-critique la de critique-apprentissage’d roman” êkem bizav bû di vê biyavê da hatîye kirin. Di vê pertûkê da bizav kirye hindek berhemên edebî rûhen û berçav biket, li diwîv wî pîverî ku dubare pêdaçûn bo çawanîya bikarhatina ewan hizran bihête kirin di berhemên edebî yên çend salekan da. Ev pêşkêşkirine bo eger ku tizivîtan êkem kes bît evî zaravî bikarbînit (Nûreddîn Ciwînî, 2019: 183).

**1.1.5.2. Pênaseya Rexneya Rexneyî**

Ev e cureyê rexneyê jî weku her babetekê dî yê edebî yan mirovayetî çendîn pênase hene. Rexneya rexneyî yan piştî rexnê liqekî girîng yê xwandinên rexneyî ye ku têda prosêsa rexnê berdewam dibitû li vêrê xwendevan li rêza êkê dihêt. Rexneya rexneyî prosêseka nivîskî ye û çêkerên wê xwendevanên ku şarezayên di rêbazên rexneyî yên edebî da hey, lewra bi vî karî ra dibit. Erkê rexnegirê rexnê dubare berhemînana gotareka rexneyî diket ku destpêka berhemênana wê li ser karên edebî yên çîrokî û şi'rî bûye. Mebest ji dubare berhemênanê, berhemênana gotareka dî ya rexneyî ye li ser gotarekê ew jî bi rêka danûstandinê (Qehreman Esad, 2018: 26).

Sadetirîn pênase bo rexneya rexnê ew e ku bêjin zanîna zanînê ye, zanîna rêkên rexnegirtinê ye. Amraz û mîkanîzmên şîrovekirinê, bê girawendê rexneyî û pêşbînîyên rexneyî ye. Zanîna çawanîya karpêkirinê ye ligel armanc û binemayên rexneyî. Ew xwendineka taybetmend e, rexnê li wî tiştî digirit ew ê di gotara rexneyê da behs jê hatîye kirin. Di heman demê da jî xandineka nûy cuda ya rexneyê jî berhem diînit (Muhemmed Bilîd, http://jilrc.com (Ragehandin: 04.01.2023)

Ji layekî dî ve hatîye gotin ku rexneya rexneyî, gotareke li binemayên rexneyî û zimanê wê û zaravê wê û amîrên şîrovekirinê vedikolît. Ev e ji encamî ewan sernişîvî û serevrazîyan bûye ewên li serdemê modîrînîzmê û piştî modîrînîzmê peydabûyîn. Herwesa cudahîyek heye li ser vê çendê di navbera rexneya edebî û rexneya rexneyî. Di rexneya edebî da êk tuxm bi tinê têda heye ku ew jî vekolîna karên edebî û rêka gotina wan û çêjwergirtina wan vedikolit. Lê rexneya rexneyî du tuxm têda hene. Êk ji wan encamdana rexneya edebî ya tiyorî û praktîkî ye. Rexneya edebî weku proseya karkirinê beşeke ji rexneya rexneyî. Ev cudahîya di navbera rexna edebî û rexneya rexneyî heye. Bo egerê hindê ku rexneya rexneyî serbuxuya xwe werbigirit ku ta radeyekê zor berovajî rexna edebîye ji amraz û amîrên wê bigire ta ku zarav û rêka karkirinê. Û ya baştir ew e em hizra rexneya rexneyî biçespînin û rêbaza li ser hizra wê da bimezrînin (Yimîne b. Siwîkî, 2020: 38)

**1.1.5.3. Erkên Rexneya Rexneyî**

Ji ber ku rexneya rexneyî ya armancber e, lewra hindek erkên girîng radibît weku:

1.Bi rêkvekirina rexneya edebî radibit ji bo pişkinîna tuxmên aydolojî dijanirên edebî da. Herwisa bi aşkirakirina ewan karêgeriyan radibit ewên li ser

rexnegirî heyin. Weku karêgerîyên sîyasî, civakî, rûşenbîrî, dakû bo xwe rêbazeka rexneyî werbigirit.

2. Di demê xwendinê da du armancan bicihdiînit. Bi xwendina têkistê rexneyî radibît û paşan ya têkistê bixwe jî.

3. Li ewan karîgerîyên derûnî vedikolit ewên bowîne egerê hilbijartina rêbazeka rexneyî ji layê rexnegirî ve.

4. Bi aşkerekirina entolocîya rexna edebî û gihurînên wê ra dibit. Wan bi ewan hokar û mijaran ve girê didet yên ku dibine egerê pêşkeftina rexneya edebî.

5. Bi dubare avakirina huşyarîya xwendevanî radibît.

6. Peywendîyeka nûy di navbera xwendevanî û tekstî û têkistê rexneyî dirust diket.

7. Wan arêşan berçav diket, ewên peywêndî bisuruştên rexnê û zimanê wî ve heye Yimîne b. Siwîkî, 2020: 38).

**1.1.5.4. Kar û Mercên Rexnegirî**

Pêdivîye rexnegirê edebî, li bin komeka mercên zanistî û hunerî, karê rexneya edebî her çewa bit û çi mebest hebit ku bicih bînit, pêdivîye li ser rexnegirî dîtinên bihêz bo berhemê edebî hebin û bi lez têbigêhêt û xudan çêreka baş bît û şîyan hebin xu digel dilênîya edebî bigoncînit. Herwesa divêt yê dûr bit ji wan kartêkirina yên ku hukmên durist bo berhemî nedet. Herwisa divêt yê şehrezar bît li ser edebiyatan û mêjûwa wan bizanît û peywendîya wan berhemên edebî bi hunerên dî bizanît û têgehiştineka baş daku bişêt bi durustahî hukmên rast li ser berhemî bidet (Ehmed eş-Şîyab, 1994: 117). Herwesa binemayên serekî hene ji bo hunerê rexnî û bi vî rengî:

1.Bîrtîjî: Intelligence yan şehrezayî, ew jî ew e ku rexnegirî zanîneka berfireh bi hunerên edebî hebit yên ku rexnê bo araste diket.

2. Pişkdarîya Dilînî: Sympathy ew e ku rexnegirîşan hebin bişêt bigêhête hest û mêşikê nivîseran.

3. Xuyetî yan takî: Individuality, zivirîn bo xoyetîyê û derkeftin ji cîhana nivîserî bo cîhana rexnegirî bidet (Ehmed eş-Şîyab, 1994: 153).

Rexne zemînê bo xoynerî diket. Rexne rêkên mifadar bo xoynerî wêne diket. Çûnkî rexnegir kûrtir têdigehêt û şîyan hene cudahî biket di navbera regezên edebî û şîrovekirina têkstên wan û bi vê çendê dê berê xuwînerê dete ciwanê û hêza têkstê (Ehmed eş-Şîyab, 1994: 172).

Herwisa ji wan mercên ku pêdivîye li de rexnegirî hebin ew e ku şîyanên xu yên mêşikî bidete karî û zanîna hema hengîya ciwanê hebit û bişêt ronahîyên babetî bêxîte li ser başî û nebaşîyên berhemî ji bo şîrovekirina rexneyî ku hemî regeze di girêdayîne. Bi dîtina rexnegirî li ser berhemê edebî ku şiyan hebin bi gelek layenan dîtinên xu bidarêjît (Nebîl Raxib, 1999: 8).

Derbarey jîngeh û jîyana nivîserê berhemî pêdivîye li ser rexnegirî xu ji jîyana takekesî ya xudanê berhemî dûr biket daku bişêt bi dirustahî hukmekê babetîyan e li ser berhemî bidet (Nebîl Raxib, 1999: 10). Wateyê dûr bît ji kartêkirinên hevalînî û xoştiviyatî û ... hwd. Belku bi tenê divêt serederê digel têkstî biket. Her wisa erkê rexnegirîye ku bi hûrî xoynerê da (Nebîl Raxib, 1999: 18).

Êk ji gotinên ku peywendîya rexnê bi nivîsaerî ve ew e ku pêdivîye nivîser û hizirmend û rexnegir bibine nivîserê hizirmendê rexnegir (Macîd Ebdulmunîm Mucahîd, 1997: 8). Wate, divêt nivîser dêtin û gîyan û têgehiştina rexnê jî hebît daku dirustahî berhemekê edebî bi dahênît. Wate, dahênanê jî peywendîya bi rexnê ve hey û pêdivîye rexnegirê dahêner bit. Peywendîyeka mukim di navbera dahênanê û rexnê da heye. Em neşêyîn çi berhemên edebî bê rexne bibînin. Her wesa em neşên çi rexna bibînin bê dahênan (Macîde Himûd, 1997: 5). Wate, rexne dahênan e, jiber ku rexnegir demê bi karê rastvekirinê radibît xu bi xu rexnegirtine, lê gelek caran pênahesîyêt ku yê bi karê rexnê ra dibît. Êk ji mercên dî yên rexnegirîew e ku yê şehreza bît di pîşeya xu da merce li ser rexnegirê edebî ku yê şehreza bît di pîşeya xu da û ji wan jî pîşeya hunerî (Wehb Ehmed Rumiye, 1996:24).

Pîşeya hunerî bi tenê bo rexnegirî bes nîne û pêdivîye di hindek zanistên dî jî da yê şehreza bît. Pêdivîye li ser rexnegirî şeherzabît li ser berhemên edebî, belku da harîkarîya wî biken bo têgehiştineka zêdetir ya deqê edeb (Macîde Himûd, 1997: 10). Dîsan divêt hizreka berfireh hebit. Rexnegirê dirust ew e yê ku nermatîya hizrî li dev hey ku diwîr bît ji qalibên hişk û pitir yê vekirî bît û boçûnên hevdi jî boçûnên xu wergirît û yê razî bit (Macîde Himûd, 1997: 10).

Bartir dibêjit ne ya girîng erexnegir pênaseyaka rast û lojîkî bidete ciwaniyê. Belku derbirîn girîngtir e ku bişêt bi rêka wî derbirînê kiwîr biçîte di nav babetên xu da (Macîde Himûd, 1997: 17). Li vêrê her du babetên ciwanî û derbirîn weku du têgehên pêkve digirêdaytîne bo karê rexnê û rexnegirî. Pêdivîye rexnegir serederîka dirust digel her du têgehan biket kû bişêt debirînê ciwan ji ciwanîyê biket. Ji layekî dî ve rexnegirê baş li dev kartêkirina ew hunermendeyê ku kartêkirinê û çêjê û

derbirînê ji xoyetê biket û bi vê çendê nêzîkî dahênanê dibît (Macîde Himûd, 1997: 17).

Peywendîya rexnegirî bi dahênanê ve, binyatê bi hêzbûna kiryara rexnê ye. Kesê dahêner bît rexnegirekê bihêz e. Çûnkî eger ew kesî hestekê rexneyî û têgehiştineka kûr bo rexnê nebît, neşêt dahênanê biket yan jî yê berdewam bît di dahêna xu da bi rêka pêşvebirina xudê xu. Lewma jî çêja wî ya rexneyî dê wî paldet ku dahênanê biket berê ku berhemê xu bilav biket (Macîde Himûd, 1997: 18).

Gelek caran rexne berî berhemê edebî dihêt. Rast erexna edebî ya girêdayî edebî ye. Anko deqê edebî pêdivî bi rexnegirekî edebî ye daku ronahiyê bidete li ser xalên ciwaniytê û xalên lawaz bi rêka şîrovekirin û ravekirinê. Lê gelek caran rexne berî edebî dikevît. Ew jî demê xodanê berhemî berî nivîsîna berhemî bi dîtineka rexneyî li hizra xu dinêrit (Macîde Himûd, 1997: 19). Li vêrê bo me dîyar dibet ku du curên rexnegirên nivîser hene. Curek eweyêku rexnê bi tinê li berhemên diken daku pêşve biben û curê dî eweyê rexnê berhem diînin bi rêka çalakîyên dahêner mil bi milê çalekîyên rexneyî (Macîde Himûd, 1997: 22). Ji ber vê çendê em dişên bêjin rexnegir dahêner e çûnke nûyatîyê didete têkstê edebî.

Derbarê layanê derûnî jî, rexnegir piştbestinê li ser rastîyên derûnî diket, ji wan zar4avên taybet bi ravekirina hindek dîyarde û regezên edebî û hukumdan li ser karê edebî. Ji wan rastîyên derûnî jî hest û nest û li pişt hestî û palderin. Her wisa dilînî û helçûn û şîrovekirin û xeyal û ...hwd (Ebdulezîzî Etiq, 1971: 61).

Her wisa layenên mirovatî jî şenkisteyên xu hene. Layenên mirovatî di rexneya edebî da ji şehrezayiya xu bidetê ku piştbestinê li ser wan buhayan biket yên ku di xudî xo da parastîn (Yusuf Nûr Uç, 1994: 9). Şehrezayî li vê rê li ser têgehiştina rexnegirî bo tekstî dirawestîd. Kewate ew şehrezayî dibîte hokar ji bo bi wate êxistina têkstî.

### 1.1.6. Peywendîya Rexneya Edebî bi Zimanî ve

Ziman rolekê sereke dibînit, ji bo xizmetkirina berhemên edebî rêka rexnegirtinê. Ziman weku alavek ji alîyê mirovî ve bo têkgehiştinê di navbera endamên civakekî da dihête bikarînan. Bi parastina kelştûr û şaristanîya mirovayetîyê û pêkguhertina hizran di navbera civakên cuda da radibît. Anko ziman jimareyeka erkan bi cih diînit û her li ser binemayê wan dihête nasîn. Pênaseyên egro bo zimanî dihête kirin, li ser binemayên erkî dihête damezrandin. Herwîsa ji ber sirûştê edebî û rexneyî jî (Îsmaîl Hacî 2008: 17). Wate, zimanî erkê xu xu heye ji bo edebî û rexneyê

jî. Çûnke bi rêka wî zimanî berhemê edebî dihête hebûnê û her bi zimanî rexneya edebî jî li ser dihête avakirin.

Baştirîn alav bo derbirînê ji rexneya edebî ziman e. Aşkira ye alavê derbirînê di rexneyê da jî wekû gelek şêweyên dî yên peywendîkirinê ziman e (Îsmaîl Hacî 2008: 26).

Aşkarteye ku rexnê û berhemê edebî peywendîka bi hêz digel hev heye. Rexne jî herweku edebî kiryareka peywendîkirinê ye û amrazê wê serekî ziman e. Herwisa ziman du erkan bi cih diînit. Biryardana bûyeran û azirandina helçûnê ye (Îsmaîl Hacî 2008: 27).

## 1.2. REXNEYA CIVAKÎ

Sereray hebûna gelek mîtod û rêbazên rexneyî ku bi dirêjahîya mêjûyê serhildayne û werar kirîye. Rexneya civakî jî êk ji wan mêtodan e ku ta nûke jî bi berdewamî karê xu li ser berhemên edebî diket û zîndî maye û xudan gelek saloxet û binemaye. Rexneya edebî gelek layen hene ku bi dirêjahîya çerxên edebî dîyar bûye. Ji wan jî layenê civakî ku bawerîyê diînit huner ji valahyîyê peyda nabit. Belku berhyemê jîngeheka destnîşankirîye û demekî destnîşankirî û paşê rexneya civakî radibît bi zanîna peywendîyê di navbera hunerî û civakî û pêdivîye li ser rexnegirî jîngeha nivîserî û berhemê wî binîyasit (Nicûy Sabir, 1990: 5).

Rêbaza rexna civakî jî êke ji wan rêbazan ku nivîser û civakî bi hev du girê didet. Anko dişêyîn bêjin civak, bi rêka hindek rêdanan kartêkirinê li ser derûnê nivîserî diketin û di encam da nivîser bo qijkirina derûnî xu berhemekê edebî dinivîsit û bi vî rengî berhemê edebî ji dayîk dibit. Di heman demê da ew berhemê edebî kartêkirinê li civakî diket. Çûnkî ew berhem helgirê peyameka rast, ji ber hindê nivîser bizavê diket civakî arasteyî rêka dirust biket. Bi vê rengê dê şiyîn bêjin ku peywendîyeka dîyalêktîkî di navbera edeb û civakjî da heye. Çûnkî civak kartêkirinê li edebî diket û di heman demê da edeb jî kartêkirinê li civakî diket. Ev peywendîye li dor bazinekê dizivirit û hindî jîyan berdewam bît ev peywendîye jî dê ya berdewam bît.

Piştî geşekitrina rexneya mêjûyî, rexna civakî li cihê wî ser hilda. Û rexna civakî dihêt hijmartin ji wan mîtodên her serekî di nav vekolînên edebî û rexneyî da (Ebdî Hecî, 2008: 25).Û bi êk ji rêbazên girîng yên rexneyî di nav vekolînên rexneyê da dihête hijmartin ku di nav vê cûrê rexnê da civak dibîte jêderê vekolînên rexneyî. Ev rêbaz eli sala 18000î li ser destê Madam Dustayl (1766-1817) berçav bû. Piştî

pertûkek bi navê Li Dor Edebî/Hewlu'l-Edeb derxistî (Ebdî Hecî, 2008: 105). Di şiyandaye bêjin rexna civakî birîtî ye ji wê xwendina mêjûyî, civakî, aydolojî, rewşenbîrî di nav têkstî da. Dîsa peywendîyeka mukem bi wî ketwarî ve heye yê ku di nav da hatîye afirandin (Ebdî Hecî, 2008: 44).

### 1.2.1. Serhildan û Danasina Rexneya Civakî

Destpêka metoda rexna civakî bo dûmahîya sedeyê nozdê û destpêka sedeyê bîstê vedigerît ku her ji encamê werara mîtoda rexna dîrokî peyda bûye. Helbet girêdana berhemên edebî bi serdem û barûdox û dewreberîyên berhemî ve ji mêjwere hatîye behskirin.

Li duwîv evê metoda rexneyî, pêdivîye berhemê edebî di kojiyê wê yê civakî rabihête vekolîn û diwîvçûn li ser delaletên civakên derbirînên edebîyên berhemî bihête kirin. Anko divêt vekoler wê peywendîyê dîyar biket ew a di navbera berhemî û alîyê civakî yê berhem têda hatîye afirandin dahî. Çunkî bi dîtina vê metodê edebîyatê erkekê civakî yê heyî û edîb ne bes dişêt civakê xwe di berhemê da wêne biket. Belku dişêt civakek baştir pêşbînî biket û ji berhemê xwe berhem bînit bi rêka wê karîgerîya berhemê wî li ser civakê wî dihêlit. Bi dîtina vê metodê ew babet û kesayetî û jîngeha civakî û riwîdan û dîyardên civakî ewên di berhemî da hatîye bikarîna. Dibine hêmayên zimanê civakî (Emîn Ebdulqadir, 2005: 28). Bi rêka wan vekoler, dişêt karîgerya civakî li ser berhemî destnîşan biket.

Rexneya civakî ewan reh û rêşalan destnîşan diket ewên berhem têda peyda bûyî û ramanên berhemî li ber ronahîya wî civakî rave diket (Emîn Ebdulqadir, 2005: 29). Anko fere vekolerî zanyarên pêdivî hebin derbarê civakê nivîserî da wan zanyarîyan bikete kilîlek bo têhehîştîn û ravekirina berhemê nivîserî. Da bişêt rengvedana civakî di berhemî da berçav biket yan jî bercestekirina berhemî bo ewan ditin û layenên civakî biselmînit. Anko evê mîtodê peywendîyeka mumkin ya bi sirûştê civakî û hezar çînayetê ve heyî. Jiber hindê berhemê edebî dibîte nûnera jiyana civakî li ser astê komê (Emîn Ebdulqadir, 2005: 49). Helbet bi dîtina van, berhemihinerê serekiyê edebîyatê û dahênana edebî ye û verêjên karêgerîya civakî di hemî berhemekî da di berçav in. Lewra vekoler dişêt ewê peywendîya dîyalektekî di navbera berhemî û civakî da destnîşan biket. Çunkî herîkî ji layê xu ve karêgerî ya li ser layenê dîtir heyî û erkê rexnegirê civakî ye wî karêgerîyê destnîşan biket. Anko binyatê delaliyê berhemê edebî û binyatê "we'ya" civakî weku du bazineyên di nav

êkda çûwîne. Lewra li diwîv evê metodê berhemê edebî dibîte wênekê zindî û derbirînê ji komeka serûberên civakî diket (Emîn Ebdulqadir, 2005: 58).

Evê mêtodê gelek raber û zana hebûyîne û boçûnên wan yên buwîne rêk û amrazên diwîvçûnê jibo vedîtina karêgerî û karlêkkirinê di navbera deqê edebî û rehendên civakî da. Bo nimûne Madam Dîstayl dibêjît "*em neşên di berhemê edebî bigehên û bi dirustî çêj û xoşîyê jê wergirîn. Eger em ewan barûdoxên civakî nezanîn ewên bûwîne egerê ji dayîkbûna ewî berhemî*" (Ebdî Hecî, 2008: 24). Lewra bo rexnegirê civakî ya fere berhemê edebî di wê jîngeha civakî da bixwînit ewa berhem têda peyda bûyî. Herwesa Hîpollît Tîn, li sala 1853ê di pertûkeka xu da dakokî li ser wê boçûnê kirye ku berhemê edebî ewan tişta ava diket û dadihênit û rêkêxit ewên di nav civakî da di berbelav (Ebdî Hecî, 2008: 25). Dîsa evê arasteyê di boçûnên Marksîyetê da rengveda ye. Bi dîtina wan edebîyat weku amrazekê arastekirinê ye bo civakî (Ebdî Hecî, 2008: 33). Çuhkî edebîyat weku serxan dihête hijmartin û layenê naverokê cihê piwîtedana wan bû. Karil Marks wesa didît ku edeb ketwarekê civakî ye û nivîser di berhemên xwe da derbirînê ji wê çînê diket ewa ew biser ve. Ev ça çi ew derbirîne bi şêwekê huşdar bit yan dinehişşiyê dabît (Ebdî Hecî, 2008: 37). Ji layê dîtir Madam Dîstayil amaje daye ku fere edebîyat bi rêka peywendîya wê bi sîstem û dezgayên civakî ve bihête vekolîn. Herwesa Can Ciyu didît ku edeb, çalakîyeka civakî ye û derbirînê ji kamilanîya civakî diket. Lewra ya vere ew kesatîyên di berhemî da dihêne pêşkeşkirin bi rêka girêdana wan bi tevnê civakî ve bihête ravekirin. Û ser û sîmayê wan kesatîyan û taybetmendîyên wan û salûxetên wan di berhemî da ligel kesatîyên civakî bihêne hevberkirin û xwandin. Da ku radê karîgerîya kesatîyên civakî li ser dahênana edebîya nivîserî bihête destnîşankirin. Bo nimûne layenê rewiştî milmilanîyên çînayetî, cûrên kesatîyan, riwîdan û arêşeyên bi kesên civakî ve girêdayî ...hwd. bibine cihê ser rawestanê ji layê rexnegirî ve. Goldman digot "*biyatê berhemê edebî derbirînê ji kesatîya nivîserî diket ji alyekî ve û ya ewê komê yan civakî ewa nivîser têda jîyayî ji layê dîtir ve*" (Qehreman Es'ed, 2018: 29). Lewra fere vekoler li despêkê ewan derbirînên edebî destnîşan biket ewên delaletên civakî heyîn. Paşê girêdana wan derbirînan bi tevnê civakî ve biselmînit. Anko ev mîtode wê rastîyê diselmînît ka çawa edebîyatê sirûştekê civakî heye. Jiber hindê Corc Lûkaş digot "*fere rexnegir wê peywendîyê destnîşan biket ewa di navbera edebîyatê û civakê da heyî*" (Qehreman Es'ed, 2018: 34). Ji layekî dîtir ve Goldman dibêjit "*her berhemekê edebî delaletên wê yên dirust dîyar nabin. Eger mirov wî bi*

*jîyana komekê yan jî bi reftareka civakîya destnîşankirî ve girê nedit*” (Qehreman Es’ed, 2018: 86). Çunkî berhem darêtineka derbirîna civakî ye bo ewan peywendîyên civakîyên di nav êk da û karlêkkirî. Û her li ser vî binyatî rexnegir weku sîstemekê civakî reftarê ligel berhemê edebî diket û fere hevsengiyekê bêxîte palderê xudî û babetî bo nivîsîna berhemî ji layê nivîser ve (Qehreman Es’ed, 2018: 76).

Herwesa derbarey serhildana rexna civakî dişiyanda ye bejîn serhildana wê bi sê qonaxan dihête dîyarkirin. Ew jî bi evê şêweyê: Qonaxa êkê, madidiyeta mêjûy ku ew jî Karl Marks (1818-1883) ve ku wan dana dahênanan edebî berdewamîya civakî û mêjûyî. Çûnkî wan edebdana digel milmilanîyên çînayetî û jêrxana aborî û peywendîya wî babetî digel civakî da ku aydolojîyetê ji layekî ve û hunerî edebê ji layekî dîtir ve. Qonaxa duwê, serhildana rexna sosyolojî destpê diket, ji hewldanên sosyolojîyên komelnasî wek Corc Sîmil (1857-1918) û Max Vîbir (1864-4920) korabûn bi vavartina peywendîyê û kiryarên komelnasî di nav civakî da û di nav karê diramî da û dîyarkirina wek hevya bo niyadên bihayî di nav dahênanên edebî da û têgehîştina wan bo sîmolojîyayê. Qonaxa sêyê, destpê diket ji qutabxana Firankfûrt. Ku vê qutabxanê gelek vekolîn pêşkêş kirinbo rexna mêjûyî û komelnasî û îstatîkî bi rêka karên Edûrnoy (1903-1969) û Hurkayir ku van geşesendin bi rexna sosyolojî da piştî şerê duwê yê cîhanê (Heval Selîm Teyib, 2005: 19).

Rexneya edebî bi giştî du arasteyan vedigirît. Rexne bi giştî dabeşî du layenan dibît. Layenek diket û hunerên gotina wê mecazê dîyar diket digel başîyên wê (Mîs Xelîl Muhemmed, 2006: 25). Li vêrê bo me dîyar dibit pêdivîye rexnegir her du layenan li ser bi rawestîd, daku dirustahî bişêt biçîte di nav jîngeh û civak û jîyana nivîserî bît. Çunke serederîkirin digel rexnê wek layenekê civakî dibîte encamekê sirûştî ku em bi valahîyeka hêzê di rexnê da bibînin (Mîs Xelîl Muhemmed, 2006: 26-27). Anke rexneya civakî ji encamê valahîya layen û rêbaz û arasteyên rexneyên dî dihête hebûnê. Jiber vê çendê ew cedwela civakî ya ku dihête çespandin li ser rexnê cedwela dûr e ji rastîyê. Cedwela rast çîye li dor rexnê? Li vêrê ew rexnegirê piştbestinê li ser jîyana nivîserî diket kewate ew yê piştbestinê li ser mêjûyî diket (Mîs Xelîl Muhemmed, 2006: 29). Lewma dişêyîn bêjin rexneya civakî ta radeyekê baş peywendî digel mêjûyê heye, lê di sîma û binemayên xuda ya cudaye digel rexneya mêjûyî.

Derbareyî pêgîrbûna rexneya civakî “rexneya civakî ya pêgîre bi lêkolînkirina xalên hevgehiştinê û herwesa hevdijîyan jî” (Riçwan Vava, 1997: 137). Dema basê

rexneya civakî dihête kirin pêdivîye em basê “tîn” bikeyn. Rexneya civakî bi navê “tîn” ve dihête girêdan. Yê ku rexneya xu li ser sê regezan ava kirî, ew jî regez, navbendî û dem e (Elî Cewad Tahir, 1979: 404).

Geşekirina rexneya civakî li ser astê ewrûpa piştî ku li çerxê hejdê nîşanên wê serhildayîn, elmanya jî girîngî pê da bi taybetî li çerxê nozdê ku digel peydabûna romansîyetê geşe kir, ta dûmahîya çerxê navberî gelek bernîyas bû (Elî Cewad Tahir, 1979: 404).

Rexneya civakî, berhemê edebî li ser binyatê sirûştê civak dibînit. Rexneya civakî, ravekirina corê nivîsînê diket, kanê li ser çi binyatê sirûştekê civakî wergirtîye (Gahir Ehmed Mikî, 1991: 118).

Dîsa rexneya civakî, bi du layenan temaşey berhemê edebî diket. Layenê êkê ew e ku pêdivîye kar ji civakî derkevît, layanê duyê ku buhayê wî karî bi rêka civakî bihête zanîn. Bi her du layenan jî rexneya civakî lêkolînê li ser kartêkirina komê diket. Bi buhayên ciwaniyê (Gahir Ehmed Mikî, 1991: 118).

Êk: Civakê ketwarî, ku nivîser têda peydabuwî û karê wî têda berhem hatî.

Du: Civakê ku rengvedanê di karî da diket.

Sê: Renge jî berhemê edebî rengvedana dab û erîtên civakî bît (Gahir Ehmed Mikî, 1991: 118).

Edebê civakî peywendîya bi mêjûyê ve hey. Ew ên ku edebî û zanistê ciwaniyê û xudaniyên rêbaza civakî – mêjûyî wesa bo diçin ku corên edebî girêdana bi civakî û bûyerên mêjûwî ve hey û wesa dibînin ku corên edebî formekê mêjûyî – civakî yê hey (Hifîve b. Qane, 2018: 18).

### 1.2.2. Peywendîya Rexneya Edebî bi Civakî ve

Berê vê peywendîyê dîyar bikeyn em, peywendîya di navbera rexnê û berhemê edebî bizanin. Peywendîya di navbera edebî û rexneyê peywendîka hoye. Di gelek xalan da dagehîne êk, lê her êkî ji wan serbexuya xu heye. Edeb ne yê cudakirî ye ji rexnê û herwesa rexnejî bêyî hebûna deqekê edebî bûna xu nîne (Macîde Himûd, 1997: 16).

Her ji kevin da peywendî di navbera rexnê û civakî ve hebûye. Hizar ravekirina edebî û bûyerên edebî bi rêka civakên ku berhem diînit, dizivirit bo çerxê zêrîn li frensa li destpêka çerxê nozdî (Riçwan Vava, 1997: 10). Herwesa xwendina rexneyî – civakî, bizaveke ne bi tenê dihête avakirin li ser têkstên kevin. Belku bo her têkistê nûyî jî dihête bikarînan(Riçwan Vava, 1997: 10). Li dor watayê jî

xwendina rexneya civakî nabîte hûkar bo wataya dûmahîyê (Riçwan Vava, 1997: 137). Anko biryara dûmahiyê li dor watayê bi rêka rexneya civakî nahête dan. Çûnke dibît pitir ji wateyekê edebî helgirît yan jî wateyeka cuda bidet.

Her li dor peywendîya edebî bi civakî ve rih û rîşalên girîngîdanê bi peywendîya edebî û civakî dizivirît bo berî peydabûna zanistê civakî. Herçende zanistê civakî û edebî du têgehên zanînê ne, lê ji hev cuda ne. Beleê hewkarekê hevpişkê di navbera wan da heyî, ew jî girîngîdana bi peywendîya edebî bi civakî ve û yekem girêdan bi peywendîya edebî bi civakî ve dizivirît bo feylesofê frensî (1828-1893), ewî wesa temaşeyî edebî dikir ku rengvedana civakî ye. Çûnke jîngeha civakî kartêkirinê li ser nivîserî diket (Hilab Nûr el-Hedî, 2015: 257).

Her ji kevin da her berhemekê edebî hatîye nivîsîn peywendî bi civakê ve heye. Erê berhem têda hatîye afirandin, çûnkî edîp nuwînerên civakî ne û ew edebê dinivîsin ji valatîyekê nahêt. Belku verêja hizreka aloz e. Lewma vekolîn û ravekirina berhemên wan di her biyavekê da bît dê me pitir nêzîkî baweşa jîwarî ket.

Sebaret peywendîya di navbera edeb û civakê da Madam Dostayîl ku bi damêzrênera evê rêbaza rexneyî dihête hijmartin dibêjit “em neşên di berhemê edebî bigehên û bi dirustî çêj û xoşîyê jê wergirin. Eger em ewan barûdûxên civakî nezanîn ewên bi wî ne egerê jidayîkbûna ewî berhemî” Nîmetullah Hamîd Nihêlî, 2011: 85). Anko li vêrê Madam Dostayîl dîyar diket ku ya girîng e vekolîna barûdûxên civakî yên nivîser têda jiyayi bihête kirin jiber ku barûdox û jîngeh fakterên serekî ne, dibine serdema nivîsîna berhemê edebî. Herwesa Jan Paptêst Vîko (1668-1744) ku êke ji pêşengên evê rêbaza rexneyî dibêjit “debêt edîb bîrûbawerî mîtafîzîkî ser be berjewendîye take kesiyekan belawe binê. Herweha cext li ser ewe degirdewe ke edebî her komelgayek debît legel bîr û bawere ramyarî û komela betiyekanî serdem da bijî” (Azad Ebdulwehîd Kerîm, 2005: 36). Anko wesa dîyar dibit ku rêbaza rexna civakî girîngîyeka zor bi layenê jîngeha mirovî û dewrûberê wî û jîyana wî ya civakî didet û layenên dî feramûş diket. Dîtina Corc Lûkaş (1885-1971)î bo geşekirina edebî ew e ku “geşekirdinê edeb bi geşekirdinî komelgawe debestêtewe” (Rêbîn Xelîl Qadir, 2011: 66). Ew wesa dibînit ku edebî peywendîyeka bihêz bi civakî ve heye û jiber ku edeb rengvedana civakî ye û civak çavkanîya edebî ye, lewra geşekirina edebî ya girêdaye bi geşekirina civakî ve. Herdîsan derbarey evê çendê Hîpolît Tîn (1828-1893) dibêjit “Berhemê edebî ewan tiştan ava diket û dadihînit û rêkdiêxît di nav civakî da berbelav” (Nîmetullah Hamîd Nihêlî, 2011: 85). Ev boçûne

jî ewê çendê dupad diket ku rêbaza rexna civakî temaşey berhemê edebî diket wek berhem û encamê çalakîyên di nav civakî da ruwîy diden.

Em dişên bêjin jiber dewlemendîya mîtodên rexneyî û berfirehî ya arasteyên xwendina deqên edebî fere vekoler bo xandina her deqekê edebî corê wê mîtodê yan wê rêbaza rexney destnîşan biket ewa divêt ji wî layenî ve vekolînê li têksta edebî diket. Pêdivîye berhemê edebî di kojiyê wî civakî da bihête vekolîn û diwîvçûn li ser delaletên civakîyên derbirînê edebîyên berhemî bihête kirin. Anko divêt vekoler wê peywendîyê dîyar biket ewa di navbera berhemî û alîyê civakî yê berhem têda hatîye afirandin (Nîmetullah Hamîd Nihêlî, 2011: 84). Anko em dişên bi rêka karîgerî ya civakî ser berhemî destnîşan bikeyn. Çunkî edîb ne bes dişêt bi rêka berhemê xu çareserîya wan gîr û giriftan ew ên di navit civakê wî da hey wênw biket û bi rêka berhemî civakî baştir pêşbînî biket û ji berhemê xu berhem bînit. Herwesa Rêbîn Xelîl bi vî şêweyî peywendîya edebî bi civakî ve dîyar diket. Peywendî lê nêwan edeb û komelga awêne ye. Lêkolînewe le baredoxê geşekirdinê edeb degirêtewe û hokarêke bo helsengandinê berhemî edebîyekan û peresendinî edeb be giwêrey bagrawendî komelayetî edîb û xwîner lêkdatewe (Rêbîn Xelîl Qadir, 2011: 64).

Anko ewe peywendîya di navbera rexna edebî û zanistê sosyoloyayê ewe ku lêkolînê bi barwedoxî geşekirinia edebî diket. Hokareke bo helsengandina berheman û herçende jî edîb hemî gava wekî xu bo me naveguhêzît belku li diwîv wî barûdoxê û têgehiştina wî ji layê ezmûna kesî ve bo wî berhemî vediguhêzit. Kawdan û jîwar û jîngeh rolekê mezin dibînit di kesayetî ya hozanvanî da û ew helçûnên tûşî dibîtê renkvedana rewişt û berhemê edebî da (Emîn Ebdulqadir, 2005: 101). Jiber ku her berhemekê peyda dibit ji egerekê peyda bûye û jîwan û ketiwar û keltûra wî nivîserî ya hozanvanî kartêkirina mezin li ser berhemî heye. Lewma neşêt peywendî ya edebî bi zanistê civakîcuda bikey. Herwesa zanayên zanistê derûnnasîyê ji jîngehê berê xwe dane dinavbera kesayetî û jîngehê da ku peywendîyeka xudan hemahengê û di navêkê da çûyî û pêkve beçirîme kirîye. Bi derbirîneka dî rewiştê takekesî rast ve dibît û dihête guhirîn bi çendatî û cûrê bersivdana ewa jîngeh dîyar diket wek vegêranek li ser rewiştê. Anko ewê ji jîngehê ve zivirî bû rewiştê takekesî (Ebdulsettar Îbrahîm, 1978: 209). Bi vî rengî dîyar dibit pitirîya derbirînên helçûnî li diwîv jîngeh û barê rewşenbîrîyê takekesî dihête guherîn.

Herwesa Azad Ebdulwehîd Sebaret “rêkxistina peywendîyî ya di navbera komel û berhemê edebî da bunyadgerî û pêgihateyên bi taybetî karên Corc Lûkaşî

xala destpêkî komelnasa edebî ye ku ji ewî serdemî sercem sosyolojiyayî edebê kevin û nûyî bi girîngî hewl diden peywendîyan di navbera naveroka berhemê edebî û hişyarîya komelayetî dirust biket (Azad Ebdulwehîd Kerîm, 2005: 11). Edeb bi tinê axiftin û nivîsîn nîne belku helgirê hindek wata û wênan e ku derbirînên cuda cuda li ser hene û derbirînê ji naxê nivîser û hozanvan û hunermenda diket. Her civakekê hebit bi arêşên cuda cuda di poreseyeka gîyandar da diborît û diguhêrît û nûkirineka berdewam daye. Rewşenbîr û hunermend û têhizrînên xu yên helsengandine bi vê kiryara guherîn û nûkirinê bileztir lê diken (Arîf Hîto, 2013: 11-12). Herwesa di jêderekî erebî da bi vê şêweyî dibêjit: “Naçêbit bêjin sosyolojîya zanistekê waqiîye û ezmûnê tîsitîye. Belku pêdivîye peywendî bi zanistên mirovayetî yên dîve hebit, lewma sosyolojîya rêka rastexo ye. Bo vekolîna civakên mêjûyî yên zindî ku xuyetî ya ewî di nav bizava guhêrîn û hişyarî û hizrî da dihête bicihînan (el-Muhyeddîn Yûsuf Ebû Şeqra, 2005: 44). Anko bo me dîyar dibit livêre şîyanên çavpêkvedana edebî bi civakî ve û ji ber çalakîyeka herdem û hergav eû çalekîyeka hunerî ye û herdem hişyar e. Em dişên bêjin ku cîhan ji dîtina sosyolojyayê her ji kevin nehatîye piştkuh havêtin û her ji bo çûnên Eflatûnî, Erîstoyî, Madam dusayil û Karl Marks pêgihatinîye û peywendîya di navbera civakî û edebî destnîşan kirîye. Û her êk bi şêweyekê boçûna xu û dîtina xu bo dîyar kirîye. Her zanistekî peyda dibit raber û pêşengên xu hene û zanistê sosyolojyayê jî raberîyên xu yên taybet henen û êkem pêşengê sosyolojîya edebîzana Cîya Miba Tîstavîko ji bajêrê Napolî destpêka çerxê 18 peyda bûye. Fîko wesa dibînit ku edeb male yan jî giyanê civakî ye ku jîyanê didetê di edebê civakî ew bi hizirtirîn derbirîne ji evê giyanê. Li ser vê binyatê em dişên berê xwe bidine berhemê edebî bi pesna ewî derbirîne ji rewşêt û tîyalên civakî derbirîna xudî nîne. Li diwîv arezûya xwe takekesê kara ewên dahênanê di evan şêwazên edebî da diken (Bengîn Îbrahîm Hemê, 2014: 13). Lê vêre bo me dîyar dibit ku ew kes yan takekes dê bîte kesekê dahêner heke bişêt dahênanê di şêwazên edebî da biket çûnkî edeb dihête hijmartin mal yan giyanekî civakî.

Anko fere vekoler yan rexnegirê civakî berhemê edebî di wê jîngeha civakî da bixuyinîn ewê berhem têda peyda bûyî. Herwesa Oksît Kont ku êkem kes bûye ku navê sosyolojyayê bikarînayî dihête nîyasîn bi babê sosyolojyayê ku eve şîyanên mezin ji bo vê zanistê mezaxtî. Ew şîya gelek di bi warê evê zanistê da pêşkêş biket û daxwaza diket peywendî di navbera zanistê civakî da hebit (Qusa el-Huseynî, 67-68). Em dişên bêjin li vê re bo me dîyar dibit ku edeb edep parçeka here giringa

civakî ye û neşêyîn jêk veqetînin û herdem nivîser demê dinivîsînit eger civak yê nexoş û bêûmîd bît edeb jî nexoş û dilgiran dibît. Û eger civak yê bê umîd û di kawdanên xoşi da biborît berhem jî core û umîdîyekê û geşbînîyekê bi xo ve dîyar diket. Ruxsarî girîngî heye lê pêdivîye pitir girîngîyê bi layanê naveroka berhemê edebî bihête dan. Çunkî peyama durust ya naveroka berhemî daye.

Herwesa li dev Lûsîyan Goldman (1913-1970)î binyatê berhemê edebî derbirînê ji kesatîya nivîserî diket. Ji layekî dî ve yan ewê komê yan civakî ewa nivîser têda jiyayî ji layê dîtîr ve (Nîmetullah Hamîd Nihêlî, 2011: 85). Li duwîv gotina Goldmanî dîyar dibit ku herçende nivîser berhemê xu dinivîsit û berhem ji dahênana ewî ye. Belê berhemê edebî derbirînê ji ewî civakî diket yê ku di navda hatîye berhemhênan. Herwesa Karl Marks dibêjit “pêwistîye dahênanê edebî bixirête xaney pêkhateyî komelayetî mêjûwîye we (Azad Ebdulwehîd Kerîm, 2005: 41). Anko li duwîv boçûna Marksî dahênana edebî bo civakî dihête hijmartin. Anko edebîyat kartêkirinê li civakî diket û civak jî kartêkirinê li edebîyatê diket, lewra karê rexnegirî ew e li ser wê kartêkirini kar biket (Ebdî Hecî, 2008: 29). Û li duwîv rexna civakî her berhemekê edebî ji encamê rengvedana civakî peyda bûye û ramanên heme rengên civakî di berhemî da dihêt vekolîn û dîyarkirin (Nîmetullah Hamîd Nihêlî, 2010: 79).

Ji eva borî dîyar dibet ku rêbaza rexna civakî girîngîyeka mezin bi girêdana edebî bi civakî daye û edeb û dahênana edebî bi berhemê civakî hemê hejmartîye. Heta ewî radeyî ku rolê nivîserî kêm kirîye beramber rolê civakî di avabûna berhemê edebî da.

Girêdana ku di navbera civakî û edebî da heyî “ew girêdana di navbera civakî û berhemê edebî da hey, pêdivîye di xwendinên rexneya civakî da bihête selmandin. Çûnkî fere rexnegir wê çendê aşkira biket. Têgihîştin bo berhemê edebî nabit eger mirov dî wî civakê berhem têda hatîye afirandit negihêt. Wate, civak rêka têgihîştinê ye bo berhemê edebî (Ehmed Yasîn, 2015: 105).

Piştî peydabûna Marksîzmê, gorankarî bi ser civakî da peyda bûn û hindek dîtinên wî li ser civakî zêde kirin. Marksîzim wesa dinêrite civakî ku herdem bineretekê aborî heyî û du binyatên dîtir hene Jîrxan û Serxan. Serxan birîtîye ji kerestê rewşenbîrîyê anko ayîn, sîyaset, yasa, edeb, huner, û hwd. Jîrxan, pêgihatîye ji aydolojîyayê, anko rêkên hizirkirinê yên ku reftara çînayetî cuda diket(Ehmed Yasîn, 2015: 105).

Marksîstî, rol û bandor li ser rexneya civakî hebû. Derkeftina rexneya Marks werçerixandineka mezin bû. Li ser ewan rêbazên rexneyî ewên derkeftîn di qada rexneyî da. Rexne ku binemayên ewê li ser aydolojîyatrîyê ya dane ye û bi şîrovekirinên aborî û sîyasî û rewşenbîrî dabeş kirîye (Begîn Îbrahîm Hemê Koçer, 2020: 53).

Marksî û ciwanî du têgehên pêkve girêdayîne. Herwesa rexneya Marks berbelav û nêzîkî zanistekê nûyî lê hat. Ew jî zanistê ciwanîya Marksî ewê ev belav bûne li dev sîstemê dewletên komunîstê borandî berev bajêrîn alozîya civakî têda dîyar, zêdebarî evê çendê hindek zaravên dî ligel rexneya Marks hatine behskirin û praktîzekirin. Wek rexneya civakî, rexneya aydolojî, rexneya rîyalîstîkî, zaravê pêgirbûnê(Begîn Îbrahîm Hemê Koçer, 2020: 54).

### 1.2.3. Peywendîya di Navbera Edeb û Aydolojîyê da

Bi şêweyekê giştî pêwendî di navbera edeb û aydolojîyê da dimiyana wê peywendîyê da berçav dikevit ew a di navbera edeb û civakê da; çûnkî di têkrlkirina wê da têgehekê sosyolocî digehînit. Ji ber ku ew sîstemê hizrî yê civakî dibîte tevnek bo şêweyê çawanîya hizirkirina civakî hemîyê û ev şêweye dibine hêma û dibarkirîne bi watayên cora û cor. Lewma tevnê civakî dibîte palderek bo serastkirina arasta sîstemên sîyasî, kulturî, edebî ji ber ku sîyaset û edeb wekî rûyên êk dirave û her du bi hest hizra ve di girêdayîne “tirîlîng” amajê bi hebûna bendkirinê diket û dîyardiket ku “ev pêkve girêdane hebûna binemayekî ye bo peydabûna rexneka sîyasî ya hevrik” (Finisint B. Lîtiş, 2000: 103). Wesa dîyare ku sîyaset êk ji wan rêkayeyên jîyana mirovî bi şêwekê nerastewxu arasteyî rêkxistinekê diket û berev armancê diçet. Edeb, bercestekirina wan hevkarîya ye ew ên di bazara hindek aydolocîya da dizivirin bi taybet di navbera wan aydelocîyên pêkhateyeka sosyolocî û keltûrê pêkdiînin. Ev pêkênane jî dê piyadekirina xwe li ser asitîyên cora û cor avaket mîna binemayên aborî, sîyasî, hizrî zimanî dîyare jî ku edebê girîngîyeka taybet bi xwe ve digirît û civak pêkhateya serekî ya wî yw. Lewma dibîte binyetekê serekî ji bo pêkînana aydolocîyên cuda cuda herwekî Lûyîs Eltosêr amaje bi sê çeşnên cudayîyên kiryarên rojane diket “Ew jî aborî, sîyaset û aydolocîya” (Kemal Ebu Dîb, 1985: 56). Ev e çalekî ye ew in yên ku mirov bê hişyarî tûş dibit weku tiştekê cestey bi jîyanê ve dihêne girêdan û dibîte egerê peydabûna hêzrên hevrik di navbera takên civakî da. Lê cudahîya wan di bikaraînana şêwazê axaftinê û bikarînan zimanî da dîyar dibit. Anko ziman û hizirkirina sîyasetmedarekî wekî abûrnasekî yan edîbekî nabît, lê her

êl bo gorey arasta xwe dê xwe derbirînê ji aydolocîya xwe ket. Çûnkî çi aydolocîya bê ziman nebit herwekî Fîtginşîtayn dibêjit "Tuxîbên cîhana min tuxîbên zimanê min e" (  (Kemal Ebu Dîb, 1985: 53). Ke wate eger xwe derbirînên zimanî bi hêmaya jî bîtin ew hêmaye hilgirên aydolocîya ye. Çunkî dimîna vekirina wan sembola dê naveroka cevengê hête aşkirakirin. Ke wate pêwendî di navbera edeb û zimanî da ew e, ziman kerestê derbirînê ye. Falêyrî amaje bi evî peywendîyê diket û dibêjit: "Nete niha edeb derbirîne bel ku êk ji girîngtirîn ji saziletiyîn berfirehkirina zimanî û bikarhênera wê ye" (Xedîce b. Salih, 2006: 14). Dîyar dibit ku binyatê karê edebî ziman e. Roman êk ji girîngtirîn janirên edebî ye ku romannivîs hest bi girîngîya zimanî biket, ev çen de jî divegerihîte wî zimanîya di vegêranê da bikar dihêt û pêdivîyatîya vegêrî û romannivîsî bi zimanekî rewan ji bo vegêrana rûdana "Ew zimanê vegêr bo vegêrana roman xwe dihelbijêrit teknîke" (Ebdulmelîk Murtac, 1995: 223). Ziman wekû kereste bikar dihêt lê dîyar eli vêre wekû teknîk bikar hatîye. Çunkû karekê hunerî ye û babetên waqiî û xeyalî di naveroka xwe da hembêz diket û zimanê şîyanên avakirina cîhanên aşopî ya heyî "Ziman ne tenha amrazê gehandin û veguhastinê ye û zimanê şîyanên avakirina cîhanên aşopî ya hey "Ziman ne tenha amrazê gehandin û veguhestinê ye, wêne û delalet û hêmayên wijdanî ne bo wergirî. Belku beşeke ji binyatê wî karî bi xu" (Mehmûd Emîn el Alim, 1994: 149). Têksta edebî ew gurepana berevrehe ya ziman ciwanîya xwe têda dibînit ku "Eger ciwanî û cadûgerîya zimanî hate ji dest dan ev e ji destdana hemî tişta ye" (Ebdulmelîk Murtac, 1995: 131). Evca ew zimanî çêj û ciwanîya di hemî çeşnên edebî da ew e kartêkirinê li ser wergêrî diket.

Ji ber ku edeb rengvedana civakî ye û nivîser keseke ji wî civakî. Lewma ew pêwendîya di navbera wan da pêwendîyeka pêkguhure û her du di xizmet û piyadekirina erkên êkda ne. Ji ber evî çendê dahênana edebî ya li jêr desthelata hizrên xudan desthilat herweku Marks dibêjit "Berhemê edebî bercestekirina hizrên çînên desthilatdar û zilgehkirî ye. (Ebdulmelîk Murtac, 1988: 56). Wesa dîyar dibit ku nivîser di hemî dem û serdeman da ketîne jêr fişara xudanên desthilatî. Eger di serdemekî da di xizmeta çîna erîstokratîda ban û li jêr xizmeta hizrên wan berhemê edebî efrandiba evroke ew çînayetîye ya hatîye guherîn bi firesîyasetên curacur û bi heman şêwe nivîserê edebî di xizmeta sîyaset û aydolocîya wî layenê sîyasî da xizmetê diket û binema û prensîbên wî layenî di naveroka veşartî ya berhemên xwe yên edebî da pîyade diket. Lê sererayê evî çendê ya bi sanahî nîne, civak destdanê ji

binema û bihayên xwe yên keltûrî biket. Lewma li dûwîv dîtina Erîk Hubisbabûn ewe şêweyekî hevrikîyê ye "Redkirina têgihîştinê êk ji şêweyên hevrikên çînayetî ye" (Sahib er Rebiî, 2011: 130). Lipey evî çendî divêt nivîser nekevite jêr kartêkirina çi layen û arastên siyasî û hevrikên wan. Eve jî zalgeha hevrikên sîyasî di nav wî sînorê têda dijît û eve ye caran dibîte egerê dûrketin û havîbûn û yaxîbûna nivîseran. Sarter dibêjit "Demê tu dinivîsî raman ew e ku tu wekî xwe reftarê bikî amajî bi heyya bihêt kirin. Lewma erkê nivîserî rakirina wan kevera biket ewên dapoşînênê li ser gelek veşartîya biket û hemî tişta bêxîte ber çavên civakî û berpirsayetîya wan beramber dîyar biket" (Sahib er Rebiî, 2011: 131). Di van doxan da nivîser dibîte dengê wijdana civakî û ew nivîsînên ew derbirînê jî diket niwînertîya aydolocîyên wî civakî diket.

Hebûna aydolocîyê di nav hemî janirên edebî da hebûneka reha ye. Lewma pêwendîya evî çendê ji nivîserê dahêner destpê diket weku takek ji civakî helgirî pirensîp hişyarîya aydolocîyê binemayên agarî yên taybete bi van rêka evrandina berhemê edebî dê peyda bit. Dûr ji zalgehkirina her hizrekê çûnkî ketina nivîserî li jêr fişara aydolocîyeka destnîşankirî dê bîte. Eger bo wê çende ku edeb ji dahênanê dûr bikevit. Sereraye evî çendê her karekê edebî helwîstekî bi xwe ve digirît. Çi gomana têda nîne ku "aydolocîya nivîserî bi xwe kartêkirinê li ser edebê û rol û erkên wê diket û bi evî çendê ew dîtina wî dê rengvedana xwe di nav berhemê edebî da hebît" Newzad Ebdullah Bamernî, 2007: 46). Kewate şêweyê hizirkirina nivîserî dibîte xwedîkeka rengveder di berhemî edebî da berçav dikevît. Roman, bercestekirina wan hemî dîtin û hizra ye ewa romannivîs di naveroka xwe da hembêz diket. Lewma jî dê bînin ku cûreha babet di nav romanê da dihête behskirin û têkevdan her ji babetên sîyasî, civakî, natûralîzmî, keltûrî, dab û nerît... Anko roman ew amanê berevrehe yê hemî şêwên rûdana û gelek cara hindek janirên dîtirîn edebî di naveroka xu da bikar diînit bi merema asankirina rêka gehandina wê peyama edebî ewa romannivîsî divêt bi xandevanî ra rabigehînit. Aydolocîya weku zaravekê serdem helsukewtê pitir digel rûdenka diket ji arastên sîyasî lê bi şêweyê dapoşkirî. Ev çende bûye palder ku aydolocîya edebî bibîte çaksazî û ragirtin û vekirina dergehên nû ye bo hizrên nûtir.

### 1.2.4. Edeb û Gorankirinê Civakî

Edeb, dezgehekê civakî ye, alavên wî ziman e û ji afirandina civakî ye hemî şêwazên edebî mîna erûz û cevengan di suruştê xuyê bingehî da civakî ye. Hozanvan

niho jî endamekî civakî ye di nav rewşeka dîyarkiriî ya civakî da dijît. Her guherîneka di nav civakî da peyda dibit, êkser ew guherîne kartêkirinê li ser pêkhatiteya deqê edebî diket. Û ew guherînên civakî di nav têksta edebî da deng vedidet.

Keltûr û serdem milmilanê bi ser da dihên "sirûşt û rewşenbîrî ya edebî li dev çîroknivîs û romannivîsên rast ku diberpirsin ji amadenebûna kartêkirina guherînên civakî li ser jêrxana karê çîrokê ku layekê mezin ji ewê mayî rewşenbîrîya paşkevtin ji keltûrê kevin û paşmayê serhatîyên mîllî, ew jî di destûrekê dîyarkirî da li ser berhemên edebî yên nûy yan milmilanê di navbera keltûr û serdemîda ye" (Bengîn Îbrahîm Hemî, 2014: 16). Belavbûna her core nerîtekê di nav civakî da karîgerîyeka mezin li ser guherîna civakî heye ku guherînên heme layen têda ruy didet ku ew guherîn jî dibît ya baş bît yan xerab.

Herwesa hokarekî dî yê guherînê ku bi guherînên civakî ve yê girêdayî ye, ew jî pêdivîyên dagîr kerîne. Jîyana xu rêk naêxît bi tinê bi ewê nebît û çi şerm jî nabînit, belku eve li dev peyiskên azadîya kesî ye û daxwazên sirûştî mirovayetî ye û pêdivîyatîyên barûdûxên aborî ye û yasa rêka bi tenê ye bo evê çendê divêrê da wesa dîyardibit ku yasa peywendîyan di navbera mirovan da durist diken. Ew berpirsê êkêne li ser duristkirina nerîtan û ji navbera wan pêşkeftina teknîkî û rewşenbîrîyê di nav civakî da karîgerî li ser têksta edebî heye herdemê civak yê paşve mayî bît wî demê nivîser neşêt edebê baş binivîsit. Çûnkî divêt ew berhemê dinivîsit dîv dab û nêrîtên civakî bigonicît merc nîne ewê demê xwîner werdigirît ji layê teknîkî baş bînit yan xerab. Renge ji layê teknîkî ve yê lawaz bît lê pê xoş e di nav cemawerî da belav bît, eve jî kêşeka mezine ku kartêkirinê li ser pêkhateya deqê edebî diket. Liwîs Ewiz husa dibînit "edeb çalekîyeke ji civakî nahête cudakirin, herwesa karê niwîkirina jîyanê bi rêka peydakirin û bezirkirinê" (Simîr Hîcazî B. S. Ç., 150-151). Anko êk ji erkên edebî rengvedana civakî ye di nav berhemên edebî da ew civakê kêm û kasî gîr û girîft û arêşe hebin û veguhestina wan bo nav edebî da.

Herwesa "tiyora rengvedanê daxwazî ji nivîserî diket ku bawerîyê bi hizar sûşiyalîstî ya zanistî bihêlit û derbirînê ji bihayê mirovatîyê biket" (Newzat Ebdullah Bamernî, 2007: 49). Anko ev boçûne wê çendê digehînit ku edeb girîngê didet layenên jîyana mirovî. Dişên bêjin edeb bi rêka hindek rûdanan kartêkirinê li ser nivîserê diket. Û bi vê rengê kartêkirina civakî bi xwe li ser edebî dîyar dibet û her guherîneka di civakê da peyda dibit êkser rengvedana wê guherînê li ser têkstê edebî

dîyar dibit. Herwesa em dişên têgehiştina xu bo prosesa peywendîyên civakî û guherîna rewşenbîrî û zêdetir lê bigehên û kesê dahêner hestîyarîyeka taybet beramber “avakirina civakî ji veguhastin û pêşkevtinê werbigirît” (azad Abdulwehîd Kerîm, 2005: 16).

Ya dîyare ku kartêkitrina ewî edebî dê derbirînê ji evê hestîyarîyê ket bi şêweyekê dîyar. Bêguman niwîbûn û pêşkeftin armanca herkesekê ye li ser rûyê erdê. Lewra eger baş serincê bideyne bizava herkesekê evcar pîr bît yan jî genckur bît yan jî kiç. Herdem bizav kirye xu ji qeyd û zincîrêt dab û nêrîtan xilas biket û wan cure dabû nêrîtên azarkêş di nav civakî da nehêlit bi taybetî li dev nivîserî. Çûnkî têkst, xudîkeka rengvedana dab û nêrîtên civakî ne. Civat bi xu jî kêşeyeka têksta edebî ye û rengvedana wê xudîkê li ser xwendevanî dîyar dibît.

### 1.2.5. Binema û Prensîbên Rexna Civakî

Rexna civakî çendîn binema û prensîp hene ku dişiyandaye di evan xalan da dîyar bikeyîn:

1. Pêdivîye “girêdanekê durist biket di navbera berhemê edebî û ew civakê berhem têda ava bûyî” (Nemetullah Hamid Nihêlî, 2011: 86). Anko wan derbirînên delaletên civakî diden di nav berhemî da dîyar biket. Weku “rûdanên civakî, kesayetên civakî, rewiştên civakî, kar û kiryarên komê... û hwd” anko eve dibine hêma bo kartêkirina civakî li ser berhemê edebî.

2. Fere xwendina berhemê edebî di wê jîngeha civakî da biket ewa berhem têda hatîye afirandin (Nemetullah Hamid Nihêlî, 2011: 86).

3. Peywendîyeka dîyalektikî heye di proseya karîgeriyê û kartêkirinê da di navbera berhemê edebî û waqiê civakî da, wate berhemê edebî rengvedana civakî ye (Azad Ebdulwahîd Kerîm, 2005: 45). Anko dîyarkirina kartêkirina civakî li ser berhemê edebî û ya berhemê edebî li ser civak.

4. Peywendîkirin digel edebî sîstemekê civakî ye, ew sîsteme jî girêdayî wan hemû gorankarîyan eewên di serxan û jêrxanê da rûdiden (Azad Ebdulwahîd Kerîm, 2005: 44).

5. Fere Biselmînîn K T Ç rade berhem şîya ye derbirînê ji layenê civakî yê nivîserî biket yan jî ya wî civakî yê nivîser digel jiyayî.

6. Fere Biselmînîn ku mirov di berhemî nagihête heta bi dirustî bi wî civakî negehêt yê ku berhem têda hatîye afirandin (Nemetullah Hamid Nihêlî, 2011: 86).

Anko berhemê edebî rêka nîyasîna civakî ye û civak rêkeke da ku di berhemî bigehîn.

7. Bizavkirin bo duristkirina hevsengîyekê di navbera kêşeyên zatî, babetî di nav berhemê edebî da ku bi du rêka bi destve dihêt. Rêkek bi tinê serkêşîya zimanî vedigirît û dikete armancek bo xu bi wî rengî ku deqê edebî pêkve guncandineka derbirînê ya girtî bidanît. Yan jî wekî yeke yekê di peywendî û edigarên edebî da di nav xu da (Azad Ebdulwahîd Kerîm, 2005: 36).

### 1.2.6. Arasteyên Tiyora Rexzna Civakî Di Nav Vekolînên Edebî

Bi şêweyekê giştî du araste di tiyora rexneya civakî da dihêne zanîn, arasteya ji derveyî têkstî ku girîngîyê bi jîngeha civakî didet û arasteyek di nav têkstî da ku girîngîyê bi layenên babetî didet û di vê basî da dê şîrovekirinên zêdetir bo deyin.

## 1.3. ARASTEYÊN REXNEYÎ

Di bin vê serenavê da arasteyên rexneyî bi berfirehî hatîye nirxandin.

### 1.3.1. Arasteya Ji Derveyî Deqî

Li diwîv arasteya ji derveyî deqî "rexne peywendî bi jîngeha civakî û aborî û kartêkirinên jîngehê didetin ewa ku deqê edebî diînit (Ednan Xalit Ebdullah, 2021: 6). Anko berhem der encamê wê jîngehê ye, ya ku ew perheme têda peydabûyî û kartêkirin li ser nivîserê berhemî kirî. "Ew xandingehên serederê digel deqî diken wekû dîyardeyeka şaristanî, di binyati da du ji wan xandegehan dikevnin ew jî: rexna Marksî ye ku karê edebî şîrove diket weku karekê herdeme ji wê vekêşa hêzên civakî peydabûye. Ya duyê jî rexna civakî û derûnî ye, binyatê wê ew e ku deq, yê harîkar e ji bo têgehiştina bizava civakî û werara bizavên hizrî û felsefe têda û peywendîya berhemên edebî û hunerî bi çalakîyên dî" (Ednan Xalit Ebdullah, 2021: 8). Ev arasteye pitir bi edebîyatek pêgir ve girêdayî ye ku bînin berhem pêdivîye di xizmeta aliyên heme rengên jîyanê bihête nivîsîn. Û rexne jî divêt rûhinger û diwîvçûn bît bo destnîşankirina çawanîya rengvedana ewan hokarên derekî di nav berhemî da. Hatîye gotin ku "rêka pesenkirina wê ji derve û derbirîn ji derve ew e ku destnîşana hindek karûbaran diket ku ne di lêkdana deqî de ne mîna jîyana danerî. Anko li serbora danerî biçîn ji bo şîrovekirina rûdaneka taybet dikarê edebî da... Anko şîrovekirina deqî bi harîkarîya pîverên dervehî dihête kirin" (Ednan Xalit Ebdullah, 2021: 20-21). Û her ji bo dîyarkirina rêja kartêkirina hokarên derekî li ser berhemê edebî ji layekî ve û li ser rexnegirê evê arasteyê ji layê dîtir ve hatîye gotin ku "berheme edebîyekan li jêr karîgerî hokar û merce taybetîye komelayetîyekan da hatûnetekaye we û

cîyakirdineweyan le nasname mêjûyekeyan yeksan û hawta ye be le destdanî çendîn sûdlêyan" (Nesrulla Îmanî, 2018: 20).

Ev araste ye daku kê dikete ser hindê ku "divêt karên edebî û hunerî armancek ji bo hebit û ya pêdivî ye guherînêkê di civakê xu da peyda biket, anko divêt huner di xizmeta mirovî û civakî da bit" (Ednan Xalit Ebdullah, 2021: 14). Ji ber hindê dîyar bit ku "peywendîya rexnegirî û xudanê deqî peywendîyeka girîng e û li heman dem ya metirsî ye, lewra divêt rexnegir yê hişyar bit ji vê peywendîyê (Ednan Xalit Ebdullah, 2021: 16).

### 1.3.2. Arasteya Ji Nav Da

Ev araste ye " li binyatê ziman û ciwanîya têkstî vedikolît û layenên zimanî ji layê naverokê ve didete dîyarkirin. Û hêma û ladanên zimanî û kêş ûrîtma hozanê yan divê ron û aşkera diket" (Nemetullah Hamid Nihêlî, 2010: 70). Anko mebest ji vê arastê ew e ku têkstî wek pêgihatineka serbixu ji nivîserî didanin û ji her hokarekê derveyî dûr diêxin. Dîsan girîngîyê bi pêkhatina nava têkstê diden. "Mîtode nawekiyekanî deq, edebî li hemû hokarekî derewe da debirêt, peywendîye nawxuwîyekanî regez û pêkhatenawekîyekanî deqî edebî beyekewe de debestîtewe. Beweş deqî edebî le deqî naedebî çiyadekirêtewe" (Întisar Necîb Coqî, 2016: 27). Ji ber ku ev arasteye girîngîyê bi nava têkstê didet, rexnegir bersiva evan pirsîyar degerît: "Berhemê çi gotîye? Bo çi negotîye ne çi tiştekî di? Ew tişt çawa gotîye? Bo çi bi wî rengî ew tişt gotîye? Eger bi wî rengî negotiba da çawa bibêjit? Baştir bo ew tişt çawa bigotiba? Û bi dehan pirsîyarê dî" (Nemetullah Hamid Nihêlî, 2010: 71). Eve jî wê dîyar diket ku têkst bi xu nûneratîya xu diket û çi girêdan bi hokarên dewrûberên xwe ve nîne.

Bi giştî ji layê arasteyan ve rexneya civakî bi van arasteyan dihête zanîn:

Êk: "Edeb dîyardeyeka civakî ye.

Dû: Nivîser berhemê bo xu naberhem înit, belku bo civakê xu berhem diînit.

Sê: Herdem xûnerê di hizra nivîserî da, lewma dibîte hoyek ji bo nivîsîna berhemî.

Çiwar: Nivîser ji hizrên civakê xu û azar û helwestên civakê berhemî dinivîsit.

Pênc: Nivîser ne bitenê dê rengvedana berhemê xu li ser peywendîyên civakî ket, belku jê dihête xwastin xu digel civakî bigoncînit wê çareser biket" Hilab Nûr el Hedî, 2015, 262).

## 2. DANENÎYASÎN Û DESTNÎŞANKIRIN Û ŞIRAVEKIRINA GOTARÊN REXNEYÊN DI GOVARA ZANKOYA DIHOKÊ DA

Di vê pişkê da dê hewl deynew gotarên girêdayî rexnê bi giştî û rexneya civakî bi taybetî di nav govara Zankoya Dihokê ya Akademîyê da belavbûyîn li ser rawestin, bi rêka destnîşankirina wan û şîrovekirin û helsengandina wan.

### 2.1. Kurteyek li Ser Govara Zankoya Dihokê

Navê Govarê: Li sala 1997an bi navê “Zanîn” hatîye damezrandin û kombûna wê ya êkê li roja duşembê li rêkeftê 20.10.1997 bo biryara guhorîna navê navê govara zanistî ya zankoyê ji “Zanîn” bi govara Zankoya Dihokê “Journal of Dohuk University” piştbestin bi birga “yazde” ji konûsa rûniştina ya civata zankoyê bo sala xwandinê 1997-1998 li 15.2.1998 hejmar û dîroka fermana zankoyî 353 li 1.3.1988.

Govareka akademî giştî ye babetên heme rengên pispora “ekademîsta” belav diket. Ev govare bi du şêwa derketîye, bi şêweyê laperî û elektironî. Ev govare li çapxana Zankoya Dihokê dihête çapkirin û heta nûke jî ya berdewam e, babetên wê cûra cûrên êk ji wan ya taybet e bi zanistên mirovayetî û komelnasî û yên dîtir girêdayîne bi zanistên “pizîşk, fîzîk, werzîş, perwerde, cografî û ...”.

Qebareyî govarê yê mezin e û renga û hindek ji wan renga û reng e û heta nûke dû ser nivîser û sikritêr hatina danan.

Nav û nîşanên govarê dikevîte di nav avahîyê Serokatîya Zankoya Dihokê û cihê serekî dikefite ser rêka Dihok-Kurdistana Iraqê.

Govara Zankoya Dihokê (Kurdî)

Cihê jê derkefit: Zankoya Dihokê

Taybetmendî: Zanistî- Mirovayetî

Corê Govarê: Corê Dergirinê

Dîroka derketina govarê: Hêjmara Êkê li Tîrmeha 1998 (Pişka Zanistî)

Êkemîn kombûna Govarê: 20.10.1997

Amrazên peywendîkirinê bi govarê:

Telefon: 7225259-062

Navûnîşanê Elektironî: jdu@uod.ac

### 2.2. Destnîşankirin û Şîrovekirina Babetan

Eger temaşeyî ewan gotar û vekolînên akademîyê bikeyîn ewên di Govara Zankoya Dihokê da belavbûyên dima wê di navbera sala 2010 heta sala 2022an dê bibînin ku 24 hejmar ji govarê derketine. Piştî me pêdaçûnek bo ewan hijmaran

hemîyan kirî, bo me dîyar bû ku hindek vekolîn girêdayî layenê civakî bûye. Lê weku mîtodeka rexneyî binemayên evê mêtoda rexneyiya civakî têda peyrew nekirîye. Tinê di hindek layen û mijarayen da ew babet û tewerên girêdayî rexneya civakî bi şêweyekê ve qetayîû cuda cuda di her vekolînek ji ewan da hatîye behskirin.

Ew babetên bi şêweyekê êkser girêdayî tîyora rexna civakî bi tinê dû vekolîn bûn ew jî eve ne:

1. *Dîyardên Civakî di Heyranoka Kurdî da*, Îbrahîm Ehmed Simo û Cotyar Îsmaîl, bergê 18an, hêjmar: 1, li sala 2015an belavbûne. Di evê babetê da nivîseran bizava kirî ewan dîyarde û babetên civakî ewên di heyranokan da rengvedayîn desnîşan û şîrove biken. Anko ji layê keresteyê vekolînê ve binemayên evê tiyorê bi aşkira û rêkûpêk peyrewnekirîne.

2. *Xiwandineka Civakî bo Jîlemûya Kevalekê Bijiyay*, Bengîn Îbrahîm Hemî Remezan Hecî qadir, bergê 20an, hejmar: 1 li sala 2017 belavbûye. Di evê vekolînê da nivîseran bizava kirî ewan binemayên tiyorî yên rexna civakî li ser deqê têksteka kurda praktîk biken û ta radeyekê berçav şiyayine ewan binemayên di nav evê têkstê da rengvedayîn, destnîşan û şirove biken.

Herwasda ew vekolînên girêdayî layenên civakî û bitenê hindek layenên civakî bi kurtî bas kirîn evin:

1. *Ezmûna Şi'rî di Tiraziya Rexnê da, Qadîr Can wek Nimûne*. Zozan Sadiq Seîd û Çinar Sidîq Xazî, bergê 14an, hejmara 1ê, li sala 2011an belav bûye.

2. *Ji Hozane Serhatî yên Nalbendî*, Kamiran Mihemed Nebî û Hemdîye Hesen Muhemed, bergê 17an, hejmara 2yan, li sala 2014an belav bûye.

3. *Sîyolojîya Kesatîyan di Çîroka Rojanên Masîgerî Biçûyik,* Îsmaîl Hacî, bergê 17an, hejmara 2yan, li sala 204an belav bûye.

4. *Rengvedana Awareyê li Ser Naveroka Hozanên Mela Xelîlê Mişextî da,* Îmad Weysî xalid û Dulit Muhemmed Ehmed, bergê 19an, hejmara 1ê, li sala 2016an belav bûye.

5. *Kesatîya Jinê Di romanên Sidqî Hirorî da*, Remezan Hecî Qadir, bergê 19an, hejmara 1ê, li sala 2016an belav bûye.

6. *Pêgotin di Hozana Kurdî da –Kirmancîya Serî Wek Nimûne*, Perwîn Reûf Hadî, bergê 19an, hejmara 1ê, li sala 2016an belav bûye.

7. *Karîgerîya Trajedîya Mirina Çend Kesên Malbata Nalbendî li Ser Hozanên Wî*, Kamiran Mihemed Nebî û Çinar Sedîq Xazî, bergê 19an, hejmara 2yan, li sala 2016an belav bûye.

8. *Rehendekanî Kiltûrî Ciwekanî Kurdistan le Pendî Kurdî da*, Helmet Bayiz Resûl, bergê 19an, hejmara 2yan, li sala 2016an belav bûye.

9. *Role Cênderîyekanî Herzekar lê Xêzani da- Tiwêjîneweyekî Meydanî ye le Xwêndineke Bineretîyekanî Şarî Silêmanî*, Benaz Heme Reşîd û Selar Ehmed Mustefa, bergê 20an, hejmara 1ê, li sala 2017an belav bûye.

10. *Jîyana Babetî di Çarçovê Hozanê da, Jiyan û Xebata Pêşmerge Fetah Gulî Wek Nimûne*, Gulîstan Bidil Muhemmed û Rêjîn Yûnus Muhemmed, bergê 20an, hejmara 1ê, li sala 2017an belav bûye.

11. *Bihayên Perwerdeyî di Çîrokên Zarokan da- Kêle Stûyîn wek Nimûne,* Bengîn Îbrahîm Hemê û Hival Selîm Gîb, bergê 20an, hejmara 2yan, li sala 2017an belav bûye.

12. *Têgehê Fimînîzîm û Cenderî di Romana Meryema da*, Newzet Ehmed Usman û Nîhaye Nihnid Salih Îzeddîn, bergê 24an, hejmara 2yan, li sala 2021an belav bûye.

13. *Niştimanperwerî di Dîwana Zimarên Çîya da ya Hozanvan Bedirxan Sindî*, Hilbîn Mihemed Huseyn û Warîn Dilşad Salih, bergê 22an, hejmara 2yan, li sala 2019an belav bûye.

14. *Rengvedana Gotinên Mezinan di Romana 52 Roj le Duzex da ya Nivîser Reza Seyîd Gul Berzencî*, Welat Mihemed Tahir û Remezan Hacî Qadir, bergê 22yan, hejmara 2yan, li sala 2019an belav bûye.

15. *Rengvedana Bunyatê Mîlodramayî di Tekstê Şanoyi da, Şanogerya Hevrikî wek Nimûne,* Iram Yûsuf Îbrahîm û Benginî Îbrahim Mihî, bergê 22yan, hejmara 2yan, li sala 2019an belav bûye.

16. *Edebê Bergirî û Rolê Wê Beramberî Dagirîkirinê Hozanên Qedrî Can Wek Nimûne*, Harîwan Hemed Ehmed û Remezan Hacî Qadir, bergê 22yan, hejmara 2yan, li sala 2019an belav bûye.

17. *Hêmanê Ayînî di Hozana Niwîxiwaza Kurdî da bi Nimûneyên Ehmedî Mela*, Arif Hîto, Erşed Hîto, bergê 22yan, hejmara 2yan, li sala 2019an belav bûye.

18. *Navûnîşan di Romanê da, Romana Dawiya Şervanekî ya Nivîser Ismet Mihemed bedel Weku Nimûne*, Nazdar Arif Birîndar, bergê 23yan, hejmara 2yan, li sala 2020an belav bûye.

19. *Îsatîka Cihî di Romanê Sebrî silêvanî da*, Newzad Ebdullah Hacî û Nêrgîz Mihemed Xefar, bergê 23yan, hejmara 2yan, li sala 2020an belav bûye.

20. *Xwendineka Entropolocî bo Romana Sîya Evînê ya Mehmet Ûzûnî*, Hêriş Tahir Nûrî û Beyan Ehmed Husên, bergê 24yan, hejmara 1ê, li sala 2021ê belav bûye.

21. *Leheng û Mijara Nasnameya Civakî di Kurteromana Gulîstan û Şev da*, Emîn Ebdulqadir Umer û Ednan Mehdî Ebdulla, bergê 24yan, hejmara 1ê, li sala 2021ê belav bûye.

22. *Taybetmendîyên Kurtîle Çîrokê di Komela Kurt û Kurtîle Çîrokên Rojeka Germ ya Sekvan Xelîl Hîdayet da*, Jivan Ne'man Hecî û Heyam Salih Huseyn, bergê 24yan, hejmara 2yan, li sala 2021ê belav bûye.

23. *Urûjana Rege ji Peristane di Gotara Netewî ya Mela Xelîlê Mişextî da*, Kameran Îbrahîm Xelîl û Şivan Qasim Hesen, bergê 24yan, hejmara 1ê, li sala 2021ê belav bûye.

24. *Têgehê Fîmînîzm û Cenderî di Romana Miryema da –Xiwandineka Berawirkarî,* Ehmed Osman û Nîhayet Mihemed Salih Izedîn, bergê 24yan, hejmara 1ê, li sala 2021ê belav bûye.

25. *Qonaxên Werara Derûnîya Kesayetîya Kurteçîroka Mêvanê Newext ya Fazil Umerî li diwîf Qonaxa Awêne ji Tiyora Derûnîşkarîya Lakayî*, Gulîstan Bedel Hesen û Beyan Ehmed Huseyn, bergê 24yan, hejmara 1ê, li sala 2021ê belav bûye.

26. *Jîyanname di Romana Kurê Zanarê Serbilind da*, Ebdî Hacî Mihemed û Remezan Hecî Qadir, bergê 24yan, hejmara 1ê, li sala 2021ê belav bûye.

27. *Têkelbûna Şi'rê di Romanên Sidqî Hirorî da*, Ebdî Hacî Mihemed û Remezan Hacî Qadir, bergê 24yan, hejmara 1ê, li sala 2021ê belav bûye.

28. *Rexneya Zimanvanî bo Romana Koço-Tiyora Gehandina Zimaniya Roman Yakubsinî*, Hemîde Hesen Mihemed û Îmad Weysî, bergê 24yan, hejmara 1ê, li sala 2021ê belav bûye.

29. *Têkstê Sindoqa Reş di Navbera Romanê û Jîyannama Xudî da*, Îsmaîl Hacî, bergê 25yan, hejmara 1ê, li sala 2022yan belav bûye.

Di vekolekînê da li bin navê *Dîyardên Civakî di Heyranoka Kurdî da* Îbrahîm Ehmed Simo û Cotyar Îsmaîl, bergê 18an, hejmara 1ê, li sala 2015an belav bûye. Di evê babetê da nivîseran bizava kirî ewan dîyarde û babetên civakî ewên di heyranokan da rengvedayîn destnîşan û şîrove biken. Anko ji layê keresteyê vekolînê ve babet û dîyardên civakî kirîne kereste. Lê ji layê peyrewkirina tiyora rexneyî ve binemayên evê tiyorê bi aşkira û rêkûpêk peyrew nekirîye. Ev vekolîne ji du pişkan pêk hatîye. Pişkek girêdayî layenê tiyorî ye ku têda li ser pênase û peydabûn û corên heyranokan rawestîya ye, pişka duwî girêdayî layenê piraktîkî ye û tiyora rexneya civakî li ser mijar û dîyardeyên civakî di heyranokê da şîrove kirîne. Lê bi tinê hindek layen ji tiyora rexneya civakî peyrew kirîye û dê bas li ser keyn.

Heyranoka kurdî, wek êk ji corên edebê folklorî yê li ser zarî dihête hêjmartin ji corekê serekeyê berhemê edebîyê folklorî yê kurdî. Heyranok wekû ya aşîkira ku li ser zarê evîndaran dihête gotin û bi şêweyê dan û standini di navbera kiç û kuran da bi şêweyê sitrankî dihête gotin û arastekirin. Wate ji takên civakî peyda bûye û gelek berbelav dîyardeyên civakî di nav da berceste bûne.

Di layenê pişka piraktîkî ya evê vekolînê da her du nivîseran bizava kirî dîyardeyên civakî di heyranokê da bas û şîrove biken ji wan jî dîyarda revandina jinê civaka kurdî da wek dîyarde baskirîye, bi rêka vê nimûnê ev şev şev e, tarî

Siyarek ber derê me ra hat û barî

Kuro dîno min birevîne

Babê minli min dujmine, deyka li min neyarî

Gelek caran bab û dayîk rêgir buwîne hemberî evîna ewê gelek nexoşî û derdeserî ketine di rêya ewê da. Lewra bab û dayîk weku dujmin ber singê xu dîtine, bi evê çendê vîya ye xu ligel lawekê xu bidete revan da ji ewê jiyana nexoşa ew têda dijît, rizgar bît (Govara Zankoya Dihokê, 2015: 272). Li vêrê êk ji dîyardeyên negatîv di nav civakê da revandina kiçan e bi merema jiniînanê. Eve dîyardê di nav heyranoka kurdî da rengvedaye. Vekolerên vê gotarê şiyayine bi rêka dîyarkirina nimûneyên wan core heyranokan li ber çav biken û şîrovekirinên xo bidene li ser, ev core şîrovekirine bi tinê bo wê çendê ye ku ew dîyardeya civakî bihête destnîşankirin. Ew bi xo jî pêvajoya rexneya civakî digirît. Çunke êk ji binemayên mîtoda rexneya civakî ewe dîyardên civakî yên negetîv di nav civakê da bihêne destnîşankirin û şîrovekirin.

Herwesa êk ji dîyardeyên dî yên civakî yên bas li ser hatîye kirin di vê vekolînê da dîyarda dana şûya kiçan bo pîremêran ku rengvedanê wê jî di nav heyranokê da heye û bi çend nimûneyekan vekoleran hatîye dîyarkirin. Ji dîyardeyên nedurist ku di civakê kurdewarî da dihête dîtin. Ew jî daneşûya kiçê bi pîremêran, yan kesekê temen ewî kiçê pitir bît. Pêdivîye bizanîn cîyawazîya temenî di navbera jin û mêra da û êkdû negihêştin dibîte egerê hindê jîyana ewan ya nexoş bît. Eve jî bûye êk ji arêşa ku kiça kurd li ber dinalît, bi evê çendê ji bo gehandina evê peyamê bo xelkî û civakî ewê bi rêya heyranokê ev dîyarde gehandîye. Bo nimûne:

Kurelawikê min têtin, têt bajêra
Se'et zêr e keftîye ber gera vê şalêra
Dê bila pîremêrekê min mira
Damin xortekî ji hînê xwe ra
Berdana ber malê ra (Govara Zankoya Dihokê, 2015: 275-276).

Di vê nimûnê da dîsa êk ji dîyardên dî yên civakî bi nimûneya heyranokê dîyar kirîye. Wek dîyardeyeka civakî û vekoleran şîroveyên xo dayne wê nimûnê. Ev çende jî dîsa dibîte êk ji binemayên rexneya civakî ku bi rêka şîrovekirinê dîyar kirîye. Herwesa vekolînê da çendîn mijarên dî jî dîyardên civakî bas kirîye. Ji wan jî next û bênext û pêkguharkirinê û dane şûna bi xortî... û hwd. ku hemû dîyardên civakî ne û di nav heyranoka kurdî da berceste bûwîne.

Di vekolîneka dî da, li bin navê *Xwendineka Civakî bo Jîlemûya Kevalekê Bijyay*, Îbrahîm Hemê û Remezan Hacî Qadir, bergê 20an, hejmar 1, li sala 2017an belav bûye. Di evê vekolînê da nivîseran bizava kirî ewan binemayên tiyorî yên rexna civakî li ser deqê têksteka kurda praktîk biken û ta radeyekê berçav şîyayine ewan binemayên di nav evî têkstî da rengvedayîn, destnîşan û şîrove biken û bi vî rengî ku dê bas keyn.

Ev vekolîne bas li "*Bas li Wê Peywendîya di Neqeba Ketwarî û Honerî û bi Taybetî Şi'rê da Hey Diket*" (Govara Zankoya Dihokê, 2017: 1). Ke wate ev peywendiye ya girêdayî ye di navbera civakî û nivîserî da, lê bi tinê di warê hozanê da bas yê li ser hatîye kirin di pişka wê ya praktîkî da. Ev vekolîne ya dabeşkirîye li ser du pişkan. Pişkek girêdayî layenên tiyorî yên rexneya civakî ye, û pişka dûyê ya girdaye bi layenê praktîkî ku li ser hozanê hatîye praktîkirin.

Derbarê girêdayî nivîserî bi civakî ve û çewanîya derbirînkirinê ji wî civak û ketwarê têda dijît bi rêka berhemên xo yên edebî yên dahêner ku eve bi xo êk ji

nameyên mîtoda rexneya civakî ye, di pêşekîya vekolînê da hatîye “Her peywendîyek durist bît li ser ketwarê civakî durist dibît û dibîte verêja hizir û bîrên hindek kesan ku girêdayîne bi hindek bihayên edebî û hunerî. Derbirînê jî hizr û wijdana çîneka dîyarkirî diken ku nivîser endame ji wê çînê. Mirov dihête guherîn bi bi guherînên civakî ku ev guherîne ketwarê li ser mirovî ye û berhem derbirînê ji takekesan naket. Lê derbirînê ji agahîya çînekê yan civakên cuda cuda diket” (Govara Zankoya Dihokê, 2017: 1). Li diwîv êk ji binemayên rexneya civakî pêdivî ye nivîserê berhemê edebî, rengvedana civakê wî di nav berhemê wî da hebit. Jiber kû ew bi xo jî êk ji takîyên wî civakî lewma her du vekoleran şîyayne vê binemayê rexneya civakî di nav berhemê xo da berceste biken.

Di layenekî dî yê vekolîna xo da dibêjin “Edeb girêdayî ye bi pêşveçûna civakî ve û her guherîneka di civakê da peyda dibît û ew guhorîn, edebî jî vedigirît. Çunkî edeb li jêr wê jîngeh û ketwarî peyda dibit, ewa civak têda dibît. Anko em neşên edebî ji jîyana rojane cuda bikeyn, çûnke deqê edebî derbirînê ji gîrogirîftên civakî diket û bi rêka hozanê û romanê û çîrokê... hwd. vediguhêzit” (Govara Zankoya Dihokê, 2017: 3). Eve gotine ya durist e û digoncît bo pîverên rexneya civakî, anko rexneya civakî li ser gotinê ava dibît û baweriyê pê diînit. Ji layekî dî ve ew gorankarîyên di civakê da peyda dibin derencam û li diwîf binemayên rexneya civakî, pêdivîye heman guherîn li serberhemên edebî jî da peyda bibin. Çûnke edeb û civak du xalên pêkve digirêdayîne û nabît bihêne jêkcudakirin. Evca ew cure gorankarî her bi çi şêwe bin “Bi rêka wan dîyardên di nav têkstan da heyîn vekoler dişên karîgerîya civakî li ser berhemî destnîşan biket. Ji vê çendê dîyar dibit ku civak berhemhinêrê serekî yê edebîyatê û dahênana edebî ye û verêjên karîgerîya civakî di berhemî da di ber çav in” (Govara Zankoya Dihokê, 2017: 3). Dîsa her du vekoleran basî nivîserê berhemê edebî jî kirîye û dîyar diken ku “Nivîser demê berhemê xwe dinivîsit bo xwe bi tenê nanivîsit, belku bo wê komê durist diket ewa di nav da dijît. Nivîser berdewam be ref komî ve ye û her bihayekê têda heyî” (Govara Zankoya Dihokê, 2017: 3). Anko liduwîf binemayên tiyora rexneya edebî pêdivîye nivîserê berhemî bo civakê xo binivîsit.

Ji binemayên rexneya civakî ku vekolerên vê vekolînê bas kirîn, ew e ku pêdivîye berhemê edebî girêdayî xem û azarên civakî bit. “Rexneya civakî, ew rexneye ku li dor edebekê civakî digerit, edebek bît bi zimanê miletê hatîye nivîsîn û behsê xemên miletî biket û bi wêrekane li ser dab û nêrîtan û zulmê û bindestîyê

rabiwestît" (Govara Zankoya Dihokê, 2017: 3). Li vêrê nivîseran bi duristahî binemayekê dî jî yê rexneya edebî peyrew kirîye.

Pêdivîye tekstê edebî li jêr karîgerîya civakê bihête hebûn. "Di nav civakê da têksta edebî karêger e û erkê xwe yê civakî yê heyî û civak jî karêgeriya xwe li ser têkista edebî disepînit. Çunkî têkista edebî li valatîyê durist nabit û karê takekesî nîne, belku zimanhalê civakî ye. Rexnegirê civakî jî pêdivîye bi rêka têgehiştinê di navenda civakî da, rada helwestê têkist nivîsînê karê rexneyî encam bidet." (Govara Zankoya Dihokê, 2017: 8). Bi şehrezarîyeka baş her du vekoleran ew karêgerîya li ser têkistê edebî dihête kirin, bas kirîye û ji pêvajoya rexneya civakî nederkeftîye û daku kî kirîye ku berhemê edebî divêt bi dîyarde û binemayên civakî karîger bît û ev bi xo jî zemînê xoş diket bo arastekirina rexneya civakî li wî berhemê hatîye nivîsîn. Derbarê jîngeha civakî ya nivîserî û ew berhemê dinivîsit didine dîyarkirin ku "rexneya civakî, jîngeha civakî ya nivîserî dikete binema da ku civakî ji edebî pitir li ber çav werbigirît. Herwesa dûpatîyê li ewê çendê diket ku berhemê edebî derbirînê ji ewê çendê diket, ya ku nivîser bi ser ve û fakterên civakîyên bûwîne eger bo afirandina berhemê edebî kewate nivîser êke ji civakî her ruweydaneka di nav civakî da serheldidet kartêkirina xwe li nivîserî diket û dibîte eger afirandina berhemê wî". Ew jîngeha nivîser têda dijît êk ji binemayên rexneya civakî ye û vekoleran hest bi vê çendê kirîye û amajeyên durist bo dayne. (Govara Zankoya Dihokê, 2017: 8).

Di pişka duwê da ji vê vekolînê her du vekoleran binemayên rexneya edebî li ser têkistan praktîk kirine û arasteyên rexneya civakî li ser çespandine. Şîrovekirina têkistî jî binemayên rexneyê ne. Bi rêka şîrovekirinê wataya têkistî dihête dîyarkirin û herwesa binemayên rexnê jî dîyar dibin. Her du vekoleran şîrove û dîyarkirina binemayên rexneya edebî di çendîn nimûneyan da dîyar kirine.

"Xwe ev dunya ye bi golikê min û te,
Berteng nedibû
Xwe ezmanê min û te
Ev cîhane wêran nedikir

Di van dêrên serî da hozanvanî viyaye barûdoxê xwe yê aborî û herwesa kawdanêt wî yên xîzanî û xanî û mala xwe dîyar biket ka ew di çi barudox da dijît beramber bidete xuyakirin ku mala wî kulkekî bêser û ber e û ev cîhane bi vî xanîyê min yê hejara xerab nabît" (Govara Zankoya Dihokê, 2017: 11). Êkem car şîroveya vê parçe helbestê kirîye û paşî bi rêka wê şîrovekirinê demê basê barûdûxan xanî û

hejarîyê diket ev bi xo hemî bi civakî ve girêdayîne. Lewma her du vekoler diserkeftî bûne bo destnîşankirina binemayên rexneya civakî û her wesa arastekirina rexneya civakî li diwîf binemayên dirust.

Erkê hozanvanî ew edîyardeyên civakî li ber civakî biket, ji wan jî arêşeyên miletî û civakî, herwekdi vê nimûna hozanî da dîyar kirî û şîrovekiri. “Hozanvan bi erkê xwe dizanît û hewl didet li ber çavêt milletî rûn biket û çarekirina vê arêşê bi rêka xwendinê dibînit. Herwekî dibêjit:

Çunkû mirov nizanît çend deng ji cadeyê tên û

Çend lutî di baweşk diçin û

Çendên dî di çavgirtî ne...!

Hozanvan di van çend dêreka da amojgarîyê didete civakî ku çavên xwe veken û xwe hişyar biken ji bo birêvebirinajîyana xwe ya rojane” (Govara Zankoya Dihokê, 2017: 12). Eve erkê hozanvanîye wek nivîserê berhemî ku her xaleka nekeftîya civakî li ber çavên civakî ruhin biket û li ser agehdar biket.

Di layenekî dî yê civakî da vê vekolînê, bas li nemana dîyarda rêzgirtinê di nav civakî da diken. Eve jî êk ji wan binemayane yên ku girêdayî rexneya civakî, êkem car hozanvanî bi xo bi rêka berhemê xo yê hozanî rexne li vê dîyardê kirîye û herwesa her du vekolerên vê vekolînê jî bi şehrezayî amaje bo kirîne li bin sîbera binemayên rexneya civakî. “Aşkeraye ku hozanvan di nav civakî da kesekî hişyar û bi hestîyar e ji xelkî, dişêt arêşên civakî destnîşan biket û çareserîyê bo bibînit. Di vê parçe hozana li xwarê da hozanvanî dîyardeka civakî berçav kirîye ew jî nemana rêzgirtinê ye li kesên rewşenbîr û binemayên civakê kurdewarî. Herwesa bas li helhelîyeka nezan diket. Belê kawdan yêt bo xwe çewsandîn û ketye di xoşiya da barêka wî karê ne rewa û dijî rewişt û tîtalên kurdewarî.

Ji axilêve ya dewletbûnê xwe firake dikir

Car jî digel mest rahejîyanê dibû semaker

Ji van ew bû ji renca kevirên hûrhûr kirî

Li ser şaşeya dîrokê xwe balkêş biket

Berî xişxişa çîrçîrokê

Le şivirojeka helhelî li jivanîya xwe

Kawdan kire stovanek bi xinê bûn ve pê girnijî” (Govara Zankoya Dihokê, 2017: 16).

Mijareka dî her du vekoleran bas kirîye, wek dîyardeyeka civakî ew jî mijara gendelîyê ye. Nimûneyên hozanên jîlemoyeka kevalekê bijiyayî li ser rawestîya ne û bas kirine û bi erkê hozanvanî zanîye û şiyayine şîrove biken û paşê destnîşan biken wek dîyarde di nav civakî da.

“Dema şivan rengê bi sitûyê bizinên
Niznizî û gendel dialînit û
Bi nihênî zîyanê diken
Her ji bo hindê ye
Da gopal perasûyan xînelo biken
Pa bo çî...?
Em xema gelexên xwe nahelgirîn
Li nav vîzêna heram di bê zengilîn

Anko merema hozanvanî ji bizinên niznizî û gendel mirovên bêmejî û devgazende û xirabkar in. Herwesa şivanê bizina jî bi ramana rêber û berpirs serkêş ku berê dîvelanikan didete xirabîyê daku paşî tehtikê wan bihusît. Anko xelkê baş û zana jî wekî xwe lêdket ji bo wê çendê ku devê wal li beramberî fêlbazî û gendelîya wî bihête girtin. Û hozanvan dîyar diket ku em hemî yên ketîne şaşîyan da ku bi sanahî ezmanê me bihête girêdan” (Govara Zankoya Dihokê, 2017: 21). Li vêrê vekoleran destnîşankirina wê dîyarda gendelîyê kirîye bi vê parçe hozanê ku ew parçe hozan ji layê hozanvanî ve hatîye nivîsîn. Wate huşyarîyeka civakî têda berceste bûye û hozanvanî hest pê kirîye û li ber çav kirîye.

Di babetekî da li bin navê “Niştimanperwerî dî Dîwana Zêmarên Çiya da ya hozanvan Bedirxan Sindî ku ji layê nivîseran Hilbîn Mihemed Husên û Warîn Dilşad Salih hatîye nivîsîn, her du nivîseran hewldaye babetê niştimanperwerîyê di nav hozanên Bedirxan Sindî da destnîşan biken û xwendinên xwe li sre biden ku di binekuka xo da ev babete babetekê civakî ye. Ji ber hêmanên civakî di nav hene û ji wan jî niştimanperwerî ku niştiman bi xo cihê xirvebûna takên civakî ye. Lewma jî nivîserên babetî bi şêweyekî ji şêweyan di babetê xo daber bi rexneya civakî çuyîne.

Di pişka duyê ya vê babetê da hatîye “Hozanvan Bedirxan Sindî wek hozanvanekê kurd di biyavê hozanê da herdem xwe mixurê milet û gelê xwe bûye. Hest bi êş û janên gelê xwe kirîye, bi rêka hozanên xo yên niştimanî, ji netewe û miletê kurd û berevanî ji miletê kurd û doza rizgarîxwazîya gelê kurd kirîye” (Govara Zankoya Dihokê, 2019: 439). Eger em bi hiwîrî li ser peregrafê bisekinin dê

bibînin ku hozanvan hatîye girêdan bi civakê xwe ve û bi rêka hozanên xo ya hewldarî babetên girêdayî û êş û azar û nexweşîyên miletê xo berçav biket ku ev jî wî binemayê rexneya civakî dîyar diket. Ya ku berhemê edebî rengvedana civakîye û her dîsa hozanvan yan jî xodanê berhemê edebî bi xo jî pişkeke ji wî civakî û di nav jîyaye. Lewma jî peyivên milet, kurd, netewe, gel hemî pêkve amajeyên civakî ne.

Paşî berdewamî da babetê xo û têda hatîye “kêş û arêşeyên miletê kurd dayine berçavkirin û baş têgehiştîye, berdewam weku rewşenbîrekê netewî rexne li xeletî û şaşîyan girtîye, rêya rast û durist ji bo rizgarî û serxwebûnê dîyar kirîye. Hozanvan Bedirxan Sindî ev babete di nav naveroka hozanên xo da azirandîye û soz û verêja dilê kirîne wêneyên ciwan di nav hozanî da” (Govara Zankoya Dihokê, 2019: 439). Di vê peregrafê da nivîserên babetê bi yê ku hest pê biken, komeka babetên civakî azirandîne û li ber çav dîyarkirîne. Ji wan jî kêş û arêşên milletê kurd ku ev kêş arêşe hemî girêdayî civakî ne û eve wê çendê diselmînit berhemê edebî divêt xizmeta civakî biket. Lewma jî rexneyê arasteyeka civakî girtîye, çunke herwek wan daye dîyarkirin ku hozanvanî berdewam rexne li dîyarde û şaşiyên civakî girtîye û hewldaye wan şaşî û xeletîyan bi rêka berhemê edebî ku ew jî hozan e li ber civakî biket, daku takên civakî hest pê biken û ji nav biben û civak bihête valakirin ji şaşî û xeletîyan. Dîsan nivîserên babetî bi ciwanî basî nivîserî kirîye ku rêkek girtîye milletek rizgar bibît ji derdeserî û bindestîyê. Wate, civakekê bindest heye û hozanvanî kar kirîye ji bo rizgarkirina miletê xo ku di binyati da hozanvan bi xo jî takekî ji wî civakî. Azarindana van core babetan di nav hozanê da hestkirinên hozanvanîye bi vê rêkê berhemê xo darêjîte û hemû hest û sozên xo kirîye wêne ji bo dîyarkirina êş û azaran. Nivîserên vê babetê jî bi arasteyeka civakî û hêmayên ku derbirînê ji nexweşîyên civakî diket, rexneya xo arasteyî babetên hozanên navbirî kirîne.

Di layekî dî babetî da hatîye “Hozanvan behsê mêrxwasî û egîdên miletê kurd diket û dema pêşmerge serkeftina bi destî ve dihînit. Ew jî ligel dilşad dibît û hest bi xoşîyê diket, nexasime ku gelê kurd herdem yê bi hev bûye bo qurbanîdanê” (Govara Zankoya Dihokê, 2019: 439). Pêdivî bo li vêrê nivîserên babetîberawurdîyek di navbera her du layenan kiriban, layenê naxoşî û layanê dilşadî ku ji her du layenan ve hozanvan hest pê diket. Wate ji layekî ve hest bi êş û azarên miletê xo diket û ji layê dî ve jî hest bi dilşadîya miletê xo diket. Her du layan jî di binekoka xo da hestkirinên hozanvanîne bi miletê xo. Wate hozanvan ji cergê civakê

xo ye û digel wan jîyaye û rengvedana xoşî û nexoşîyên civakê xo di nav berhemên xo da berceste kirîne.

Nivîserên babetî, çendîn ku pile hozanên hozanvan Bedirxan Sindî li ber çav kirîne û şîrove kirîne, piranîya wan hozanan jî derbirîn ji civakê kurdî kirine. Lê her du nivîseran bi tinê arasteya niştimanperwerîyê li ber çav wergirtîye, bi yê ku bidine dîyarkirin wek layenekî civakî yê girîng bo sîma û derbirînên civakî. Bo nimûne di vê parçe hozanê komeka hêmanên civakî têda, lê di ser wan ra derbaz bûye û bi çavekî civakî rexne bo araste nekirîye. Dê ji kulaxê wan şehîdan:

"Stînekê dirêj çêkem

Pêvekem alayê kurdan" (Govara Zankoya Dihokê, 2019: 443).

Da bigehet gava germ (Govara Zankoya Dihokê, 2019: 443). Li vêrê peyivên "ala, kurd" du hêmanên civakî ne û pêdivî bû, li diwîf xwendinên civakî li ser rawestîya ban û rexne arastekirina, herçende babetê serekî yê vê mijarê bi tinê layenê niştimanperwerîyê bi xwe ve digirît. Lê ew dişiyan vê layenê bikene dergehek bo rexneya civakî.

Di gotareka dî da li bin nacê "Rengvedana Gotinên Mezinan di Romana 25 Roj li Duzex da ya Nivîser Reza Seyîdgul Berzencî" ku ji layê her du nivîseran Welat Mihemed Tahir û Remezan Hacî Qadir ve hatîye nivîsîn. Her du nivîseran ya hewldayî gotinên mezinan yên nivîser Reza Seyîdgul Berzencî di Romana 25 Roj li Duzex berceste kirîn. Xo bi xo gotinên mezinan verêja keltûrê miletekî ne. Miletê kurd bi dirêjahîya hebûna xwe, piştbestin bo jîyana rojane li ser gotinên mezinan kirîye û bikarînayne û ta ev roke jî bi berdewamî dihêne bikarînan. Lewma eger em bi çavekî rexneyî temaşey van gotinan bikeyin, dê bînin ji nav miletî peydabûwîne û milkê miletî ye. Helbet gotinên mezinan jî weku edebê folklorî yê li ser zarî xizmeteka mezin gehandîye civakê kurdî. Evca baştirîn mîtoda rexnê bo gotinên mezinan, dê rexneya civakî lê herdu nivîseran bitinê ya hewldayî ew gotinên di romana navbirî da hatîye bas kirin li ser rawestîn, bi çavê kanê çewa mifa ji vê folklorê hatîye wergirtinbo berhemê edebî.

Di pêşekîya gotara xo da wan bi xo amaje bi babetê civakî kirîye. "Edebê folklorî edebekê xomalî û resen e, berhemê zanîn û taqîkirin û serborîyên miletî ye, ji dayîkbûnê jîngeha xo ya civakî ye, lewra bi nasnameya gel û miletan dihête niyasîn" (Govara Zankoya Dihokê, 2019: 474). Ewan jî hes pê kirîye ku edebê folklorîberhemê jîngeha civakî û rengvedanê ji civakî diket. Lewma jî edebê folklorî

û civak nahête jêkcudakirin. Çûnke ji miletî bûwîne û di nav miletî da dijîn, bi vê çendê bo me dîyar dibit, baştirîn mîtod bo helbijartinê ku rexneyê li seredebê folklorî biket, mîtoda civakî ye.

Hêmanên civakê kurdî, gelek mişe di nav gotinên mezinan da hene, êk ji wan hêmanan jî gîyanewerin. Eger em temaşey gotinên mezinan yên kurdan bikeyin gelek curên gîyaneweran di nav da dihêne dîtin ku hemî jî ji siruştê Kurdistanê ne ku ev çende dîbîte belge ev gotineyên kurdane wek “Riwîvî, mar, çiwîçik, kew ... hwd” her du nivîseran jî amaje dayîne gîyaneweran lê ne bi wê watayê ku biselmînin yên kurdan e. Çûnke vekolîna wan bi tinê li ser wan gotinaye yên ku di romana navberî da hayite “Nêçîr bo rêvî bo kew ketê” (Govara Zankoya Dihokê, 2019: 485). Li vêrê peyivên “riwîvî, kew” delaletên civak û jîngeha kurdî ne û derbirînê ji siriştê Kurdistanê diken.

Herwesa nivîserên babetê gotineka dî înane û li ser rawestîyane, belê bi tinê weku şîrove ango bitinê wataya gotinê daye dîyarkirin û zêdetir “ew ware lê ne ew bihar e” (Govara Zankoya Dihokê, 2019: 490). Ku têda dîyarken “mebest ji vê gotinê ewe ku her ew welate belê wekî caran ew keyf û xweşî lê nemaye”. Anko eve bi tinê şîrovekirineka watayi ye û çi arasteyên rexneya civakî bi xo ve negirtîye. Sererayi wê çendê eger bi rêka rexneya civakî li ser rawestîyaban, da zêdetir şênkarê xo rexneyî ken. Çunke gelek mişe hêmanên civakî di nav kotinan da diyarin.

Di gotareka dî da li bin navê “Edebê Bergirî û Rolê Wê Beramber Dagirkirinê –Hozanên Qedrîcan – Wek nimûne ku ji layê her du nivîseran Harîwan Mihemed Ehmed û Remezan Hacî Qadir ve hatîye nivîsîn, têda li ser bergirîya Hozanvan Qedrîcanî rawestîyane ku bi rêka hozanê ewbergirî ji miletê kurd kirîye. Di layenekê gotara wan da basê xasletên edebê bergirîyê diken. “Edebê bergirî bi ewî edebê dihête navkirin ewê hemî binema û hasiletin ruha şoreşgêran e têda berceste bûyîn, dişî hemû şêweyên çewsandinê radiwestît” (Govara Zankoya Dihokê, 2019: 557). Şorgêr li vêrê hêmayekê civakî didet û dişêt bibîne binema bo arastekirina rexneya civakî, lê çûnke nivîseran binê layenê edebê bergirî wergirtîye, lewma bitinê li ser wan alav û hêmayan rawestîyayne yên ku derbirînê ji edebê bergirîyê diken û bowîne binyat bo edebê bergirîyê, şoreşgêr, takên civakî ne û di heman demi da çevengê bergirîkirinêne ji civakê. Ceh jî wekû hêmayekî civakî di vê gotarê da hatîye baskirin. Lê amajeyên rexneya civakî li ser nehatîye praktîkkirin, herwek nimûneka hozanî Qedrîcanî diînin.

“Li Îraq

Kurd û ereb

Bi dest û lep

Çirandin hemû peyman û mîsaq” (Govara Zankoya Dihokê, 2019: 560). Peyvên “Îraq, kurd, ereb” dişanidaye li bin sîbera rexneya civakî bihêne şîrovekirin. Çunke ceh û mirov in û herdu rawestîyayne.

Zêdebarî vê çendê jî layanê watayî zêdetir li ser rawestiyayne demê nimûneka Qedrîcanî diên û şîrove diken.

“Bo kuştina azadîxwaz

Kuştina ereb û kurdên belengaz” (Govara Zankoya Dihokê, 2019: 566). “Û bi vê rengê şîrove kirîye. Wate nehêlana azadîyê di nav gelên Îraqê da bi ramana emana aşitî û tenahiyê li deverê digehînit li beramber zilm û stem li deverê berqirar dibît” (Govara Zankoya Dihokê, 2019: 439). Herçende şîrovekirin û ravekirin ji erkên rexneya edebî ye ewan jî jîrovek li bin sîbera rexnê daye vê kopila hozanê, lê bitinê alîyê watayî wergirtîye. Anko şîrovekirin pêxemet dîyarkirina wata parçe hozanê, kopala hozanê êş û azarên miletekî dîyar diket, nexoşîyên du miletan dîyar diket ku ew jî kurd û ereb in. Ev çendê jî dê dişyan da bît, arasteya rexneya civakî bo bihête kirin. Çunke zemîneya xoş e û binemayên rexneya civakî jî têda didîyar in. Ji ber vê çendê jî pêdivîye rexnegir demê têkistekê edebî dixoynît , fere bizanît çi core mîtodeka rexneyî dê li ser wî têkistê hête çespandin. Anko ji xwandina têkistê pêdivîye rexnegir bizanît baştirîn mîtoda rexneyê çîye bo şîrovekirina wê têkistê, daku bi duristahî bişêt li ser bi rawestît û layenên baş û nebaşîyên têkistê dîyar biket. Lê ji ber ku vekolîna van her du nivîseran ya girêdayî edebê bergirîyê ye wayan hewldayî bitinê wî layenî berceste biken û zêdetir wan hêmam alavan dîyar biken û li ser rawestin yên ku derbirînê ji edebê begirîyê diken û ta radeyekê baş di vê çendê da serkeftî bûye.

Di babetekê dî da li bin navê “Estatîka Cihî di Romanên Sebrî Silîvanî da ku ji layê herdu nivîseran Newzad Ebdullah Hacî û Nêrgîz Mihemed Xefar ve hatîye nivîsîn, têda li ser du mijarên serekî rawestîya ne. Êk ji wan babetê cihî ye di romanên navbirî da û ya duyê babetê ciwanîyê ye. Herwesa di naveroka kotar xo da ewan hemî romanên Sebrî Silêmanî dayîne niyasîn û wata wan şîrove kirine.

Nivîserên gotarê hewla da romanên Sebrî Silîvanî bidene niyasîn, wek naverok, ka çi layenek bi xwe ve girîne, her romanekê peregrafek li ser nivîsandîye,

didane nîyasîna romana “Ava Mezin Kêlilka ku Masîyên Xwe Têhnî Dihêle” (Govara Zankoya Dihokê, 2020: 596). Bi vê rengî naveroka wê dabe dîyarkirin. “Ev berheme li dor nasnameyeka gelê kurd digerît bi dîyarkirina keltur û folklor û binemayên bi wan ve girêdayî ne weku fas û turk û ereb, her êk ji nasinamekê didete vê miletê kurd. Belku nivîser têda evê çendê didete dîyarkirin ku kurd berhemê evîneka azad in û bi rêya evîn û xweşîyê û hest û nestan jîyan û berdewam dibît.” (Govara Zankoya Dihokê, 2020: 596). Di vê danenasînê da zemîne ya xoşş bû ger nivîserên babetî bi çavekê civakî li ser rawestîyaban. Çunke mijara romanê li ser danenasîna nasnameyeke lê kurd e. ev gele jî civakekî pêkdiînit û komeka mezin ya êş û azarên gel û civakî di nav da hene û nivîserê romanê jî ew dayne dîyarkirin bi rêka berhemê xo yê romanê. Wate ji binemayên rexneya civakî ye ku nivîser bi rêka berhemên xo li ser her babetekê civakî bi rawestît, jiber ku civake dibîte verêja peywendîya berhemê edebî. Herwesa nivîserên vê gotarê jî dişiyan bi rexneyeka civakî berhemê romana navbirî bidene dîyarkirin, lê ewan bi tinê ji layê babetê romanê û herwesa layenê wataya romanê dîtinên xo li ser dayine.

Cih jî leyenekê girîngê civakî pêkdiînit, helbet bê cih çi civakek neşên hebûna xo bi sermînin. Berhemên edebî jî bi taybetî jî çîrok û roman girîngîyeka mezin bi cihî diden. Çûnke dibîte ew bi yav yê ku boyerên rûdanên çîrokê û romanê li ser dihêne avakirin, lewma cîhana cihî ya berfireh e û rexneya civakî jî şiyaye ta radeyekê baş mifayî ji cihî bibînit. Di vê gotarê jî da, bas li cihê hatîye kirin bi arasteyeka civakî ku nivîserên babetî şîrove kirine ka daye parçeyeka romana Sebrî Silêvanî û bi vî rengî bas kirîye. “Ew zilm û zordarîya bi serê xak û gelê kurd da hatîye gelek e, ew êş û azarên gehiştîne vî cihî û ew gelê li ser dijît hemî sinorên dagirkirinê û zordarîya ... hwd” (Govara Zankoya Dihokê, 2020: 600).

Li vêrê amaje bi cihî daye ku piştbestinê li ser parçeyeka romanê kirîye. Li vêrê cihî û hêmanên civakî wekî xak gel... hwd, pêkve girêdanek heye û ew pêkve girêdan dişîya bibîte xwendineka dî ya rexneya civakî, anko mifa ji cihê hatina wergirtin bo xwendina rexneyeka civakî. Ewa li ser hatîye dîyarkirin şîrovekirina nivîseran bû li ser vê parçeya romanê. “Dîyare jî ku çînabît bêxodan gelekê bixiwazin, lewra ji hingê de ez bi kêmî zarî dibim belê di eynîde xwe kêm nakem ji ber ku derzê ruha min têra dîwarên hemû zîndanîyên rojhelatê ne” (Govara Zankoya Dihokê, 2020: 600).

Ev derbirînên êş û janên miletîyekîne û nivîserê romanê hes bi wan kirîye û babet kirîye mijara romana xo bi tenê vî peregrafê kurt şiyanîyên darêtina rexneya civakî li ser hene. Ger em piştbestinê li ser wan êş û azarên ku milet têda dinalît bikeyin, lê nivîserê gotarê bi tenê naverok daye nîyasîn û şîrovekirîye û babetê wê bo xwînerî aşkira kirîye.

Di gotareka dî da li bin navê "Xwendineka Entropolocî bo Romana –Sîya Evînê- ya Mehmed Ûzûnî ku ji layê her du nivîseran Hêriş Tahir Nûrî û Beyan Ehmed Husên hatîye nivîsîn, zaravê entropolocîya peywendîyeka bihêz digel jîyana mirovî heye û mirov jî weku takekê civakî dihête niyasîn, herdu nivîseran zêdetir babetê gotar xo bi zaravê navbirî ve derbaz kirîye û amajeyên civakî jî dayne gotarê, herwek ew bi xo di pêşekîyê da bas diken "Entropolocîya ew zanisteyê vekolînê li ser jîyana mirovî diket bi taybet ji layê resanayetî, pêşveçûn, bîrûbaweran, dabunerîtan ve eve jî werara mirovî ji layê resantî ve bêguman mirov û ew civakê mirov têda dijît komeka cîyawaziyan hene, çi ji layê fîzîke ve bît yan ji layê sosyolojî ve helbet ev ciyawazîya sosyolocî pitir xo di çarçovê kultur û dabunerîtani da dibînit. Herwesa giringiyê didete peywendîyên şaristanî di navbera civakên mirovayetî da" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 207). Di pênaseya vê zaravî da çendîn amajeyên civakî têda di dîyar in, lê nivîserên babetî, bi tinê yaqîyayî bercestebûna wî zaravî di romana navbirî da bidene dîyarkirin. Wate, romanê jî girîngî daye layenê civakî, herwek di vê parçeya romanê da hatî "Mij û dûmana ku ji welat radibe , malên hilweşîyayî, jinên bêkes û xemgir, zarokên tazî û stûxwar, zarokên digirin, zarokên sêwî, zarokên... yanê destana dilketinê, trajedîya welatekê ji heketinê" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 227). Hemî amajeyên li serî dîyar, amaje bo takeyên civak keftî, li vêrê merc nîne eger têkstekê edebî, rengvedanên civakî di nav hebin dibêt rexnegir xwendineka civakî bidetê, sererayê wê çendê ku dibete rexneyeka civakî li vê têkistê hatiba kirin. Lê nivîseran mijareka dî hilbijarte ew jî mijara têgehê entropolocîyê ye. Wate, rexnegir dişêt pitir ji arasteyeka rexneyî yan mîtodeka rexneyî rexnê arastey têkistê edebî biket.

Di gotarekê da li bin navê "Leheng û Mijara Nasnameya Civakî di Kurteromana –Gulîstan û Şev- da ku ji layê her du nivîseran Emîn Ebdulqadir Umer û Ednan Mehdî Ebdullah ve hatiye nivîsîn, di vê vekolînê da her du nivîseran bizava kirî bi rêka romana navbirî nasnameyên civakî bidene niyasîn. Ev nilisname jî bi rêka wan kesayetên di romanê heyîn ku saxletiyên wan nasnameya civakî hildikirin.

Mijara serekî herwekî di nav û nîşanî da hatîye dîyarkirin, bi tinê nasnameya civakî ye. Kanê aya ev nasnameye dê çewa û bi çi rêk û rêka kesayetên romanê hatîye niyasîn. Eve jî bingehê sereki ye bo arastekirina rexneya civakî. "Her romanek ji komeka kesayetîyan pêk dihêt, ew kesayetî civakê romanê yê afirandî pêkdiînin. Takekesê evî civakê aşopî jî xodan nasnameyên xo yên taybet in û bi rêka kar û kiryar û karlêkirinê nasnameyên ewan yên kesukî û civakî bo xwandevanî aşkera diket" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 342). Nivîserên gotarê bi tinê mijara babetê xo ya serekî wergirtîye û bizav kirîne nasnameya civakî bi rêka kesayetîyên romanê bidene niyasîn. Li vêrê jî mrc nîne her têkistekî edebî yê ku amajeyên civakî têda em rexneya civakî bo araste bikeyin. Belkû mijara rexnegir bixwazîtdêşêt bi her mîtodeka ku ew dibînit ya durist erexneya xo araste biket.

Di layekî dî yê gotara wan da ku şirovekirin û ravekirineke bo babetê nasnameya civakî bi piştbestinê li ser naveroka romanê têda hatîye. "Ji layê peywendîyên civakî û xêzanî ve kesayetîya golistanê kesayetîyeka vekirîye şîyana xo guncandinê ligel xêzana dilşadî heye. Gelek caran sitayîşa dayîk û babên dilşadî jî kirîye û wekû dayîk û babên xo serederî ligel ewana kirîye. Wek ya zana di civakê kurdî da behra pitirîya caran kêşeyên xêzanî di navbera bûk û xesîyan da hene. Lê qaremana Hesen Silêvanî Gulîstanê ev core arêşe nînin, berevajî nasnameyeka civakî ya ciyawaz heye. Gulîstan bi evê rengî serederîya xo ligel dayîka dilşadî dîyar diket. Tu dizanî eger deyka ne te ba, min ne dizanî ezê çewan van zarokan hawîş kem, ew xwe ji pirsîyarên wan rizgar kem... Gelek baş e hedara wan bi pîrê diêt, behra pitir yên li dev wî li xwarê" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 348). Ew peregrafa hatîye wergirtin ji romanê bi xo delaletên civakî têda hene. Dîyalogek û bi rêka wê takên civakî ku zarok in didete dîyarkirin. Zarok jî ji pêkhata her civakekî ne, zêdebarî peyva "pîr" ku bo kesên xodilên temen dihête arastekirin û ew bi xo jî dîsa takekê civakî ye. Lê çunke nivîserên babetê li ser mijara nasnameya civakî rawstîyan e, şîyeyine bi rêka nasnameya kesayetîyê bigehine nasnameya civakî. Ev peregrefeyê dûr e ji rexneya civakî, çûnke çi binemayên mîtod û rexneya civakî bi xo ve nagirin, lê di heman demi da girêdana bi prensîbên civakî ve heyî. Lewra ne merc eher çi berhemê girêdan bi civakî ve hebit rexneya civakî bo bihête arastekirin.

Di govareka dî ya rexneyî da li bin navê "Taybetmendşyên Kurtîleçîrokê di Komela Kurt û Kurtîleçîrokên Rojeka Germ ya Sekvan Xelîl Hêdayetî da, ku ji layê

nivîseran Jivan Numan Hecî û Heyam Salih Huseyn hatîye nivîsîn. Herdu nivîseran bizava kirî saxilet û rengên kurtîle çîrokê bidene niyasîn.

Helbet çîrok bi giştî evca çi kin çîrok bît, yan jî çîroka kurt bît, yan ya dirêj bît, yan kurteçîrok bît. Weku janirekî edebî yê berniyas heye, bêguman çîroka rîyalîstî bi taybetî û çîrok hemî bi giştî rengvedanên civakî li ser hene. Bi taybetli li van salên dûmahîyê gelek ji nivîserên kurd êş û janên miletê kurd û civaka kurdî bi rêka çîrokê derbirîne. Nemaze ku çîrokê biyavekê berfireh heye bo darêtina her azareka civak bo dinalît, yan jiji wê berfirehtir jî romane bi hemî corên xo ve dîsa ji ber ku biyavê darîştinê di romanê da gelekê berfireh e. Ji ber vê çendê rexnegir dişêt mîtoda rexneya civakî bo van her du janêrên edebî bihelbijêrît û şîrove û ravekirinên xo bidetê. Herwek di vê têkistê kurtîleçîroka li bin navê dan û standin da "Piştî cengeka nav xo welat wêran kirî û piştî bi hezaran genc bi agirê wê sotîn, her du layenên hevrik biryar dan biçine jêr balê aştîyê û li ser mêza danûstandinan rûnin. Ewên heftiyan û mehan li pişt dergehên daxistî û li jêr perda tarîkirineka mebest pê heyî dirêj kirin... Li dawîyê endamê herdulayena bi girnijîn ve ji hola danûstandinan derkeftin, da ku ser encamên xo ji bo dezgehên ragehandinê bidene dîyarkirin" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 39-40).

Bûyerên vê kurtîle çîrokê, bûyerên civakî ne û ji nav civakekî peydabûwîne û niwîserê kurtîle çîrokê hest bi wan bûyeran kirîye û bi rêka vî berhemî darîştîne, lê nivîserên vê gotarê, bitenê xwendina xo li dor taybetmendîyên kurtîle çîrokê kirîye û bi vê rengî ewan şîroveyên xo dayinê. "Di evê kurtîleyê da dem û cihên di destnîşankirîne û nivîserî behisa wî cihî kirîye yê şerê navxo lê ruweydayî ewî Kurdistan e. Herwesa behsa wî şerî hemîyê nekirîye çawa bû û çawa hatîye rûwîdan û çend mal wêran kirin li dîf xo hêlan, bi tenê bahsa wî demî kirîye dema her du layên gihêştîne rêkeftinê û da li xula danustandinan derkevin û encaman ragehînin" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 40). Ji xundina herdu nivîseran bo vê kurtîleçîrokê em dişên di van xalan da bas bikeyîn:

Êk: Şîrovekirin: Şîrovekirin daye wata kurtîleçîrokê, demê dibêjin "nivîserî behsa wî cihî kirîye yê şerê navxo lê riwîdayî". Eve bitenê şîrovekirineka wataya têkistî ye û şîrovekirin êk ji xalên here serekeyî yên rexnê ne bi giştî û herwesa rexneya civakî jî.

Du: Destnîşankirina kêmasîyên tekistî: Ev bi xo jî karê rexneyê ye û pêdivîye li ser rexnegirî her xaleka lawaza têkistîyan her kêmasîyeka têkistî ji layê formî ve

bît yan ji layê naverokî ve bît dîyar biket. Ew xala wan dîyar kirî ya lawaz û bi kêmasî girêdayî naverokê ye. Dema dibêjin “Behsa wî şerî hemyê nekirîye çawa bû û çawa hatîye riwîdan û çend mal wêran kirin li dif xo hêlan” (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 40). Kêmasîyên têkistê dîyar kirîye ku bi duristahî basê bûyera şerê navxweyî nekirîye û rexnê lê kirîye û weku kêmasî daye zanîn û eve jî ji erkê rexnê ye û erkê rexna civakî ye jî.

Di gotareka dî da li bin navê “*Urûjana Rege ji Peristane di Gotara Netewî ya Mela Xelîlê Mişextî da*, ku ji layê nivîseran Kameran Îbrahîm Xelîl û Şivan Qasim Hesen hatîye nivîsîn. Di vê gotarê da bi şêweyekê giştî herdu nivîseran êk têgeh kirîye mijara babetê xo. Ew jî têgehê “Regezperestî” ye, bi rêka hozanên Mela Xelîlê Mişextî ya hewldayî wî têgehî li ser birawestin û bidene dîyarkirin kanê ta çi rade ev regezperestîye heye bi dijî neweyekî dihête kirin ku ew jî netewa kurd e. Ewa hewldaye bi tinê rovekirinê bidene hozanên navbirî û bi rêka wê şîrovekirinê bigehene ewan amajeyên hozanvanî bi regezperestîyê dayîn. Caran hozanvan bi xo jî weku regezperest li ser netewa xo daye dîyarkirin. Bi wê têgehî ku kesekê girêdayî gel û welatê xo ye.

Regezperestî jî bi xo dîyardeyeka civakî û li def takên civakî peyda dibit, bi rêka girêdana wî takî bi axê ve û vîyan bo welatî û niştimanî û hemî binemayên netewayetî. Eve jî bi rêka şîrovekirinê dayne dîyarkirin û şîrovekirin jî bi xo êk ji binema û karê rexnê ye herwek di vê nimûneyê da dîyar “Mişextî xodan helwestekê neteweyî û niştimanî ye, lê eger baş û bihiwîrî temaşeyî hemî şîrên wî bikeyin, dê bibînin gelek caran şêwazê serederîkirina wî ligel ew miletên ku stem û zorî li kurdan kirin, morkekê regezperestî anko nejadperestinê bi xo ve digirît:

“Ligel turkan bi başî û şîrhelalî xelatê wan ji bo me oxilî êşek

Ji destê wan me dîtin jeng û talî ji bo me wan bi kar kir feng û fîşek

Dibên nîne kurd, turkê cîbalî li me înkar kirîyne esl û rîşek” (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 167). Bi vê şîrovekirinê nivîseran vîya ye regezperestîya hozanvanî li ser netewa kurd dîyar biken.

Di gotareka dî da li bin navê “Têgehê Fîmînîzm û Cenderî di Romana Miryema da, Xwendineka Berawirdkarî, ku ji layê her du nivîseran Newzet Ehmed Osman û Nîhayet Muhemed Salih Izedîn ve hatîye nivîsîn. Nivîserên babetî romana romannivîs Sebrî Silêvanî kirîye biyavê babetê xo. Ew jî çewanîya bercestbûna têgehê fîmînîzm û cenderî di romana Miryema da, zêdetir bizave kirîye li ser têgehê

navbirî bi rawestin. Du xal di vê gotarê da cihê li ser rawestîyayne, ya êkê fîmînîzm û cênder, ku ew bi xo pêkhata giringa her civakekî ne. Bi taybetî jin ku nîva civakî dihête niyasîn, xala duwê ya girêdayî jîyannameya nivîserê romanê ye. Ev jîyannameye jî her xo bi xo girêdayî wî civakî ye yê ku di nav jîyayî û mezin bûyî ku rengedana civakê wî di tav berhemê wî da dîyar dibît ku vî rengî di layenekî da basê nivîserî babetî kirîye "Sebrî Silîvanî nivîser û edîb û rexnegirekê berçavê komelgeha kurdî, herdem nivîserên wî cihê têhizrîn û şilovekirin û lêkdaneveyên coracor in. Anko her ji destpêka jiyê zarokinîyê bi komeka ezmûnên heme çeşini da derbaz bûye û bûye binema di jîyana wî da" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 383). Nivîserên babetî bi rêka daneniyasîna jîyanameya nivîserê romanê bidene dîyarkirin ku ewî jî encamê ew civakê di nav da jîyayî şîyaye di qonaxên jîyana xo ya civakî da wêneyên girêdayî fîmînîzmê di nav berhemê xo da berceste biket û girîngîyê pê bidet. Herwek di vê layenê da daye dîyar kirin. "Babetê fîmînîzm û cenderî romannivîs Sebrî Silêmaneyî di nav romana xo da bi awayekê êstatîkî û behremendî û zincîrîyeyî berceste kirîye. Bi derbirîneka dîtir êkem car dest bi wenekirina wê jinê da di berhemê xo da kirîye li pêş wênekirina wî kesayetîya zelamî, ji ber hindê jin dinivisînî û romanên wî da – Sebrî Silêvanî da – pantayekê berfireh vegirtîye û êke ji xoya dibit û dawakarîya çareserkirina kêşên jinan û serbestîya wan di civakî da diketin" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 383). Ev gotine ya her du nivîserên babetî ye, jin bercestekirî ye û jin bi xo jî wek me amaje bo kirî. Pêgehekê here mezin di nav civakî da dibînit ku piştbestin li ser vê peregrafa ramanê kirîye. "Bibore nêrîna min belê salehan salekê û jinê weku makerekê dibînin, xirabê wan lê sîyar dibit û qencê wan barê xwe lê diket û li berehîka xwe dihajot û bê layenê wan jî dixwazit devê wê lixav biket" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 384). Ew bi xo vî peregrafê romanê êş û janên jinê dayne dîyarkirin weku pêkhateka civakîya giring û dişiyanda bû rexneya bi rêka rexneya civakî li ser rawestîyaban, da pitir şên xizmeta babetê xo kenin. Çunke hemî zemîne bo rexneya civakî tê da hene. Lewra jî nivîserên gotarê bi xo dibêjin "Romannivîs 'Sebrî Silêvanî' di nav komelgeha xo da didem û cihên cîyawaz da, dan bi evê dabêşê daye, paşanbi şêweyekê hiwîrtir destê xo bo ewan naverok û birîna ku jin û her fîmînîstek bo dinalînit dirêj kirîye" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 385). Wate, hest bi êş û azarên jinê ji layê nivîserî ve hatîye kirin lewma jî nivîserê romanê bizava kirî, ewan nexweşîyan destnîşan biket da çareyek bo

bihête dîtin. Wate, Nivîserî ji civakî berhemê xo dahênaye û romana xo li ser ava kirîye.

Tewerê dî di vê gotarê da, tewerê ayînî ye, nivîserê romanê bas li ayînî jî kirîye bo bercestekirina babetê fîmînîzmê. Her civakek peyrewkirina ayînekî diket yê ku wî civakîbawerî pê heyî lewma ayîn jî êk ji regezên here serekî ye bo civakan. “Sond bi zarê mezin ku evro ez derewan nakem û tinê rastîyê bêjim, eve rexne û yaxîbûneka civakî ayînîye, nivîserî li civakê xo girtî ku fîmînîzim li ser binyatekê sêksîwaltîya reha berceste kirîye. Yaku hebûnê nadete jinê û bitinê mîna alavekê tîrkirina hezan û meremên şehwanî li jêr yasayên regezê nêr temaşeyî regezê wê – mê diken” (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 385). Wate, jinayên pêk ve dibine du regezên girîngên civakî lê nivîserên vî babetî bi dîtineka dî û xwendineka dîtir li berhemê romannivîsî nêrîye, weku fîmînîzim û cênder. Lewma eve jî wê çendê diselmînit ku ne bitenê eger berhemê edebî amajeyên civakî têda bin, pêdivîye rexneya civakî bo bihête arastekirin, belku her berhemekê heyî li ser dîtina rexnegiran dimînit kanê dê bi çi şêwe û araste û mîtod rexnê bo araste ket.

Di babetekê dî da, li bin navê “Jîyanname di Romana Kurê Zinarê Serbilind da, ku ji layê herdu nivîseran Ebdî Hacî Mihemed û Remezan Hacî qadir ve hatîye nivîsîn, herdu nivîseran bizava kirî bas li jîyannamê biken wek janirekê edebî ku pitir di nav romanê da dihête dîtin. Jîyanname dibite gelek kesan bi xo ve bigirît, ji wan jî kesên bernîyas û bi nav û deng yan jî dibît romannivîs xo bi xo bît ku rolê vegêranê li ser zarê xo rabibît, lê ji xalên here girîng bo jîyannamê rastgoyê ye di babetê da. Wate, yan divêt bi rastkoyî bihête nivîsan, yan jî eger nehête nivîsan baştir e, eve vekolîne jî basê çewanîya destnîşankirina jîyannamê di romanê da diket. Li gor hizra vekoleran jîyannama xodanê romanê di nav rûdanên wê da berceste bûye, evca li ser vê binemayê ku jîyannama nivîserî jî pişkeke ji wan civakê têda dijît, dê li ser vê gotarê rawstîn.

Di parçeyeka romana me amaja bo kirî, nivîserê romanê bi xo dibêjit “Ma bo çi wek berahîk dest bi serhatina xwe nekem? Belê xoş hizre ew, li destpêkê dê bîrhatinên xwe nivîsim. Belê wê ya ku bi serê min hatî bi min çavên xwe dîtî” (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 496). Eve li ser zarê nivîserê romanê hatîye gotin û ev çendê wê diselmînit ku ew dê di romanê da basê jîyannama xo ket. Helbet baskirina jîyannamê bi xo dê rengedanên civakî li ser zal bin. Çunke nivîser jî gorê civakekiye yê ku di nav da mezin bûyî. “Mirov bi xo mêjûya jîyana xo dinivîsit û

hemî riwêdan û tiştên bi serî hatîn tomar diket, kar û karêgerîyên xo jî vedigêrit û bas li rojên zarokînîyê û gencatî û pîriyê jî diket" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 496). Lewma jî divêt rastgoyî têda bît. "Rastgoyî mercek sereke ye û karek rewiştî ye, çunke girêdana jîyan û mêjûya miletekî ye, xudanê jîyannamê takeke ji civakî û jîyana wî beşek eji jîyana netewekî" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 505). Çunke rastî di jîyannamê da rastîya bûyerên û ketwarê civakî dîyar diket û bi vê çendê dê berhemê edebî bîte rengvedanên rast û durist li ser jîyana nivîserî. Wate, bi rêka jîyannamê dê civakê bihête niyasîn û li vêrê dê zemînexoş bît bo arastekirina rexneya civakî, ango vedîtina jîyannameyê jî êk ji fakterên rêxoşikere bo rexneya civakî.

Gotareka dî li bin navê "Qonaxên Werar Fabilê dî Edebîyata Kurdî da ku jialîyê her du nivîseran Perwîn Reûf Hadî û Huseyn Osman Ebdurrehman ve hatîye nivîsîn. Di vê gotarê da ku şêwazekê rexneyî bi xwe ve dîtîye, çendîn mijarên girêdayî civakî têda bas kirîyne. Ji wan jî fabilê daye niyasîn ku li ser zarê giyaneweran babetên cor û cor bo civakî hatîye arastekirin. Herwesa xala girîngtir ew e ku têda li ser rengvedana fabilê folklorî da bas kirîye û şîrovekirin dayne hindek têkistên edebî û herwesa edebê folklorî jî.

Bêguman edebê folklorî ji miletê peyda bûye û di nav miletî da dijît û cihekê mezin û taybet di nav civakî da heye. Nemaze edebê folklorê kurdî çi wek sitran yan çîrok û ... hwd, miletê kurd jî êk ji wan miletane ku gelek bi folklorê xo zengîn e di piranîya janêrên edebî da, li ser vê binyatê janêrên edebê folklorî baştirîn têkistin ji bo arastekirina rexneya civakî. Çunke ji civakê peyda buyîne û hemî jî girêdayî jîngeh û sirûştê wî civakî ne. Nivîserên vê babetê jî ta radeyekê baş girîngî daye vê corê rexnê, zîyadebarî babetê wan yên serekî ku fabilê ye. Di layenê gotara wan da derbarê pênaseya fabli hatîye. "Fabil ew çîrok û serhatîyên li ser zarê giyandaran dihête vegêran" (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 270). Li vêrê dîyar dibit, nivîseran viyayebi tinê girîngîyê bi vê têgehê biden ji herdu layan ve tiyorî û praktîkî. Dîsan nivîseran basê peydabûna evan core çîrokan di nav edebîyata kurdî da kirîye û girêdan bi miletê kurd ve "Destpêka fabilan di edebîyata kurdî da bo peydabûna çîrok û serhatî û hîkayetên di nav vê miletî da dizivirît û ev corê edebî bi berfirehî di nav folklorê kurdî da dihête dîtin. Û çîrokên ser zarê giyaneweran fabil jî êk ji liqên giringîn vê corê edebî ye. Ev çîroke zor dikevinin û bo wî demî dizivirin ku miletan bi rêka çandin û kistûkalê di nav zevîyên berfireh dijîyan û bi vê çendê peywendîyeka mukem di navbera mirov û ajel û balindeyan durist bû" (Govara

Zankoya Dihokê, 2021: 271). Eve jî wê çendê diselmînit ku ev corê edebî ji miletê peyda bûye û dişiyandeye bibîte jêderê rexneya civakî. “Fabil weku janêrekê edebî di edebîyata zarokên miletên cîhanê bi giştî û edebîyatê zarokê kurdî bi taybetî dihête hijmartin” (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 270). Bi şêewyê ser zar ji rifiştekî bo êkê dî hatîye veguhastin û kurdan jî parastin li ser kirîye.

Edebê kilasîkê kurdî jî girîngî daye fabilê û hozanvanê kurd Feqîyê Teyran jî şîyaye fabilêdi nav hozanên xo da berceste biket di nimûnekê da ku Feqîyê Teyran pirsîyar ji bolibolê diket çima wesa bêzar e û dinalît, Bolibol li ser zarê xo dihête bersiv

“Ezê dê çima hêdî bim
Em per dibîn bihar
Mêcrûhek bêtebîb im
Di nav leyl û niharan
Ji dosta xwe xerîbim” (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 277).

Ev parçe hozane ya berhev ji bo arastekirina rexneyeka civakî li çenge nivîserên babetî bi tinê vîyaye têgehê fabilê bi berfirehî bidene niyasîn, çi di nav edebê folklorî da yan jî edebê kilasîkî da.

Di folklorê kurdî da jî gelek mişe fabilê hatîye bikarînan, bi taybetî di nav gotinên mezinan da “her di nav edebê zarekî da gotinên mezinan jî biyavekê mezinê fabila kurdî bi xwe ve digirin. Çunke gelek ji van gotinan li ser zarê gîyaneweran hatîye vegêran û di rastî da peyva fabil bi dirustî li ser van gotinan dihêt. Çunke fabile çîrokeka kurte ku li ser zarê gîyaneweran dihête vegêran û armanceka exlaqî û perwerdeyî heye. Û xoşî û tiraneyê bi xwe ve digirît anko em dişên bêjin her êk ji van gotinan navûnîşanê fablekê ye yan kurtîya fablekê ye. Bo nimûne gotin: Dûpişk tu li zivistanê ne dîyarî? Got: panê min li havînê gelek ruwî li dev hewe heye. Rûvîyê felîtûk nakevit çi telihan” (Govara Zankoya Dihokê, 2021: 275). Li vêrê ev corê gînaweran yên hatîye baskirin, di nav civakê kurdî da mişe dihête dîtin, lewma ew gîyanewer jî em dişên bêjin dibine pêkhateka civakî ya girîng û rengvedana ewan heye di nav folklorê kurdî da û dişên bibine jêderekê baş bo rexnegiran ku bi wê rêkê rexneya civakî li ser encam biden.

## ENCAM

Piştî ku defçûyîneka giştî kirî bo babetê rexna edebî bo me dîyar bû ku babetekê gelek berfireh e û gelek nivîser û rexnegira behs li evê babetê kirîye û her êk ji layê xo vepênase û têgehê wê bo me dîyar kirîne bi taybetî di rexna civakî da.

Tîyora rexna civakî bi şêweyekê taybet û giştî hatîye wergêran û şîrovekirin anko ji zimanên kurdî û erebî hatîye wergêran û bi rengekê berfireh hatîye şirovekirin.

Bi têr û teselî behsa tîyora rexna civakî kirîye di du babetên serekî da ewe jî têgeh û pênase û mêjûya rexna civakî, daneniyasîn û destnîşankirin û şîrovekirina gotarên rexneyî bi taybetî rexna civakî ewiyên di Govara Zankoya Dihokê da babetên wan bi du şêwa aşkere diketî ew jî bi şêweyê rastexo û nerastexo girêdayî rexna civakîve.

Nivîser û rexnegira bizava kirî ewan dîyarde û babetên civakî ewên di nava vekolînên edebî da Govara Zankoya Dihokê da destnîşan û şîrove biken anko ji layê keresteyî vekolînê ve babet û dîyardên civakî kirîne kereste.

Di nava wan vekolînên edebî da ewiyên di Govara Zankoya Dihokê da bo me dîyar dibit ku edeb bi rengekê rastexo û bi civakî ve girêdaye anko edeb û derbirîne ji civakî û edebîyat helgirê wêne û ramanên cura û cure ku derbirînê ji helwîstê mirovî ji hebûn û jivakî û jiyanê ji hizirkirin û turebûn û nakokîyê ji razîbûn û nerazîbûnê diket.

Bo me dîyar bû ku di nava wan gotarên edebî da ewîyên di Govara Zankoya Dihokê da belavbûyîn ku rexneya civakî ew rexneye li dor edebekê civakî digerînit edebeke bi zimanê miletê hatîye nivîsîn û behsê xem û êş û azarên miletî diket û biwêrî li ser dabûnerêtan û zulmê û bindestîyê behs diket û dirawestît.

Êk ji binemayên herî girîngên rexneya civakî da wan vekolînan da ew bû ku be hiskirina arîşên civakî û dîyardên hejariyêne ku behra pitira xelkê pê dinalên, taku huşyarîya cemawerî biken û bîte palderek bo çareserkirina ewan arêşan bi her rêkekê.

Piştî me dîvçûn bu 24 hêjmarên govarê kirîn ku vekolînên 11 salan bi xwe ve digirin. Bo me dîyar bû ku 29 babetan da bi şêweyekê nerastexu biha û mijar û binema û dîyardeyên civakî hatîye wergirtin û şirovekirin. Lê çi ji ewan bi şêwekê rast û aşkera binemayên evê mêtoda rexneyî peyrewnekirîne. Bi tinê di 2 vekolînan da ev mîtode bûye biniçînê şîrovekirinê û li diwîf pêngavên wê rexne hatîye

encamdan. Lê vekolîna *Xwendineka Civakî Bo Jilemûya kevalekê Bijiyay* pitir diçîte bin sîbera evê mîtodê da.

Berhemên edebî yên ku delalat û amajeyên civakî bi xove digirin. Merc nîne bi tinê bi rêka mîtoda rexneya civakî rexne li ser bihête kirin, belku li ser rexnegirî û şehrezayîya wî dimînit, kanê aya bi çi arasteyeka rexneyî rexneya xo arasteyî wî têkistê biket.

Roman û çîrok weku janirên edebî bi hemî corên xo ve pitir amajeyên civakî têdane. Çunke bi yavê darişţinê têda yê berfireh e û rengvedanên civakî têda pitirin, nemaze ew roman û çîrokên qalibekê ketwarî û civakî bi xo ve dibînin.

Rexneya civakî weku pêdivê gelek kêm di nav Govara Zankoya Dihokê da dihête dîtin. Bi tinê nivîserên rexnegir ew biyav destnîşankirîne yên ku bo babetên xo kirîne mînak.

Her nivîserekê rexneya xo di Govara Zankoya Dihokê da araste kirî, bi tinê li ser wê mijarê rawestîya ye ya ku ewî bo gotara xo destnîşan kirî, ev ca çi layenê tiyurî bît yan yê praktîkî bît.

Folklorê li ser zari yê kurdî û bi taybetî heyranoka kurdî wek êk ji corên edebê filklorî, rengvedanên civakî wek dîyardeyên civakî di nav da meşe hatîye arastekirin û heyranok baştirîn corê edebî ye bo arastekirina rexneya civakî.

**ÇAVKANÎ**

Alî Hedad, *El-Xîtabu'l-Axîrî Muqarenetun lî Ebcedîyetî'ş-ŞaîrNaqîda*, Dimeşq 2000.

Arif Hîto, "Janên Civakî di Romanê Vîyan di Deqê Janidar da", *Gizvar Peyv,* jimare: 64, Dihok 2013.

Azad Ebdulwehîd Kerîm, *Sosyolojîya Şî'rî Kurdî*, Capxaneyî Wezaretî Perwerde, Hewlêr 2005.

Bengîn Îbrahîm Hemî, *Rexneya Civakî di Romanên Hesenê Metê da*, Senterê Bêşikçî, Dihok 2020.

Bîyir Zîma, *en-Neqdu'l-Îctîmaîyu*, Trc: Ayîde Lutfî, Qahîre 1991.

Çarliz Birêslêr, *Rexneyî Edebî û Qutabxanekanî*, Wergêr: Ebdulxaliq Yeqûbî, Dezgayî Aras, Çap û Belawkerdinewe, Çapê duwem, Hewlêr 2007.

Ebdî Hacî, *Çend Tiyorekên Rexna Edebî*, Çapxana Hacî Haşîm, Hewlêr 2008.

Ebdulezîzî Etîq, *Fî'n-Neqdî'l-Edebî*, Daru Nehdetî'l-Erebîyye, Çapa 2yan, Beyrût 1972.

Ebdulmelîk Murtac, *Fî Neferîyetî'r-Rîwayetî*, Sîlsîletu Alîmî'l-Me'rûfe, Hejmar: 240, Kuweyt 1988.

Ebdulmelîk Murtac, *Tehlîlu'l-Xîkab es-Serdî*, Dîwanu'l-Mekbûatî'l-Camiîyetî, Cezaîr 1995.

Ebdurehman Ebû Ewf, *Fusûlun fî'n-Neqdî we'l-Edebî*, Mektebetu'l-Îskenderîyye, Misir 1996.

Ebdusettar Îbrahîm, *Ususu Îlmî'n-Nefsî*, Daru'l-Merîxî lî'n-Neşrî, Rîyad 1987.

Ebu Ferec Qudame b. Cafer, *Neqdu'ş-Şî'rî*, Daru'l-Kutubî'l-Îlmîyye, Beyrût 2000.

Ednan Xalid Ebdulah, *Rexneya Praktîkî û Şîrovekarî,* werger: Ehmed Ebdulah Zero, Çapxana Pertûkxana Gazî, Dihok 2021.

Ehmed eş-Şayîb, *Usûlu'n-Neqdî'l-Edebî*, Çapa 10an, Metbe'etu'n-Nehdetî'l-Erebîyetî, Qahîre 1973

Elî Cewad Tahir, *Muqeddîmetun fî'n-Neqdî'l-Edebî*, el-Muessesetu'l-Erebîyyetu lî'd-Dîrasatî we'n-Neşrî, 1979.

Emîn Ebdulqadir, *Du Çemkên Hamêbûn û Yaxîbûn di Hozana Niwîxaz da Kurdî da*, Çapxana Hewal, Dihok 2005.

Enrîk Enderson, *Menahîcu'n-Neqdî'l-Edebî*, trc. Tahir Ehmed Mekî, Qahîre 1991.

Fenisit b Lîtiş, *En-Neqdu'l-Edebî'l-Emrîkîyyî Mîne'l-Plapînîyatî île'l-Pemanînîyat*, trc. Muhemed Yehya, Muraca e we Teqdîm: Mahîr Şefîq Ferîd, el-Meclîsu'l-E'la lî's-Seqafetî Misir 2000.

Hafizîye b. Qanîte, *Muhazeratun fî'n-Neqdî'l-Îctîmaîyetî,* Camîetu Muhemed el-Beşîr el Îbrahîmî (Teza Doxtorayê), Cezaîr 2019.

Heval Selîm teyîbAkreyî, *Bunyadgerî di Nav Rexna Kurdî da*, Dezgeha Spîrêz , Weşanên Hacî Haşm, Hewlêr 2005.

Hîlab Nûr el Hedî, *el-Menhecu'l-Îctîmaîyyu fî'n-Neqdî*, Neşetuhu we Xesaîsuhu, Camîetu'l-Aqîd Ekelî Mîhned Olhac, Meceletu Merkezî Dîrasatî'l-Kûfe, Hejmar: 38, Cezaîr 2015.

Îlîya el-Hawî, *Fî'n-Neqdî we'l-Edebî*, el-Cuz'u'l-Ewwelu, Çapa 5an, Daru'l-Kîtabî el-Lubnanî, Beyrût 1986.

Înad Xizwan, *Îsdaû Dîrasatîn Edebîyetîn Neqdîyetîn*, Menşûratu Îtîhadî'l-Kîtabî'l-Erebî, Dimeşq 2000.

Întisab Necîb Coqî, *Şî'r û Mêjû – Praktîzekirina Rexneya Mêjûyî li Ser Hozana Nûyî ya Kurdî di Devera Behdînan Sala (1970-1991)*, Dezgehê Sipîrêz, Qutabxana Matrîs, Turkîya 2016.

Kemal Ebû Dîb, *el-Edebu we'l-Aydolocîya*, Meceletu'l-Fusûl, hejmar: 4, 1985.

Macîde Humûd, *Elaqetu'n-Neqdî bî'l-Ebdaî'lEdebîyyî*, Menşûratu Wezaretî's-Seqafetî's-Surîyetî, Dimeşq 1997.

Mecmûetun Mîne'l-Kîtabî, *Medxelu îla Menahîcî'n-Neqdî'l-Edebîyyî,* trc. Ridwan Zaza, Alîmu'l-Me'rîfetî, 1997.

Mehmûd Emîn el-Alim, *Erbeûna Amen mîne'n-Neqdî'Tetbîqîyyî*, Daru'l-Musteqbel, Qahîre 1994.

Micahîd Ebdu'l-Munîm Micahîd, *Cedelu Neqdî weÎlmî'l-Cemalî*, Daru's-Seqafetî we't-Tewzî'î, Qahîre 1988.

Micuyî Sabir, *en-Neqdu'l-Exlaqîyu Esluhu we Tetbîqatuhu,* Daru'l-Ulûmî'l-Erebîyetî, Beyrût 1990.

Mîs Xelîl Muhemed Awde, *Tasîlu'l-Uslûbîyyetî fî'l-Murûsî'n-Neqdî we'l Belaxî*, Camîetu Necah el-Wetenîye, (Teza Doxtorayê), Filistîn 2006.

Muhemed Belîd, *Neqdu'n-Neqdî'l-Edebîyyî- el-Ususu'n-Nezerîyyetu we'l-Muqarenetu'l-Menhecîyetu*, Meceletu Cîl ed-Dîrasatu'l-Edebîyyetu'l-Fîkrîyye, Hejmar: 2, r. 92. //jilrc.comhttp

Muhemed Ebdulmunîm Xefacî, *Medarîsu'n-Neqdî'l-Edebîyyî'l-Hedîs*, 1995.

Muhemed Mindûr, *en-Neqdu'l-menhecîyu înde'l-Erebî*, Nehdetu Misir lî't-Tîbaetî we'n-Neşrî, Misir 1996.

Muhemed Zekî el-Îşmawî, *Dîrasatu fî Neqdî-lEdebîyyî'l-Muasirî*, Daru'ş-Şurûq, 1994.

Muhyeddîn Yûsuf Ebû Şeqra, *Medxelu Sosyolocî'l-Edebî'l-Erebî*, hejmar: 1, el-Merkezu's-Seqafîyyu, Beyrût 2005.

Nebîl Raxib, *En-Neqdu'l-Fennîyyu*, Daru Misir lî't-Tîbaetî, Misir 1989.

Nemetullah Hamid Nihêlî, *Deravek ji Rexnê – Rexne û Vekolîn ji Weşanên Êketîya Nivîserê* Kurd, Çapxana Hawar, Dihok 2010.

Nemetullah Hamid Nihêlî, *Dîda*, Avahîya Êketîya Nivêserên Kurd Tayê, Dihok 2022.

Nesrulayê Îmamî, *Binema û Mîtodekanî Rexneyî Edebî*, Wergêr: Senger Nazim Hêmdad Huseyn, Nawendî Awîr Bo Êap û Bilawkerdenewe, Hewlêr 2018.

Newzad Ebdulah Bamernî, *Aydolijîya di Hozanên Cegerxwîn da*, Çapxana Xanî, Dihok 2007.

Newzad Ebdulah Bamernî, *Aydolojîya di Hozanên Cigerxwîn da*, Çapxana Xanî Dihok 2007.

Nûr Sereb Firayî, *Teşrîhu'n-Neqdî*, trc.Muhemed Usfûr, Menşûratu'l-Camîetî'l-Urdunîyetî, Amman 1991.

Nûreddîn Cûyînî, *Neqdu'n-Neqdî we Alyatu Îştîxalîhî fî's-Seqafet'l-Erebîyyetî*: Mîne't-Tenzîrî îla Tetbîqî, Meceletu Îhalat, Hejmar: 3, 2019.

Qehreman Esed, *Rexne û Rexneya Rexneyê*, Tiyor û P

Qus el-Huseynî, *Sosyolocîyetu'l-Edebî*, Dîrasetu'i-Waqiîyetî ela Îlmî'l-Îctîmaî, Daru Mektebetî'l-Hîlal, Lubnan, 1993.

Rêbîn Xelîl Qadir, *Mîtodê Rexneyî Komelayetî li Lêkolînewey Edebî da*, Govara Raman, Jimare: 167, 2011.

Rîca Ebîd, *Felsefetu'l-Îltîzamî fî'n-Neqdî'l-Edebî*, Nedetu Misir lî't-Tîbaetî we'n-Neşrî, Qahîre 1988.

Rînîye Weylîk, *Tarîxu'n-Neqdî'l-Edebî'l-Hedîs*, Trc. Micahîd Ebdu'l-Munîm Micahîd, Berg: I, el-Meclîsu'l-E'ela lî's-Seqafetî, 1998.

Sahib er-Rebî', *Teqnîyatun we elyatu'l-Ebdaî'l-Edebî*, Sefahatun lî'd-Dîrasatî we'n-Neşrî, Sûrîya 2011.

Salih Fazl, *Eşkalu’t-Texîlî Mîn Fitatî’l-Edebî we’n-Neqdî*, Daru Nûbar, Qahîre 1996.

Salih Fazl, *Nezerîyetu’l-Bînaîyetî fî’n-Neqdî’l-Edebî*, Daru’ş-Şurûq, Qahîre 1998.

Semîr Hîcazî, *Medxelun îla Menahîcî’l-Muasirî Beyne’n-Neqdîye*, Daru’l-Mearîfî’l-Erebîyye, Sûrîya 2004.

Seyîd Qutub, *en-Neqdu’l-Edebîyyu Usûluhu we Mînhacuhu*, Daru’ş-Şurûq, Çapa 7an, Qahîre 1993.

Şukrî Muhemed Îmad, *El-Mezahîbu’l-Edebîyetû we’n-Neqdu Înde’l-Erebî we’l-Xerbîyyîne,* 1993.

Tarîq Bekîr Osman, *Tebet’n-Neqdi’lFenniyi’l-Muasıri fi’s-Sehafeti’s-Suudiyeti*, Camietu Ummu’l-Qura, (Teza Doxtorayê), Medine 1992.

Tewfîq ez-Zîdî, *Fî Ulûmî’n-Neqdî’l-Edebîyyî*, Tunus 1997.

Tîrî Îtlîtûn, *Marksîzim û Rexneyê Edebî*, Wergêr: Ebdulxaliq Ye’qûbî, Hewlêr 2008.

Wehbî Ehmed Rûmîye, *Şî’runa el-Qedîmu we’n-Neqdî’l-Cedîd*, Daru’ş-Şurûq, Qahîre 1996.

Xedîce Salih, *Elaqatu’l-Luxetî bî’l-Edebî*, Meceletû’l-Hewlîyat, Hejmar: 6, 2006.


Yemîne b. Siweykî, *Neqdu’n-Neqdî- el-Mefhûmû we’l-Îcrau*, Muceledu’l-Elûku’lÎnsanîye, Hejmar: 31, 2020, Revue.umc.edu.dz

Yûsuf Ebu’l-Udûs, *el-Îstîadetu fî’n-Neqdî’l-Edebî’l-Hedîs*, Amman 2007.

Yûsuf Nûr Awd, *Nezerîyet’n-Neqdî’l-Erebîyyî’l-Hedîs*, Qahîre 1994.

Zeynîye Weylîk, *Mefahîmun Neqdîyyetun*, trc. Muhemed Usfûr, Alîmu’l-Me’rîfetî, 1987.

**ÖZGEÇMİŞ**



Kişisel Bilgiler

| | |
|---|---|
| Soyadı, Adı | : Shilan Younis Ahmed Lawand |
| Uyruğu | : Irak |
| ORCID | : |

Eğitim

| Derece | Eğitim Birimi | Mezuniyet Tarihi |
|---|---|---|
| Yüksek Lisans | Van YYÜ | …………………… |
| Lisans | Irak | …………………… |

İş Deneyimi

| Yıl | Yer | Görev |
|---|---|---|
| …………… | ………………………… | …………………… |
| …………… | ………………………… | …………………… |
| …………… | ………………………… | …………………… |

Yabancı Dil

Kürtçe

Yayınlar

…………………………

Hobiler

…………………………

**VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**
**LİSANSÜSTÜ TEZ ORİJİNALLİK RAPORU**

Tez Başlığı: METİN KURLUMUNDA BAĞLAÇLARIN ROLÜ …/…/2023

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 71 sayfalık kısmına ilişkin, ……/……/…….. tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından ……………..intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % …………….. (…………………..) dır.

**Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:**

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,

7 kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal İçemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

…/…/2023
Shilan Younis Ahmed Lawand

Adı Soyadı : Shilan Younis Ahmed Lawand
Öğrenci No : 20950001006
Anabilim Dalı : Yaşayan Diller
Programı : Kürt Dili ve Edebiyatı
Statüsü : Y. Lisans ☐

| DANIŞMAN | ENSTİTÜ ONAYI |
|---|---|
| Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ<br>…/…/2023 | UYGUNDUR<br>…/…/2023<br>Prof. Dr. Abdülhadi TİMURTAŞ<br>Enstitü Müdürü |